# BÊYÎ DADWERİYA DEMA TÊPERÎ TESPÎTA HEQÎQETÊ YA FERMÎ:

## *KOMÎSYONÊN LÊKOLÎNÊ YÊN MECLÎSÊ Lİ TİRKİYÊ*

ONUR BAKINER

HAFIZA MERKEZİ
HAKİKAT ADALET HAFIZA MERKEZİ

# BÊYÎ DADWERİYA DEMA TÊPERÎ TESPÎTA HEQÎQETÊ YA FERMÎ: *KOMÎSYONÊN LÊKOLÎNÊ YÊN MECLÎSÊ Lİ TİRKİYÊ*

ONUR BAKINER

HAKİKAT ADALET HAFIZA MERKEZİ

HAFIZA MERKEZİ

**TRUTH JUSTICE MEMORY CENTER**
Ömer Avni Mahallesi
İnönü Caddesi Akar Palas No:14 Kat:1
Beyoğlu, 34427, İstanbul
T: +90 212 243 32 27
info@hafiza-merkezi.org
www.hakikatadalethafiza.org

**NİVÎSKAR**
Onur Bakıner

**WERGÊR**
Rêbîn Ozmen

**DÎZAYN**
Ekin Sanaç

© Hakikat Adalet Hafıza Çalışmaları Derneği Yayınları (Truth Justice and Memory Studies Association Publications) 2022

OLOF PALME INTERNATIONAL CENTER

Hafıza Merkezi spasiyê li Olof Palme International Centerê dike ji bo alikariya wan a bo çapkirina vê reportê.

OAK FOUNDATION

SIGRID RAUSING TRUST

Em spasiyê li Weqfa Oakê û li Weqfa the Sigrid Rausing Trustê dikin bo alikariya wan a ku li saziyê kirine.

**DESTPÊK** 6

Lêkolîna Komîsyonên Lêkolînê yên Meclîsê yên li Tirkiyê: Armanc, Peywend û Rêbaz 6

*Armanc* 6

*Peywend: Komîsyonên Lêkolînê yên Meclîsê li Tirkiyê* 6

*Hilbijartina bûyeran ya ji bo vê raporê* 8

*Dane û Rêbaz* 10

*Awirtêdaneka bi giştî li raporê* 11

**BEŞA 1.**

**Komîsyona Lêkolîna Meclîsê Çi ye û Çima Giring e?** 13

Di peywenda dadweriya dema têperî de dîtina heqîqetê 14

Cureyên hewldanên dîtina heqîqetê 15

Terîfkirina komîsyonên lêkolînê yên meclîsê 16

Di komîsyonên meclîsê de awantaj û dezawantajên potansiyel yên lêkolîna xeletiyên raboriyê 18

Mînakên balkêş ên komîsyonên lêkolînê yên parlamentoyê 20

*Ûrûguay* 20

*Peru* 20

*Almanya* 21

Çareserî 23

**BEŞA 2.**

**Komîsyona Susurlukê** 25

Danasîn 26

Peywend 26

Avakirin û xebitîna Komîsyonê 28

Rapora Dawîn 30

Pêvajoya piştî komîsyonê 31

Analîza Komîsyona Susurlukê 33

**BEŞA 3.**

**Komîsyona Derbeyê** 37

Destpêk 38

Peywend 38

Avakirin û xebitîna Komîsyonê 39

Rapora Dawîn 41

Pêvajoya piştî komîsyonê 44

Analîza Komîsyona Derbeyê 46

**BEŞA 4.**
**Komîsyona Jêr a Binpêkirinên Mafên Jiyanê** **50**
Danasîn **51**
Peywend **51**
Avakirin û xebitîna komîsyonê **52**
Rapora Dawîn **54**
Pêvajoya piştî komîsyonê **56**
Analîza Komîsyona Jêr ya Binpêkirinên Mafên Jiyanê **56**

**BEŞA 5.**
**Komîsyona Pêvajoya Aştiyê** **61**
Danasîn **62**
Peywend **62**
Avakirina komîsyonê û xebitîna wê **63**
Rapora dawîn **65**
Pêvajoya piştî komisyonê **68**
Analîza Komîsyona Pêvajoya Aştiyê **70**

**BEŞA 6.**
**Analîza Berawirdî ya Komîsyonên Lêkolînê yên Meclîsê** **73**
Çarçoveyên Vegotinê **74**
Komisyonên lêkolînê yên parlamentoyê û dadweriya dema têperî **78**
Bertekên raya giştî yên li komîsyonên meclîsê **80**
Di komîsyonan de beşdariya civaka sivîl **81**

**BEŞA 7.**
**Pêşniyarên ji bo Komîsyonên Meclîsê yên di Dahatuyê de Werin Ava Kirin** **85**
1. Erken Fermî yên Zelal **86**
2. Metodolojiya zelal **87**
3. Diyarkirina Armancan **88**
4. Ji nûjen ve fikirîna li ser deng **89**
5. Teşwîqkirina beşdariya civaka sivîl **91**

**ÇAVKANÎ** **92**

# Destpêk

## Lêkolîna Komîsyonên Lêkolînê yên Meclîsê yên li Tirkiyê: Armanc, Peywend û Rêbaz

### *Armanc*

Armanca vê raporê belgekirin û analîzkirina çar komîsyonên lêkolînê yên meclisê ne ku di navbera salên 1997 û 2013an de, ji bo lêkolîna mijarên di warên şideta siyasî û binpêkirinên mafên mirovan de hatibûn ava kirine ku ji bo komîsyonên di dahatuyê de werin ava kirin re bibe rêbernameyek. Li Tirkiyê, bi gelemperî pêvajoyeke edaletê ya ji bo dema têperî tuneye an go komîsyoneke taybet ya heqîqetê tuneye. Li gel vê yekê jî, parlemento û saziyên din yên dewletê, ji bo lêkolînkirina tevgerên hêzên dewletê yên di dema şerê çekdarî yê navxweyî de ku li herêmên kurdan pêkhatî, binpêkirinên mafên mirovan yên di dema vê pevçûnê û bi şûnde û gefên li ser demokrasiyê, ji dawiya salên 1980yî û vir ve gelek dezgehên lêgerîna heqîqetê ava kirin. Ev proje serkeftin, kêmasî û sînoradariyên komîsyonên lêkolînê yên meclisê di keşifkirina rastiyan, eşkerekirina peyama wan û dabînkirina çarenûsa mexdûran de vedikole. Armanc ew e ku, ji bo desteyeke lêkolîna heqîqetê ya di dahatuyê de, -wekî komîsyoneke meclîsê an jî komîsyoneke serbixwe ya derveyî meclîsê- re ev lêkolîn bingeheke ava bike. Ji bo ku ew destkeftî û destpêşxeriyên berê bizanibin û sînoran derbas bikin.

Wekî ku berê jî hatibû diyarkirin, lêkolîna hatî pêşniyarkirin, qebûl dike ku Tirkiyê derbasî aştî û demokarasiyeke rastîn nebûye û saziyên berê yên lêpirsînê, ji bo ji hewldanên dahatuyê re rêberiyê bikin dikole. Ji ber vê yekê, armanca gelemperî ya projeyê, ji bo komîsyoneke lêkolînê ya meclîsê ku di çarçoveya veguherînên demokratîk an jî pêvajoya aştiyê de were ava kirin, keşifkirina sepanên herî baş û bikêrhatiye. Lêkolînkirina lîteratûra komîsyonên li welatên din û analîzkirina komîsyonên di raboriyê de li Tirkiyê hatî ava kirin, wê ji vê rojeva pratîk re rêberiyê bike.

### *Peywend: Komîsyonên Lêkolînê yên Meclîsê li Tirkiyê*

Di saziya qanûndanêr ya Tirkiyê Meclisa Mezin ya Gel a Tirkiyê [*Meclisa Mezin ya Gel a Tirkiyê*] de, di navbera salên 1950 û 2021ê de bi tevahî 137 komîsyonên lêpirsînê yên taybet hatine ava kirin. Ev tê wê wateyê ku ji sê paran pareke van komîsyonan ji aliyê civana giştî ve hatine paşguh kirin. Şikil Destpêk 1, hejmara komîsyonên taybet yên

meclisê nîşan dide, xêzên spî salên cuda yên serdema qanûndaneriyê nîşan didin.

Komîsyonên lêkolînê yên meclîsê di çarçoveya rêziknameya meclîsê (Meclîs İçtüzüğü) de tên ava kirin. Di xala 98'an a Qanûna Bingehîn[1] de tê gotin ku Meclis bi rêya lêpirsîna meclîsê, nîqaşa giştî, lêpirsîna meclîsê û pirsiyara nivîskî ji bo agahîstendin û kontrolkirinê [bilgi edinme ve denetleme yetkisi] bi kar tîne [Meclis araştırması, genel görüşme, Meclis soruşturması ve yazılı soru]. Lêkolîna meclîsê wekî "lêkolîna ku derbarê mijarekê de ji bo bidestxistina agahiyan tê li darxistin" tê pênasekirin. Qanûna Bingehîn kitekitên avakirina komîsyonên lêkolînê ji rêziknameya navxweyî ya meclîsê re dihêle.

Di avakirina komîsyonê de gava ewil, Pêşnîyara Lêkolînê ya Meclîsê [Pêşnîyara Lêkolînê ya Meclîsê] ye. Heke civana giştî ya meclîsê pêniyarê qebûl bike, komîsyon bipêş dikeve. Rêzikên 104 û 105ê yê rêziknameya navxweyî ya meclîsê, wan standartan diyar dike bê komîsypneke meclîsê ya lêkolînê dikare çi karan bike. Komîsyona lêkolînê ya meclîsê dikare ji van saziyên jêrê agahiyan bixwaze, lêkolînan li wan bike û bangî xebatkarên wan bike; "wezaret, daîreyên xwedî butçeya giştî û têkelhev, birêveberiyên xwecihî, muxtarên taxan, zanîngeh, Saziya Radyo û Televîzyonê ya Tirkiyê, Teşebûsên Iktîsadî yên Ameyê, banka û saziyên ku bi qanûnên taybet an jî bi erka ku qanûna taybet dide, hatine ava kirin, saziyên pîşeyî yên ameyê û komeleyên ku ji bo berjewendiya ameyê kar dikin [2]." Di lîsteyê parlamenter cih nagirin û nediyare bê endamên saziyên ewlehiyê yên dewletê dihewîne yan na. Polîs û leşkerên li ser kar bi rêzê bi wezareta karên navxweyî û wezareta berevaniyê ve girêdayî ne. Lê belê "kesên eleqedar" terma [kesên eleqedar *]* ji bo diyarkirina bê wê komîsyona meclîsê bangî kê bike, termeke ne diyarker e. Prosedûra Qaîdeyan, wê erkê dide komîsyonan ku "ji pisporê ku ew wan guncan dibîne agahiyan werbigre". Ev agahî *helbet* derbarê endambûna sektora ameyê de tu sînordariya dananynê. Lê belê rêyên ku dê bi wan li van agahşyan were gerîn kêm in. Herweha kesên eleqedar ku hatine hilbijartin an jî pispor dema ku hevkariyê red bikin, nîşaneyeke bê wê çi were kirin jî ne diyare.

Li Tirkiyê, komîsyonên lêkolînê yên meclîsê ji desthilata dadwerî, yên wekî erka gazîkirinê [yeminli ifade alma yetkisi] bê par in. Ji ber ku Dadgeha Qanûna Bingehîn bi temamî çalakiyên meclîsê ji çalakiyên dadgehî cuda dinirxîne taybetmendiyên komîsyonên meclîsê yên wekî dadgehan red dike. Her çend ev komîsyon dikarin

[1] Ji vê derê hûn dikarin xwe bighînin teksta amkezagona bingehîn: https://global.tbmm.gov.tr/docs/constitution_en.pdf [Ingilîzî]; https://www5.tbmm.gov.tr/anayasa/anayasa_2018.pdf [Tirkî].

[2] Meclisa Mezin ya Gel a Tirkiyê *Rêziknameya Meclîsê Xal 105. ji vir hûn dikarin xwe bighînin Rêziknameya Meclîsê* https://www.mevzuat.gov.tr/MevzuatMetin/17.5.584.pdf adresinden ulaşılabilir .

hema bêje bi her kesên eleqedar re bixwazin hevdîtinan bikin jî, komîsyon ne xwediyê wê erkê ne ku mafê muafiyeteke hesabpirsîna qanûnî bidin. Ev, dema li hember sucdarkirina xwe bi normeke qanûnî (li dijî xwe îfade dayîn) re bibe yek, dê jêhatîbûna ku ev komîsyon ji kesên gumanbar ku agahiyan hesas vedişêrin û ji endamên saziyên dewletê agahiyan werbigrin sînordar bike.[3]

Têkiliya di navbera komîsyonên lêpirsînê û darazê de, bi taybetî di demên ku lêpirsîn û komîsyon di heman wextî de çalakiyan li dardixin de dibe sedema nîqaşan. Di vê qadê de erk nediyar in. Girêdanên rasterast yên komîsyonan bi dozgeriyan re tune ne. Li gel vê yekê jî, dozgerek, dikare bi agahiyên nû yên ku komîsyonekê bi dest xistine, dozeke nû veke an jî lêpirsîneke berê dîsa di ber çav re derbas bike. Lê li gel vê yekê jî diare were gotin ku, Komîsyonên Lêkolînê yên Meclîsê bi awayekî wisa hatine sêwirandin ku hêza wan ya *hiqûqî* û *şênbêr* pir kêm be.

***Hilbijartina bûyeran ya ji bo vê raporê***

Wekî li deverên din bûyî, komîsyonên lêkolînê yên meclîsê ji bo berjewendiya ameyê gelek mijar lêkolîn kirin, lê belê mijarên derbarê dadweriya dema teperî de pir kêm bûn: Du heb komîsyon derbarê derbeyên leşkerî de bûn û sê heban jî lêkolîn li ser kuştinên siyasî kirin ku nehatibûne aşkere kirin. Heya îro tu komîsyonên lêkolînê yên meclîsê di sernavê xwe de cih nedaye terma “mafên mirovan”.

Li gel komîsyonên derbasdar, komîsyonên jêr komîsyonên daîmî yên meclîsê xebatên lêpirsînê dimeşînin. Di parlamentoya Tirkiyê de, komîsyoneke mafê mirovan ya ku di sala 1990î de hatibû damezrandin jî di nav de bi tevahî 16 komîsyonên daîmî hene. Komîsyona mafên mirovan ji roja ku hatiye damezrandin heya sala 2021ê 21 rapor weşandin.

Ji bo mebestên vê raporê, sê komîsyonên lêkolînê yên meclîsê û komîsyoneke jêr a komîsyona daîmî ku karê wan rasterast bi tundiya siyasî û binpêkirinên mafên mirovan re têkildar e, hatine destnîşankirin. Sazkirina şert û mercên çarçoveyê ji ber sê sedeman girîng e: (1) Li Tirkiyê û li deverên din ji bo mijarên ku bi binpêkirinên mafên mirovan ve ne girêdayî ne komîsyonên lêkolînê yên meclîsê hatine avakirin, ji ber vê yekê divê komîsyonên ne têkildar bên fîltrekirin; (2) hinek komîsyon behsa mafên mirovan bikin jî, dibe ku bûyerekê an jî bûyerên bi hejmareke pir hindik vekolin; lewra ew komîsyon jî li derve hatine hiştin; û (3) hin komîsyon, li ser

[3] Agahiyên di vê beşê de ji roportaja ku min di 31 Çile 2022an de bi Ulaş Karan (Zoom) re kiribû hatine wergirtin.

binpêkirinên mafên mirovan ên li welatên din diqewimin ku ew welat li derveyî vê projeyê ne. Bi gotineke din, analîza ampîrîk bi wan komîsyonên lêkolînê yên meclîsê ve sînorkirî ye ku li ser binpêkirinên mafên mirovan ên girseyî û sîstematîk ên li Tirkiyeyê lêkolînan dikin, û vekolîna lîteratûra ku rêberiya wê dike jî ezmûnên li Uruguay, Perû û Almanyayê yên bi heman rengî li ber çavan digire. Hişyariyek din jî ev e ku hinek lêkolînerên dadweriya dema teperî li çaraliyê cîhanê hin komîsyonên lêkolînê yên parlementoyê wekî komîsyonên heqîqete beşdar dikin lê hinekan jî li derve dihêlin. Hemû komîsyonên meclîsê yên li gorî pênaseya jorîn , di lîterarûrê de wekî komîsyona heqîqetê derbas bibin jî nebin jî di vê raporê de cih digirin.

Ev rapor di analîza ampîrîk de li ser çar komîsyonan (sê komîsyonên lêkolînê yên meclîsê û komîsyoneke jêrîn) disekine:

- Komîsyona Lêkolînê ya Meclîsê ku ji bo ronîkirina qezaya ku li Susurlukê pêkhatî, têkiliyên li pişt wê û pêwendiyên rêxistinên derqanûnî yên bi dewletê re hat avakirin. [*Yasadışı Örgütlerin Devletle Olan Bağlantıları ile Susurluk'ta Meydana Gelen Kaza Olayının ve Arkasındaki İlişkilerin Aydınlığa Kavuşturulması Amacıyla Kurulan Meclis Araştırması Komisyonu*] (1997)
- Komisyona Lêkolînê ya Meclisê ku ji bo hemû derbe û muxatabên ku mudaxeleyî demokrasiyê dikin û hemû însiyatîf û pêvajoyên din ên ku demokrasiyê li welatê me nexebitînîn bi berfirehî lêkolîn bike û tedbîrên ku dê bên girtin diyar bike. [Ülkemizde Demokrasiye Müdahale Eden Tüm Darbe ve Muhtıralar ile Demokrasiyi İşlevsiz Kılan Diğer Bütün Girişim ve Süreçlerin Tüm Boyutları ile Araştırılarak Alınması Gereken Önlemlerin Belirlenmesi Amacıyla Kurulan Meclis Araştırması Komisyonu] (2012)
- Komisyona jêrîn a meclîsê ya ji bo lêkolînkirina binpêkirinên mafê jiyanê di çarçoveya teror û tundûtûjiyê de. [*Terör ve Şiddet Olayları Kapsamında Yaşam Hakkı İhlallerinin İncelenmesine Yönelik Alt Komisyon*] (2013)
- Komisyona Lêkolînê ya Meclîsê ji bo lêkolînkirina rêyên aştiya civakî û nirxandina pêvajoya aştiyê. [*Toplumsal Barış Yollarının Araştırılması ve Çözüm Sürecinin Değerlendirilmesi Amacıyla Kurulan Meclis Araştırması Komisyonu*] (2013)

Ev her çar lêkolîn ji xwe ber pêk nehatin; zextên aliyên siyasî, rêxistinên civaka sivîl, komên mexdûran û car caran yên aktorên navneteweyî yên li ser parlamentoyê hişt ku parlamento van komîsyonan ava bike û piştgiriyê bide wan. Li gel vê yekê, rojnameger û komên civaka sivîl, di mijara lêkolîna binpêkirinên mafên mirovan û çalakiyên sûc yên bi piştgiriya dewletê tên kirin de xwedî ezmûn û dîrokeke dirêj in.

Ev rapor bi hewldanên keşifkirina wan ya ji aliyê civaka sivîl ve girêdayî, komîsyonên fermî dikolê.

***Dane û Rêbaz***

Armanca giştî ew e ku têgihiştineke kûrtir li ser damezrandin, xebitandin û qebûlkirina sê komîsyonên lêkolînê yên meclîsê û  komîsyoneke jêrîn ya meclîsê pêş bixe. Çavkaniya bingehîn a agahdariyê, naveroka komîsyonê ye. Analîza naverokê ya hejmarî û kalîteyî ji bo ravekirin û têgihîştina endamtî, encam, pêşniyar, çarçoveyên vegotinê, tiştên hatine beşdarkirin an jî derxistin yên hemû komîsyonan tê bikar anîn. Arşîvên rojnameyên ku komîsyonan vedihewînin analîza naverokê temam dikin. Her komîsyon jî li gorî endamtiya partiyê ya endamên xwe tê analîzkirin. Çarçovekirina mijarên siyasî ya ji aliyê endamên cuda yên komîsyonê ve û cudakariya di mijara derbirîna van fikran de, derbarê siyaseta van komîsyonan de û îhtîmala lihevkirin û lihevnekirinê wan de jî fikrekî dide.

Herweha ji bo vê projeyê bi kesan re hevdîtin hatine kirin ku di vê qadê de pispor in an jî xwedan tecrûbe ne. Hevdîtin, di navbera 25 Çilê û 2 Sibat 2022an de ji dûr ve hatine pêkanîn. Kesên ku bi wan re hevdîtin hatine kirin ev in:

- Ozgur Sevgi Goral, Roportajkar û endama Hafiza Merkezi ya di Komîsyona Pêvajoya Aştiyê de
- Murat Çelikkan, Endamê Hafiza Merkezi yê di Komîsyona Pevajoya Aştiyê de dîdar
- Ozturk Turkdogan , wekî serokê Komeleya Mafê Mirovan [İnsan Hakları Derneği ] dîdarê Komîsyona Jêr a Mafên Jiyanê û Komîsyona Pêvajoya Aştîyê
- Nadire Mater ji bo ajansa nûçeyan ya bêalî *Bianetê* wekî şêwirmenda projeyê roportajkara Komîsyona Jêr a Mafê Jiyanê
- Ulaş Karan, Li Zanîngeha Bilgiyê ya Stenbolê doçent doktorê Zankoya Hiqûqê

Lîteratûra ampîrîk û normatîf ya li ser wead û karîgeriyên komîsyonên meclîsê yên lêkolînê û komîsyonên heqîqetê yên li çaraliyê cîhanê rêberiya analîzê dikin. Komîsyonên Meclisa Tirkiyeyê li ser van pirsên li jêrê tên analîz kirin:


- Endamên komîsyonê bi rêbazeke bêalî an jî ji hêla polîtîk ve bi awayekî nûnerîya giştî hatin hilbijartin?
- Gelo komîsyonê pêwîstiya keşifkirina hemû rastiyên têkildarî tundî û binpêkirinên di raboriyê de pekhatî anîye cih?

- Komîsyonê, atmosfera siyasî ya raboriyê ku rê li ber tundûtujî û binpêkirinan vedikir bi kîjan rêyan çarçove kir?
- Di van komîsyonan de qadên dijberî û lihev nekirinê çi bûn?
- Komisyonê, ji bo tundûtujî û binpêkirin dubare nebin pêşniyarin kirin?
- Encam û pêşniyarên komîsyonê bi raya giştî re hatine parvekirin?
- Siyasetmedaran pêşniyarên komîsyonê bi cih kirine?
- Rêxistinên mafên mirovan û komên din yên civaka sivîl, diyar kirine ku ji encamên komîsyonê û pêşniyarên wê kêfxweş in?

***Awirtêdaneka bi giştî li raporê***

Beşa 1ê, komîsyonên lêkolînê yên meclîsê destnîşan dike, wan di qada berfirehtir a dîtina heqîqetê ya fermî de bi cih dike, û ji sê welatan (ango Uruguay, Perû û Almanya) mînakan bikartîne û bi rêya van komîsyonan avantaj û dezavantajên hesabpirsîna di warê binpêkirinên mafên mirovan nîqaş dike. Beşên 2, 3, 4 û 5ê bi rêzê ji bo analîzên Komîsyona Susurlukê, Komîsyona Darbeyê, Komîsyona Binpêkirinên Mafên Jiyanê û Komîsyona Pêvajoya Aştiyê hatiye veqetandin. Her yek ji van beşan bi nihêrînek li ser çarçoweya qanûnî, siyasî û civakî dest pê dike, pişt re agahdariyên bingehîn yên derbarê endamên komîsyonê, armanc, rêgez û rapora dawîn de ten. Naveroka her rapora dawîn bi berfirehî tê analîzkirin, piştre tê lêkolîn bê medya, siyasetmedar û rêxistinên civaka sivîl çawa pêşwazî li vê komîsyonê kirine. Beşa 6ê komîsyonan li gorî çarçoweya vegotina wan, tevkariyên ji bo dadweriya dema teperî, qebûlkirina gel û beşdariya civaka sivîl ve dide ber hev û nakokiyên wan nîşan dide. Beşa 7ê ji bo parlamenter û saziyên civaka sivîl yên ku dixwazin di dahatuyê de komîsyonên lêkolînê yên meclîsê û saziyên wekî wan yên lêgerîna heqîqetê ava bikin û beşdarî wan bibin,  pêşniyarên pratîk dike û dawiyê li raporê tîne.

**Şiklê Destpêkê. 1: Komîsyonên lêkolînê yên meclîsê yên derbasdar**



BEŞA 1.

# KOMÎSYONA LÊKOLÎNA MECLÎSÊ ÇI YE Û ÇIMA GIRING E?

# Komîsyona Lêkolîna Meclîsê Çi ye û Çima Giring e?

## Di peywenda dadweriya dema têperî de dîtina heqîqetê

Yek ji prensîbên bingehîn yên sepana dadweriya dema têperî ya modern, dîtina rastiyê ye, ku dikare wekî vedîtin û eşkerekirina rastiyên derheqê binpêkirinên mafên mirovan yên di raboriyê de pêkhatî were pênase kirine. Di gelek civakên ku di raboriyê heyameke otorîterîzmê an pevçûnên sivîl jiyayî û raboriya xwe bi berfirehî dikolin de ev binpêkirin di tariyê de dimînin. Ji ber vê yekê, *heqîqet*, li gel *dadwerî*, *lihevkirin*, *selihandin* û *dubarenebûnê wekî yek* ji armancên dadweriya dema têperî derketiye holê (Leebaw 2008).

Rastiyên derbarê binpêkirinên mafên mirovan yên di raboriyê de çi ne û ev çima giring in? Di teoriyê de ev rastî,  kitekitên bûyerên diyar yên mexdûr an mexdûrên binpêkirinekê, kirde an kirdeyan yên dema berî binpêkirinê, dema binpêkirînê û dema piştî binpêkirinê vedihewîne. Dema kirde sûcên xwe veşêrin, derxistina holê ya van sûcan û ji gel re aşkerikirina wan, tekanê rêya wê yekê ye ku civak fêrî binpêkirinên raboriyê bibe. Mexdûrên sax mayî û malbatên mexdûran hem ji bo başiya xwe, hem jî wekî bingeheke rastîn ji bo bernameyeke tazmînatê li bendê ne ku mexdûriyet bi awayekî rast were pejirandin (Minow 1998; Teitel 2000; de Greiff 2006). Di heman demê de, destnîşankirina sûcdaran gava yekem e ku ew bi riya dadgehan an bernameyên vekolînê berpirsiyar werin dîtin(Magarrell 2003) – ya rastî divê were pejirandin ku piraniya hewldanên dîtina rastiyê, kirdeyan bi navên wan yên takekesî pênase nakin û xwe nadin ber vê yekê.

Lêgerîna heqîqetê ne tenê bi derxistina holê ya rastiyên ku dê neyên înkarkirin re eleqedar e. Ew bi qasî pêvajoyê, bi encamê re jî eleqedar e (Hayner 2000) Ji bo mexdûrên saxmayî û  xizmên mexdûran peyda kirina qadeke ku bikaribin çîrokên xwe lê bibêjin, dikarê naskirina mexdûriyetê hêsantir bike û rê li ber wê yekê bigre ku takekes xwe ji civatê venedizin û di saxbûna wan de roleke erênî bilîze (Soyinka 2000) . Heta hinek pispor îdîa dikin, platformên ku destûrê didin mexdûr (û dibe ku sûcdar jî) şahidiyê di wan de bikin, dikarin xizmeta saxkirina kolektîf û ya bihêzkirina demokratîk bikin (Payne 2007) .

Ji ber ku binpêkirinên mafên mirovan ên girseyî û sîstematîk bi gelemperî veşartin û dezenformasyonê vedihewînin, lêgerîna heqîqetê bi awayekî zêde bûye hêmaneke bivê nevê ya xebata li ser raboriyê. Windakirina bi darê zorê, îşkenceya di bin desteserkirina veşartî de, piştî komkujiyan veşartina cenazeyan di gorên komî de mînakên

binpêkirinan in ku bi veşartinê ve girêdayî ne. Li gel van, kirdeyên takekesî û saziyî (ku bi gelemperî ji aktorên dewletê û hevkarên wan pêk tên, her weha di gelek rewşan de ji aktorên çekdar ên ku nayên diyarkirin pêk tên) hema bêje her tim rola xwe ya di her bedkariyekê de înkar dikin. Ji bo wê armancê, ew dikarin qeydên fermî veşêrin heta jî holê rakin. Ger înkar stratejiyek be, dezînformasyon stratejiyek din e: kirde ji bo gel bixelitînîn, rêyên pêşkêşkirina xelet yên rastiyan û sucdarkirina kesên din peyde dikin. Sansûra fermî, nebûna serxwebûna darazê û otosansûra medyayê rewşê hîn xerabtir dike.

Li gelek welatan, komên mexdûran, rêxistinên civaka sivîl (SCS) yên wekî komeleyên mafên mirovan û hemwelatiyên din ên ku bi mafên mirovan re eleqedar in, ne tenê di demên wehşetê de, lê di piştî demên wehşetê de jî bi dijminatiyê re rû bi rû dimînin. Ne pêkane ku dadwerî û çapemenî di nebûna guhertineke berbiçav ya siyasî de, di çarçoweya demokratîkbûn an aşitiyê de jî, pêşekiyê bide fikrên derbarê mafên mirovan. Dezgehên cîbicîkar û qanûndanêriyê, bi skrûktura van dezgehan û karîgeriya siyasî ya kirdeyên kevn ve girêdayî, dib eku guh bide bangên ji bo heqîqet û dadweriyê an jî wvan bangan ji nedîtî ve were.  Di dadweriya dema têperî de ‘têperî’ ew dem e ku bi zelalî ji raboriya ku bi binpêkirinên mafên mirovan tije ye venaqetê lê bi gelemperî têkeliyeke berdewamiya wê raborî û veguherînê ye. Ji ber vê yekê, keşifkirin û aşkerekirina binpêkirinan ya ji raya giştî re, îradeya siyasî, zexta civakê û di gelek rewşan de, tawîzan hewce dike (ji bo kurteyeke newaze ya nîqaşên li ser wekî qadekê dadweriya dema têperî, binêre.: Arthur 2009).

## Cureyên hewldanên dîtina heqîqetê

Hikûmet û SCS, ji bo heqîqetên derbarê binpêkirinên mafên mirovan yên di raboriyê de keşif bikin û wan aşkere bikin, mekanîzmayên cûrbecûr bikar tînin. Ev çar mekanîzma divê bi kurtasî werin nîqaş kirin: komîsyonên lêpirsînê yên serokatî an parlementoyê, komîsyonên heqîqetê, hewildanên heqîqetê yên derveyî hikûmetê, û saziyên mayindê yên bîranînê (ji bo nîqaşên têgînî, binêre: Bickford 2007; Hayner 2010; Wiebelhaus-Brahm 2010; Bakiner 2015) . . . Hêjayî gotinê ye ku dadgeh û çapemenî dikarin di piştgirîkirina van hewldanan de rolekî girîng bilîzin (û carinan jî dikin) ,  lê ew ji ber du sedeman ji vê analîzê têne derxistin: Ya yekem, ev mekanîzmayên sazûmanî yên bicihbûyî, di çarçoveya dozan de xwedî erkên ji dîtina heqîqetê bi wêdetir in, binpêkirina mafên mirovan; û ya duyem, di destpêkê de tişta ku pêdiviya hewldanên dîtîna heqîqetê ya bi pisporî derdixe holê bi gelemperî têkçûna dadgeh û çapemeniyê ye.

Komîsyonên lêkolînê yên serokomariyê yan parlementoyê: Ev endamên ku pêkhateyeke sazkirî yê pergala siyasî ne, ji aliyê saziya cîbicîkar an qanûndanêriyê ve têne erkdar kirin ku di mijarên bi raya giştî re eleqedar de, agahdariya kûr bidin. Ev bi gelemperî ji siyasetmedarên çalak pêktên – di komîsyonên meclîsê yên ku ji endamên parlamentoyê pêktên de- pisporên ji derve jî dikarin beşdar bibin.

Komîsyonên Heqîqetê: Her weha wekî komîsyonên heqîqet û lihevanînê jî têne zanîn, ev dezgehên derbasdar in û  ji hêla dezgeha cîbicîkar an jî qanûndanêr (û di çend rewşan de, ji aliyên rêxistinên navneteweyî yên wekî Neteweyên Yekbûyî) ve ji tên damezrandin da ku vekolîna binpêkirinên mafên mirovan yên di raboriyê de bikin. Li gel ku ew pir bişibin komîsyonên lêpirsînê ku me li jorê qala wan kiribû jî, endamên komîsyonên heqîqetê, ne siyasetmedarên çalak an jî burokrat in. Armanca vê yekê jî ewe ku heya bi astekê ji hêla siyasî ve ew serbixwe bin. Her çend ew ji nêz ve dişibin komîsyonên lêpirsînê yên li jor behskirî jî, endamên komîsyonên heqîqetê bi gelemperî ne siyasetmedarên çalak û ne jî burokrat in, ku ji bo misogerkirina dereceyek serxwebûna siyasî ye. Popularîteya Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê ya Afrîkaya Başûr (1995-1998) di dawiya salên 1990-an û 2000-an de komîsyonên heqîqetê veguherandin fenomeneke cîhanî.

Hewldanên heqîqetê yên derveyî hikûmetê: Komên mexdûran û rêxistinên mafên mirovan lêkolînan dikin û daneyan berhev dikin da ku saziyên dewletê temam bikin û sererast bikin, û di gelek rewşan de valahiya ku ji ber xemsariya wan saziyan ya di warê mafên mirovan de çêbûye tijî dikin. Hewldanên derveyî hikûmetê ne fermî bin jî, daneyên wan dikarin bibin bingeha lêpîrsinan, zextê li siyasetmedaran bikin da ku bikevin nav tevgerê û ji kanalên fermî pir bi bandortir raya giştî agahdar bikin.

Saziyên bîranînê yên daîmî: Parastina bîra dîrokî û veguhastina wê ya ji nifşên ciwan re di nav armancên sereke yên demdirêj yên destpêşxeriyên lêgerîna heqîqetê de ne. Ji bo vê armancê, hin welatan ji bo arşîvên mafên mirovan biparêzin û daneyan li muzexaneyan bidin pêşandan, rêxistinên daîmî ava kirine. Ev sazî wekî mînak dema projeyên dîroka devkî dihewînin, dibe ku keşifkirina heqîqetan teşwîq bikin, lê tevahiya van, ji devla lêgerîna heqîqetê, giraniyê didin ser parastina arşîv û danasîna wê û rka xwe ya bi destxistina heqîqete pêk nayînin.

Wekî ku ev raveyên kurt eşkere dikin, komîsyonên lêkolînê yên meclîsê celebek destpêşxeriye ye ku di nav yên din de rastiyên der barê xeletiyên raboriyê de eşkere bike û ji raya giştî re ragihîne. Hêja ye ku di beşa pêş de em bêtir bala xwe bidin taybetmendiyên wan.

## Terîfkirina komîsyonên lêkolînê yên meclîsê

Komisyona lêkolînê ya meclîsê, komîsyoneke derbasdar e, ji bo di berjewendiya raya giştî de lêkolîna bûyerekê an bûyeran bike ji aliyê endamên saziyeke qanûndanêriyê vê hatiye ava kirin û erkdar kirin. Endambûna komîsyoneke bi vî rengî dibe ku bi qanûndanêran an endamên têkelhev yên ku ji qanûndaner û pisporên derveyî pêk tên re sînordar be. Her wiha hin komîsyon ji bo îfadeyê şahidên derve vedixwînin. Di warê mijarên ku ji aliyê komîsyona lêkolînê ya meclîsê ve bên lêkolînkirin, ti astengî tunene. Heke pêwist be ku em du mînakan ji raboriyekê nêzîk bidin, di sala 2017-an de Brezîlyayê komîsyoneke lêkolînê li ser reforma çandiniyê ava kir, Mozambîkê yek derbarê deynên dewletê de ava kir.[4] Di dema nivîsandina vê raporê de, Komîteya Hilbijartinê ya Meclisa Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li gel lêpîrsîneke senatoyê ku di Hezîrana 2021ê de bi dawî bibû , lêkolîna serhildana Capitol-ê ya ku di 6-ê Rêbendana 2021-an de pêk hatibû jî dikir. Ji ber vê yekê qadên pirsgirêkan yên ihtîmalî bêsînor in; lê belê di çarçoveya mebestên vê projeyê de, mijarên navborî tenê bi binpêkirinên girseyî yên mafên mirovan û şikandina desthilatdariya demokratîk re sînordar in.

Komîsyonên lêkolînê yên meclîsê bi destpêşxeriyên din ên lêgerîna heqîqetê yên wekî komîsyonên lêpirsînê yên serokomariyê, komîsyonên heqîqetê û xebatên civaka sivîl re xwedî gelek taybetmendiyan hevpar in. Eger rejîma siyasî ya welatekî weke sîstemeke parlementoyê hatibe sêwirandin, wê demê komîsyonên lêkolînê yên parlementoyê helbet zêde ne, lê sîstemên serokatiyê û yên nîvserokatiyê jî li gor dabeşkirina desthilat û erkan ya di navbera dezgehên cîbicîkar û qanûndanêriyê de, dikarin komîsyonên têkeliya serokatî û parlementoyê jî bikar bînin. Hêjayî gotinê ye ku komîsyonên heqîqetê li gelek welatan guhertoyên cuda yên komîsyonên lêpirsînê yên serokatî û parlementoyê ne, di vê çarçoveyê de di van komîsyonan de wekî endamê komîsyonê ji devla sîyasetmedarên li ser kar û burokratan, kesayetiyên ji derve ku ji aliyê raya giştî ve pir tên nasîn, tên hilbijartin. Heya îro, pisporên dadweriya dema têperî gengeşe dikin ka komîsyonên parlementoyê di nav komîsyonên heqîqetê de dikarin werin hesibandin an na. Wekî mînak, komîsyona lêkolînê ya parlementoya Uruguayê ya sala 1985-an, di nivîsa li ser komîsyonên heqîqetê ku di vî warî de bûye klasîkek ya Priscilla Hayner cih digire (Hayner 2010) lê Freeman (2006) wê li derve dihêle. Bi heman awayî, komîsyonên lêkolînê yên salên 1992 û 1995an yên Almanyayê di hin lîsteyên komîsyonên heqîqetê de cih girtine (Brahm 2009; Kochanski 2020) lê di yên din de cih negirtine.

---

[4] Amnesty International. 2018. "Amnesty International Report 2018/18: The State of the World's Human Rights."

Bi gotineke din, gelek wekheviyên di navbera hewldanên din yên lêgerîna heqîqetê û komîsyonên lêkolînê yên meclîsê de ji ber çavkaniyên ku dişibine hev derdikevin holê. Wekî din, armanc, prosedur û encam jî di wê meylê de ne ku nêzî hev bibin: Armanca bingehîn a van hemî destpêşxeriyan aşkerekirina rastiyêna ku dibe di encama sansura fermî, bêçalakiya dadweriyê, baldarnebûna medyayê û atmosfereke tirs û bêaramiyê de veşartî bimînin. Ji derveyî hêza sînordar a gazîkirina şahidan û sûcdarên îdiakirî yên ji bo îfadeyê, ku li gelek welatan jî nayê dayîn, komîsyonên meclîsê fonksiyonên mîna dadgehê pêk naynin – ev taybetmendiyeke hevpar e bi komîsyonên heqîqetê re, li gel çend îstîsnayan jî, di mijarê erkên fermî ve qelstir in. Û wekî encam, dane û pêşniyarên komîsyonên meclîsê dibe ku hewayeke pejirandina fermî bihewînin, lê pejirandina daneyan û bi cih anîna pêşniyaran, li derveyî kontrola endamên komîsyonê, bi komek faktorên siyasî ve girêdayî ye.

Wekheviyên weha li aliyekî, prosedurên ku xebatên komîsyonên lêkolînê yên meclîsê bi rê ve dibin, ji înîsiyatîfên din ên lêgerîna heqîqetê bi gelekî cûdatir in. Berî her tiştî siyaseta hizbî pêkhateyekexwezayî ya van komîsyonan pêk tîne. Beşdarên înîsiyatîvên din ên lêgerîna heqîqetê jî berjewendî û nirxên xwe yên siyasî tînin nav xebatên xwe, lê komîsyonên lêkolînê yên parlamentoyê vê yekê eşkere dikin, ji ber ku piraniya endamên wan an jî hemû endamên wan parlamenterên li ser kar in. Ji ber vê yekê ji saziyên siyasî yên ku dixwazin bibin komîsyonên heqîqetê û ji bo komîsyonên lêkolînê yên meclîsê serbixwebûn, ne pêkan e û nayê xwestin jî. Bi vê yekê re eleqedar, siyasetmedarên ku van komîsyonan pêk tînin, bi gelemperî li gor endamên komîsyonên heqîqetê an jî xebatên lêgerîna heqîqetê yên civaka sivîl, xwedî têkiliyên lawaztir in. Ji ber vê yekê dîzaynkirina komîsyonên lêkolînê yên meclîsê ku ji lijneyeke lêkolînê ya nav saziyê zêdetir be pir zehmet e.

## Di komîsyonên meclîsê de awantaj û dezawantajên potansiyel yên lêkolîna xeletiyên raboriyê

Komîsyonên lêkolînê yên meclîsê li gorî komîsyonên heqîqetê derfet an kêmasiyan berpêş dikin? Komîsyonên heqîqetê ji salên 1990î û vir ve di piraniya civakên ku bi raboriyê re hesab dibînin de serdest li hemû nîqaşên ameyî kir; Ji ber vê yekê, dema komîsyonên heqîqetê wekî alternatîfekê hebin, pirsa komîsyonên meclîsê tên xwestin in an jî hewceyî bi wan heye cihê meraqê ye. Kêmasiyek eşkere ya komîsyonên parlementoyê ew e ku rasterast girêdana wan bi prosesa siyasî ve heye û ev jî tê wê wateyê ku ew li hember guhertinên siyasî bêparastin in: piştî hilbijartinekê pêkhateyeke siyasî ya cûda ku pêkwere heta di heman serdema qanûndanêriyê de ku fikir biguhere, dikare çarenûsa van komîsyonan diyar bike. Herweha ji ber ku ew dê dubendî û bêserbûna pergala sîyasî temsîl bikin, dibe ku di nav raya giştî de baweriyê

pêk neyînin. Méndez û Mariezcurrena tercîha civakê ya ji bo komîsyonên heqîqetê yên serbixwe li hember saziyên qanûnî an îdarî bi kêmasî û nebûna populerbûna saziyên heyî yên li piraniya Cîhana Sêyem ve girê didin (Méndez û Mariezcurrena 2003, 255-256). Herwisa komîsyonên heqîqetê li welatên mîna Arjantînê, ku rapora encamê wê di sala 1984an de bû kitêbeka ku herî zê de tê firotin û komîsyonê heqîqetê yên wekî li Afrîkaya Başûr ku danişînên wê di televizyonan de hatin weşandin binpêkirinên mafên mirovan ên rejîma apartheid nîşan didan, biserketin ku bi awayekî karîger xwe bigihînin raya giştî. Bi awayekî ku dê komîsyonên meclîsê nekira dibe ku ji bo welatên din jî bibin cihê sudwergirtinê.

Her çend di nav parêzvanên mafên mirovan û zanyaran de bi qasî komîsyonên heqîqetê ne populer bin jî, divê komîsyonên meclîsê bi tevahî neyên paşguh kirin. Avantaja wan a herî mezin ew e ku soz tê dayin ku lêkolîna rastiyan û weşandina wan bi fermî ji aliyê saziyeke siyasî ya damezrandî ve were pejirandin. Li Arjantîna welatê ewil yê ku komîsyoneke heqîqetê ava kir û raporeke encama wê weşand, dema ku em vegerin û li raboriyê binêrin, dê şaşwazkar be ku xizmên wendayan û saziyên civaka sivîl, komîsyonên heqîqetê yên ne partîzan wekî mekanîzmayeke dadweriya dema têperî pîroz kirine. Her tim daxwaza komîsyoneke lêkolînê ya parlementoyê dihate kirin (Oettler 2006, 16)  ji ber ku wan dixwest endamên komîsyonê “ji kirdeyan û saziyên leşkerî agahiyan bistînin” (Hayner 2010, 45). Herweha, xwezaya partîzaniya komîsyonên parlamentoyê dikare wekî hêzekê were şîrove kirin, ne wekî qelsiyekê: lêpirsîna ji raya giştî, nîqaş û nelihevkirin bingeha siyaseta demokratîk in û endamên meclîsa qanûndanêr yên ku hilbijartin di rewşa herî baş de ne ku van xebatan bimeşînin.

Berî ku em vê beşa li ser avantaj û dezawantajên potansiyel ên çareserkirina xeletiyên rabirdûyê bi riya komîsyonên lêkolînê yên meclîsê biqedînin, hin mînakên ji rabirdûya nêzîk hêjayî berpêş kirinê ne. Tevî ku gelek welatan binpêkirinên mafên mirovan ên rabirduyê bi rêya komîsyonên meclîsê vekolabin jî, ji wan komîsyonan tenê çendeka jê têra xwe bala medyayê û zanyaran kişandine. Ger em çend mînakan bidin: Di sala 1991 de, parlamentoya Lîtvanyayê ku nû serbixwe bibû, ji bo naskirin û tesfiyekirina ajanên KGByê komîsyonek ava kir (Schlunck 1998); Komîsyona Meclisê ya Slovenyayê ya li ser Kuştinên Komî yên Piştî Şer, Dadgehkirinên pêşandanî û Bêedaletiyên Din ên Wekî van  di sala 1993an de xwest ku ronahiyê bide ser hovîtiya berê ya li wî welatî (Steinbacher, Steinbacher, and Steinbacher 2012, 423); Komîsyona Lêkolînê ya Parlamentoya Hollandayê ya bi navê Kômîsyona Lêpirsîna Srebrenicayê, ku di 2002 de hate damezrandin, berpirsiyariya Hollandayê ya di kuştina girseyî ya Boşnakan li Srebrenicayê ku di 1995an de pêkhatibû  nîqaş kir (van den Berg 2009; Rijsdijk 2018); û di 2001ê de, parlamentoya Belçîkayê rola wî welatî ya di kuştina serokê Kongoyê

Patrice Lumumba ku di sala 1961ê de pêkhatibû nîqaş kir. (Marchand, Uwashema, and Deprez 2020).

Ev beş li ser komîsyonên li sê welatan, ango komîsyonên ku li Ûrûguay (1986), Peru (1987) û Almanya (1992, 1995) hatine damezrandin (1992, 1995) kûr dibe. Lewra ka xebitîn û daneyên wan, di qada dadweriya dema têperî de ji mînakên din zêdetir hatine analîz kirin û nîqaş kirin. Ji ber vê yekê destkeftî û têkçûnên wan dikarin ji bo vê raporê bibin û derên din bingehek.

## Mînakên balkêş ên komîsyonên lêkolînê yên parlamentoyê

### *Ûrûguay*

Di dema Şerê Sar de, mîna welatên din ên li Quça Başûr, pêşveçûna demokratîk a Ûrûguay di encama derbeyeke leşkerî ya rastgir ku di27ê Hezîrana 1973an pêkhat û bi biryar bû ku tevgerên çepgir bişkîne, ji nişka ve bi dawî bû. Dîktatoriya 11 salan berdewam kirî, bi hezaran mexdûrên zindanî yên siyasî, îşkence, sirgûnên bi darê zorê û hejmareke hindiktir ji windakirinên bi darê zorê li pey xwe hiştin. Li gel vê yekê, hukûmetên demokratîk di salên destpêkê yên têperiyê de, di mijara hesabpirsîna ji sucdaran de pir bêdil bûn. Li hember zêdebûna zexta raya giştî ya ji bo lêkolînkirina binpêkirinên rabiduyê, parlamentoyê di sala 1985an de Komîsyona Lêkolînê ya li ser Rewşa Kesên Wendabûyî û Sedemên Wê [*Comisión Investigadora sobre la Situación de Personas Desaparecidas y Hechos que la Motivaron*] ava kir. Lêpirsîneke parlamentoyê ya rastênhev hat lêkolîn kirin. Kuştina du parlamenteran ya di sala 1976an de. (Hayner 2010, 241-242).

Desthilatê, karê komîsyonê tenê bi vekolîna wendayan re sînordar kir ku ev sînordariyeke pir giran bû, ji bo welatekî ku îşkence û cezayê zindanîkirina siyasî lê pir berbelav bûn. Di dawiyê de, di lêpirsîna heft mehan de agahî li ser 164 dozên wendabûnê hatin dîtin û ev agahî ji bo  Dadgeha Bilind hatin şandin (Hayner 1994, 616). Lê belê, xebata pir teng ya komîsyona meclîsê di nav civaka mafên mirovan de nerazîbûnek weha derxist holê ku Servicio Paz y Justicia – Uruguay (SERPAJ),  a ku Saziyeke Civaka Sivil bû, projeya xweya alternatîf a dîtina heqîqetê ya bi navê “Ûrûguay Careke Din Qet” [*Uruguay Nunca Más*] pêk anî (Burt, Fried Amilivia, and Lessa 2013; Barahona de Brito 1993). Seferberiya domdar a civaka sivîl ji bo rastî û berpirsiyariyê bû sedem ku hukûmeta Ûrûguayê di sala 2000î de komîsyonek serbixwe ya heqîqetê ava bike.

***Peru***

Pevçûna çekdarî ya navxweyî ya di navbera serhildana Maoist Shining Path û dewleta Peruyê de, dema ku welat di sala 1980an de derbasî desthilatdariya sivîl û demokratîk bû dest pê kir. Tûndûtujiya ku heya sala 1992an de serokê Shining Pathê hate girtin berdewam kir, bi gelemperî herêmên li çolterê yên niştecihan xerab kirin û heya bi navendên bajaran, zanîngehan û girtgîhan berbelav bû. Yek ji kiryarên herî şokbexş yên tundiya dewletê di çarçoveya serhildanên zindanan de li Lîma û derdora wê di 18-19ê Hezîrana 1986an de pêk hat. Bangên navxweyî û navneteweyî yên ji bo lêkolînkirina qetlîamên girtîgehê, hukûmeta serok Alan García neçar kir ku komîsyoneke lêkolînê ya parlamentoyê qebûl bike.Di sala 1987an de Komîsyona Lêkolîna Bûyerên Li Girtîgehan [*Los Sucesos De Los Penales*].[5] hat ava kirin.

Endamên partiya García ya Hevbendiya Şoreşger a Gel a Amerîkî (APRA) di komîsyonê de zêde bûn, lê serok Rolando Amesê ku senatorekî ji opozîsyona çepgir bû. Ev bijartin bi zexta navneteweyî ve girêdayî ye (Feinstein 2014). Derbarê armanc û wezîfeyên komîsyona ku bi "wezîrên berê, endamên Fermandariya Hevbeş a Hêzên Çekdar, efserên leşkerî û polîs, endamên Dadwerî û Wezaretên Dewletê, endamên Dadgeha Bilind û şahidan re" hevpeyvîn kirin û nirxandin de pir kêm tişt tênê zanîn. Li gel Encumena Dadweriya Leşkerî mehkûmên saxmayî yên ku bibûn şahidên serhildan û operasyonên leşkerî yên pey serhildanê re " di nava 4 mehan de" hatin guhdarî kirin (Feinstein 2014, 26).

Belkî aliyê herî neasayî yê komîsyonê encama wê ya dawiyê bû. Di sala 1988an de du raporên dawîn hatina amade kirin yekê jê nêrînên APRAya ku xwedî zêdetirên endamên bû dihewandin û ya din jî ji aliyê Ames ve hatibû nivîsandin û ji aliyê parlementerên muxalefetê ve hatibû îmzekirin. Rapora dawîn rola hikûmetê ya di dema komkujiyan de rexne dikir. Wekî encamê, "Kongreyê bi awayekî ne şaşwazkar, rapora piraniyê pejirand ku berpirsiyariya serok û kabîneya wî red kir" (Aguirre 2013, 210-211). Cûdahiyên berbiçav yên di encaman de di hewildanên belavkirinê de jî hatin xurt kirin: García û endamên partiya wî ku piraniya parlementoyê pêkdianîn, hilbijartin ku her du raporan jî neweşînin. Lê di heman demê de Amesê ji bo parastina encamên rapora xwe serî li parêzvaniya giştî da (Feinstein 2014, 31). Piştî bi salan, Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê (2001-2003) ku Ames jî endamê wê bû, encamên bingehîn ên rapora muxalefetê piştrast kirin û destnîşan kir ku Alan García di komkujiyên li girtîgehan de "berpirsiyariya siyasî ya zêde" wergirtiye (Aguirre 2013, 211).

---

[5] Agahdariya bingehîn yên derbarê komîsyona Peruyê de li vê navnîşanê hene: https://www.usip.org/publications/1986/08/commission-inquiry-peru-86

***Almanya***

Hilweşîna Dîwarê Berlînê ya di sala 1989'an de bû sedema yekbûna Almanyayê. Di wê pêvajoyê pê de, bangên ji bo lihevhatina bi qeydên binpêkirinên mafên sivîl û siyasî yên di jêr desthilatiya Partiya Yekîtiya Sosyalîst a Almanyaya Rojhilat de [*Sozialistische Einheitspartei Deutschlands, SED*] her ku diçû zêdetir deng vedan. Li gel dadgehkirin, dayina tazmînata ji bo mexdûran û bernameyeke venêrînê ya ji kar dûrxistina kesên ku têkiliya wan bi Servîsa Ewlekariya Dewletê ya Almanyaya Rojhilat re heye, ku bi navê Stasi (Yoder 1999) tê zanîn, parlamentoya jêr a meclîsê Komîsyona Lêkolînê ya Vekolîna Dîrok û Encamên Dîktatoriya SED li Elmanyayê di sala 1992an de ava kir. [*Die Enquete-Kommission des 12. Deutschen Bundestages "Aufarbeitung von Geschichte und Folgen der SED-Diktatur in Deutschland"*][6] Komîsyon ji 16 parlamenter û 11 pisporên derveyî parlamentoyê pêk dihat. Endam ji aliyê Demokratên Xiristiyan, Sosyal Demokrat, Demokratên Azad, Partiya Keskan û Partiya Sosyalîzma Demokratîk (partiya ku li şûna SEDê li Almanyaya yekbûyî ava bûyî) li gor rêjeya nûnertiya wan ya di meclîsê de hatin destnîşankirin (Beattie 2009, 232). Gelek ji endaman mûxalîfên Almanyaya Rojhilat bûn (Stan 2009). Armancên komîsyonê yên diyarkirî xurtkirina demokratîk, lihevkirin, yekîtiya neteweyî û dubarenekirina binpêkirinên berê bûn (Beattie 2009, 233). Di destpêkê de erkeke komîsyonê ya sînokirî tunebû, ji ber vê yekê endaman ji bo destnîşankirina rêgezên xebata xwe xwedî biryar bûn. Komîsyon ji forûmeke ku tê de rabirduya Almanyaya Rojhilat dihat vegotin zêdetir, wekî mîsyoneke dîtina daneyan xebitî. (Beattie 2009, 239). Sedema vê ew bû ku gelek rastiyên li ser binpêkirinên mafên mirovan yên li Almanyaya Rojhilat ji berê ve dihatin zanîn, û endamên Demokratên Xiristiyan zêdetir bi îsbatkirina neqanûnîbûna rejîma SED û îdeolojiya wê ya sosyalîst re eleqedar (Beattie 2009, 236). Di dawiyê de, çarçoveya binpêkirinên takekesî pir teng bû; lê ji vê zêdetir, di navenda mîsyona komîsyonê de vegotineke giştî hebû.

Komîsyonê di sala 1994'an de xebatên xwe bi dawî kir û raporeke dawî ya ji 18 cildan pêk tê amade kir. Salekê bi şûnde, ew rapor ji hêla komîsyoneke nû ya meclîsê ya bi navê Komîsyona Lêkolînê ya Derbaskirina Encamên Dîktatoriya SEDê di Pêvajoya Yekitiya Alman de [*Enquete-Kommission „Überwindung der Folgen der SED-Diktatur im Prozess der Deutschen Einheit"*].[7] ve hate temam kirin. Komîsyona duyemîn, ku heta sala 1998an kar dikir, ji 12 parlamenter û 12 pisporan pêk dihat. Zanyar difikirin

[6] Agahiyên bingehîn ên derbarê komîsyona Almanyayê ya di sala 1992an de li vê derê hene: https://www.usip.org/publications/1992/05/truth-commission-germany-92

[7] Agahiyên bingehîn ên derbarê komîsyona Almanyayê ya di sala 1995an de li vê derê hene: https://www.usip.org/publications/1995/07/truth-commission-germany-95

ku karîgeriya giştî ya her du komîsyonan jî bi awayekî asayî sînordar bû. Li gel ku Elmanên Rojhilatî jî wekî endamên komîsyonê hatibin beşdarkirin jî, gelek mirovên ji rêzê yên ji Rojhilat, ev komîsyon wekî projeyeke elîtên siyasî û rewşenbîrî ya Almaniya Rojava ku ezmûnên wan yên di jêr desthilatdariya rejîma SEDê de fêhm nakin, nîşan dan (Yoder 1999, 73). Her wiha komîsyon ne ji bo pêşniyarkirina siyasetê hatin çêkirin, ji ber vê yekê karîgeriya hate kêm kirin. Belkî jî encama herî berbiçav a pêvajoyê li gorî pêşniyara komîsyona duyemîn, di sala 1998an de avakirina Weqfa Serederiya bi Dîktatoriya SEDê [*Stiftung zur Aufarbeitung der SED-Diktatur*] re bû. (Stan 2009, 5).

## Çareserî

Komîsyonên lêkolînê yên meclîsê ji bo vedîtin, vegotin û eşkerekirina rastiyên li ser bûyer û pêvajoyên girîng ên civakî û siyasî pêwist in. Mebesta wan ew e ku ji hêla sêwiranê ve wekî qadên nakokiyên siyasî û lihevnekirinê xizmetê bikin. Ev hem metirsiyeke û hem jî derfetek e: bê guman dibe ku endamên parlamentoyê, nemaze yên ku helwesteke bîgane mayî an dijminane li hember mexdûrên binpêkirinên mafên mirovan hene, dibe ku binpêkirinên rabirduyê têra xwe nekolin û eşkere nekin. Li gel vê yekê jî, komîsyonên parlamentoyê qadeke nîqaşê dirust dikin û bi vî hawî jî endamên parlamentoyê û hilbijêrên wan vedixwînin ku van binpêkirinan cidî bigirin. Komîsyonên heqîqetê ji hewldanên civaka sivîl cudatir in lewra ihtîmala ku derveyî şertên siyasî yên ku diguherin tevbigerin kêm e. Lê bi gelemperî, di mijara ku saziyên dewletê agahiyan bi wan re parvebikin an jî takekes şahidiyê bikin de xwedî karîgeriyeke zêdetir in. Bi taybetî li welatên ku prosedurên parlementoyê yên sazkirî û rêzdar hene, beşdariya wan di nîqaşên giştî de dikare pir zêde be.

Wekî ku mînakên li çaraliyê cîhanê nîşan didin, di awayên xebatê yên komîsyonên meclîsê de cihêrengiyeke berbiçav heye. Hinekan li gel perçebûna siyasî jî (mînak, Almanya) biserketin ku raporeke hevgirtî çêbikin, hinên din jî bi weşandina gelek raporên ku encamên cihêreng vedihewînin (mînak, Perû) berberiya siyasî xurt kirin. Têkiliya di navbera komîsyonên lêkolînê yên meclîsê û destpêşxeriyên din ên lêgerîna heqîqetê de tevlihev e: carinan komîsyoneke dahatuyê ya heqîqetê encamên komîsyona meclîsê ya berî xwe piştrast dike (mînak, Perû); di demên din de, rêxistinên civaka sivîl seferber dibin da ku kêmasiyên komîsyoneke parlementoyê sererast bikin (mînak, Uruguay); û dîsa jî di rewşên din de, komîsyonek heqîqetê wekî cîgirek nexwestî ya parlemanî tê dîtin (mînak, Arjantîn).

Li gel ku cûdahiyên girîng di navbera celebên destpêşxeriyên lêgerîna heqîqetê de hebin jî, xuya dike ku di tevan de sepanên herî baş yên hevpar hene. Beriya her tiştî, her cûre komîsyona lêgerîna heqîqetê ji bo lêpirsîna xwe birêve bibe divê xwedî

wext û çavkaniyên têrker bin - ev nêrîneke ku dê di analîza vê raporê ya komîsyonên parlementoya Tirkiyê de derbasdar be. Ya duyemîn jî divê komîsyonek nûnertiya partî û îdeolojiyên li welêt be. Ya sêyem, erk û armancên wê divê di destpêka pêvajoyê de bêne zelal kirin da ku rê li ber tevliheviyê veneke, ka gelo tê çaverêkirin ku komîsyon lêkolîna dadrêsî bike, raboriyê şîrove bike, an herduyan bi hev re bike. Ya çaremîn, divê xebata wê bibe sedema pêşnîyarên fermî ji bo tedbîrên rast, dahatûyê yên ji bo heqîqet, edalet û bergiriyên tazmînatê. Di dawiyê de, divê rêxistinên mafên mirovan, komên sivîl û saziyên çapemeniyê yên têkildar xebatên komîsyonê ji nêz ve bişopînin da ku beriya pêvajoyê, di dema pêvajoyê û piştî pêvajoyê de bi giştî meclîsê û bi taybetî jî endamên komîsyonê berpirsyar bigrin.

## BEŞA 2.

# KOMÎSYONA SUSURLUKÊ

# Komîsyona Susurlukê

## Danasîn

Binpêkirinên giran ên mafên mirovan yên di çarçoveya pevçûnên tund ên di navbera hêzên ewlekariya dewleta Tirkiyê û Partiya Karkerên Kurdistanê [*Partiya Karkerên Kurdistanê*, PKK] de, kuştina rojnamevan û rewşenbîran ya ji aliyê berpirsên nenas ve û tawanên din ên ku ji aliyê komên mafyayê ve hatin kirin mohra xwe li destpêka salên 1990î dan. Ji ber ku dadgehan lêpirsîn û dozên rast û dirûst nedikirin, dihat wê wateyê ku daxwaza mexdûran, xizmên wan û raya giştî ya berfireh a heqîqet û edaletê bi domdarî dihate red kirin. Her wiha her ku şik û gumana ku çeteyên sûc dest danîne ser dezgehên dewletê zêde dibû, asta sûc, çîna siyasî jî nîgeran kir. Vê yekê hişt ku meclîs komîsyonên lêkolînê bicivîne, bi taybetî Komîsyona Lêkolînkirina Kuştinên Siyasî yên Kiryarê Wan Nediyar [*Faili Meçhul Siyasi Cinayetleri Araştırma Komisyonu*] di sala 1993an de û Komîsyona Ronîkirina Kuştina Ugur Mumcu[8] [*Uğur Mumcu Cinayetinin Açıklığa Kavuşturulması Amacıyla Kurulan Meclis Araştırması Komisyonu*] di sala 1997an de. (Eroğlu 2007, 121-126). Lêbelê, yekê ji wan jî bi qasî Komîsyona Lêkolînê ya Meclîsê ya li ser Bûyera Susurlukê hêvî nedane gel.

## Peywend

Bûyera ku Komîsyona Susurlukê da dest pê kirin û hişt ku navê Susurlukê lê bibe qezayeke trafîkê bû ku  di 3ê Mijdara 1996an de li navçeya Susurlukê ya bakurê rojavayê Tirkiyê pêkhatibû. Di qezayê de derket holê ku; parlamenter Sedat Bucakê ku li herêmê kurdan berpirsiyarê birêxistinkrina cerdewanên paramîlîter, alîkarê gerînendeyê emniyeta Stenbolê yê berê Huseyîn Kocadağ û sûcdarê neteweperest Abdullah Çatli ku wê demê ji biryara girtinê ya Înterpolê direviya, bi hev re seyahat dikirin. Vê yekê, gumana ku wendakirinên bi darê zorê û binpêkirinên din ên giran ên mafên mirovan yên li herêmên kurdan, kuştina dijberan yên kiryarên wan nediyar, bazirganiya narkotîkê, lîstandina lîstikên qumarê yên derqanûnî û gelek tawanên din bi saya ji nedîtivehatina hinek siyasetmedar û buroqrasiya dewletê ve û heta bi teşwîqkirina wan têne kirin piştrast kir. Beşeke mezin ya siyasetmedarên ku beşdarî bûyeran bibûn endamên Partiya Refahê [*Refah Partisi*, RP] ya Îslamî û Partiya Rêya Rast [*Doğru Yol Partisi*, DYP] ya rastgir bûn ku wê demê van her du partiyan bi hev re hikûmeteke koalîsyonê ava kiribûn û Tirkiye birêvê dibirin. Ya girîngtir jî, sûcdarkirin

8 Mumcu rojnamevanek bû ku bi lêkolînên xwe yên li ser beşdarbûna karmendên dewletê di sûcên darayî û tundiyê de dihat naskirin. Di 24'ê Çileya 1993'an de bi wesayîteke bombebarkirî hat qetilkirin. Kuştina wî heya îro jî nehatiye ronî kirin.

dihat wê wateyê ku endamên artêş, polîs û saziyên îstîxbaratê bi dehan salan û di nav gelek hukûmetan de beşdarî binpêkirinên mafên mirovan û sûcên rêxistinî bûne.

Dema opozîsyonê ji hikûmetê xwest ku yekser dest ji kar berde, ev qeza bû sedema bertekên siyasî yên pir mezin. Mehmet Agarê ku di nav siyasetmedarên navborî de yekî pêşeng bû, di 8'ê Mijdara 1996'an de ji wezîfeya xwe ya Wezîriya Karên Navxweyî îstifa kir. Tevî ku hincetên fermî yên îstifakirina wî bi mijarê re ne eleqedar bûn jî, hate fêmkirin ku piştî qezayê ji bo dest ji wezîfeya xwe berdê, bi zextên siyasî re rû bi rû maye. Di 22ê Kanûna 1996an de Serokomar Süleyman Demirel ji bo gotûbêjkirina bûyera Susurlukê û encamên wê bi serokên hemû partiyên siyasî yên ku di parlementoyê de cih digirin re civînek li dar xist. Di Sibata 1997 de, kampanyayeke girseyî ya civaka sivîl ji bo paqijkirina siyasetê ji gendeliyê dest pê kir. Bi gotineke din bêyî guman tê de hebe, bûyera Susurlukê hîmên çîna siyasî ya Tirkiyê hejand.

Gelek kêşeyên ku piştî qezayê derketin holê, di dawiya salên 1980an û destpêka salên 1990an de li ber çavê raya giştî hatibûn ragihandin. Rêxistinên mafên mirovan û komên mexdûran wendakirinên bi darê zorê yên li heremên kurdan û kuştinên karsazên kurd yên ku herî kêm ji sala  1993an vir berdewam in, şermezar dikirin. Gotinên şahidan û îtîrafên endamên teqawidbûyî yên hêzên ewlehiyê diyar kirin ku artêş, polîs, endamên îstixbaratê,  sûcdarên ultra- neteweperest û sûcdarên din yên bi koordînekirine Agar, li piştbi hev re  kuştin û xespkirina karsazên kurd û sûcên din kiribûn. Her wiha hat gotin ku yekîneyeke taybet a cendirmeyan ya bi navê Fermandariya Komîa Îstixbarat û Dijî Terorê ya Cendirmeyan [*Jandarma İstihbarat ve Terörle Mücadele Grup Komutanlığı*, JİTEM] jî li pişt windakirinên bi darê zorê heye - ev îdia ji aliyê cendirmeyan ve heta roja îro jî bi berdewamî hatiye redkirin. Lê belê heta qezaya Susurlukê ne saziyên dewletê yên navborî ne jî dadgehan bi awayekî cidî lêkolîn li ser van mijaran nekiribûn. Ji ber vê yekê, aşkerekirinên çalakvanên mafên mirovan, rojnamevanên muxalîf û endamên berê yên nerazî yên hêzên ewlekariya dewletê heta dawiya sala 1996an nekarî nîqaşa giştî veguherîne. [9]

## Avakirin û xebitîna Komîsyonê

Di vê peywendê de parlamenterên opozisyonê yên parlementoyê daxwaza komîsyona lêkolînê ya parlementoyê kirin, ku piştî qezayê bi 9 rojan hate damezrandin. Sê

[9] Komîsyona Susurlukê bi xwe behsa du pêşengên xebata xwe dike: Komîsyona di sala 1987an ya lêkolîna li ser raporên îxracata sexte [*Hayali İhracat Araştırma Komisyonu*], û komîsyona di sala 1995an ya Komîsyona Lêkolînê ya Meclîsê ya Kuştinên Kiryarên Wan Nediyar ên Siyasî. [Ülkemizin Çeşitli Yörelerinde İşlenmiş Faili Meçhul Cinayetler Meclis Araştırma Komisyonu] ("Konuyla İlgili Önceki Meclis Araştırma Komisyonu Raporları").

partiyên opozisyonê, Partiya Dayiknîştiman [Anavatan Partisi, ANAP], Partiya Çep a Demokratîk [Demokratîk Sol Parti, DSP] û Partiya Gel a Komarê [Cumhuriyet Halk Partisi, CHP] bi giştî 5 pêşnûma pêşkêş kirin ji bo daxwazkirina komîsyona lêkolînê. Cudahiyên di çarçowekirina her pêşnûmeyê de cihêrengiya hêviyên ji Komîsyonê derdixin holê: Hinceta ANAP'ê ku ji aliyê Parlamenter Halit Dumankaya ve li Komisyonê hate diyar kirin, pêwistiya lêkolînkirina çeteya Söylemez bû ku weke malbateke sûcê rêxistinî, dijminatiya şefê paramîlîter Sedat Bucak dikirin ku di qezaya Susurlukê de birîndar bibû. Daxuyaniya Dumankaya ti hewldanek nîşan neda ji bo girêdana çalakiyên çeteyan bi çarçoveyeke berfireh ya siyasî re. Ji aliyê din ve, CHPê, bi pêşkêşkirina lîsteyeke dirêj ya sûcên siyasî yên ku ji hêla neteweperestên ultraneteweyî ve hatine kirin û vedigerin salên 1970an de pêşkêş kir û cewherê lêpirsîna ku dixwest xêz kir.[10] Tenê berdevkê DSPê M. Cevdet Selvi pêşniyar kir ku kesên bi hinceta têkoşîna li dijî PKKê sûc dikin werin lêpirsîn û darizandin û îdîa kir ku peywendiya pevçûnên tund yên li herêmên kurdan bi van sûcan re hene ("Komisyonun Kuruluşu").

Komîserên ku ji aliyê koma her partiya di meclîsê de hatin tayînkirin ev in: Mehmet Elkatmiş (Serokê Giştî yê RPê), Mahmut Yilbaş (Cîgirê serokê DYPê), Mehmet Bedri Incetahtaci (Berdevk RPê,), Yaşar Topçu (ANAP), Sema Pişkinsut (DSP), Metin Oney (ANAP), Fikri Saglar (CHP), Hayrettin Dilekcan (RP) û Nihan Ilgüunn (DYP). Bi vî hawî di komîsyonê de 5 endamên hikûmeta koalîsyonê ya RP-DYP û 4 endamên opozîsyonê hebûn, ku ev, bi berfirehî hevsengiya hêzê ya li parlamentoyê nîşan dide. Komîsyonê her wiha mufetîşên Wezareta Karên Navxweyî, û mufetîşên Daîreya Karûbar û Xezîneyê jî weke pispor destnîşan kirin. Balkêş e ku Wezareta Dadê şandina mufetîşan ("Komisyonda Uzman Görevlendirilmesi") red kir.

Komîsyona Sûsûrlûkê erka xwe bi destnîşankirina îdîayên siyasetmedarên muxalîf û kesên ku bi wan re hevdîtin kirine diyar kir. Ev di beşa rapora dawîn de ("İddialar") hatine berhevkirin. Ji bilî tiştên ku di lêpirsînê de cih girtine, komîsyon ewleye ka çi nîne: Partiya Demokrasiya Gel [Halkın Demokrasi Partisi, HADEP] ku wê demê nûnertiya tevgera siyasî ya kurd dikir, bi giştî 267 daxwazname ji meclîsê re şandin ku di wan de qala kuştinên siyasî yên kiryarê wan nediyar dihate kirin û hemwelatiyan jî li gel vê 145 daxwazname şandin. Komîsyonê pêwist nedît ku li ser dosyayên taybet lêkolînan bike û li şûna wê biryar da ku mijarê di beşa encamnameyê de ("Çeşitli Yollarla Komisyona Gönderilen Toplu Dilekçeler") bi têgehên giştî bicih bike.

[10] Çatli, ji bilî kuştina rewşenbîrên çepgir a di nîveka duyemîn ya salên 1970yî de bi rêxistinkirina kuştina 7 xwendekarên zanîngehê yên çepgir yên di sala 1978an de li taxeke Enqereyê hat sûcdarkirin.

Komîsyon bi gelek mijaran ve mijûl bû: Sûcên rêxistinî, her cûre kuştinên payebilindan, wendakirinên bi darê zorê û sûcên din ên bêdaraz, û îdîayên li ser yekîneyeke taybet a di jêr fermandariya cendirmeyan de ku ji binpêkirinên giran ên mafên mirovan berpirsyar bû. Mijara pêkhêner jî îdiaya hebûna komeke ku têkiliyên wan ên demdirêj bi saziyên dewletê re hene, bi îdiaya ku serhildanê serkut bikin, taktîkên şer ên derqanûnî yên mîna kuştin û wendakirinên bi darê zorê li dijî gefên hundir û derve bikartînin û vê yekê bikartînin ji bo ku bazirganî û qaçaxçîtiya narkotîkê, xespê, lîstandina qumara derqanûnî û sûcên din dikin bikin. Endamên koma ku bi navên wekî; dewleta kûr [*derin devlet*], rêxistina Ergenekonê [*Ergenekon orgutu*] û çeteya Susurlukê [*Susurluk çetesi*] dihate bi nav kirin, ji komek siyasetmedarên hilbijartî, endamên çalak û teqawîtbûyî yên saziyên ewlehiyê yên dewletê û sûcdarên ultra-neteweperest pêk dihat *(ji bo şecereya peyvên cihêreng ên hatine bikar anîn, binêre: Balci 2010).*

Rêbaza komkirina daneyan a bingehîn a komîsyonê hevpeyvîn bûn. Komîseran bi giştî bi 54 kesan re hevpeyvîn kirin, ku piraniya wan endamên çalak an teqawîtbûyî yên saziyên polîs û leşkerîyê bûn, an jî ew kes bûn ku têkiliya wan bi sûcên rêxistinî re hene. 13 ji wan kesên ku hevpeyivînbi wan re hatine kirin an girtî dihatin darizandin, an jî cezayê xwe dikişandin. Çend sîyasetmedarên aktîf, ku piranîya wan serokên partîyên muxalefetê yên wê demê bûn, jî qebûl kirin ku bi wan re hevpeyivîn bê kirin. Tevî ku gelek ji kesên ku hevpeyivîn bi wan re hatine kirin endamên payebilind ên saziyên ewlekariya dewletê bûn jî, nebûna hin muxbîrên potansiyel şiyana komisyonê ya berhevkirina agahiyên zêdetir û çêtir sînordar kir. Fermandarê Giştî yê Cendirmeyan û Misteşarê berê yê Dezgeha Îstixbarata Neteweyî Teoman Koman bi îdiaya ku ji hêla qanûnî ve mecbûr e ku li pêşberî komîsyonê îfadeyê nede û sûcên ku tên îdîakirin û lêkolîna wan tê kirin berî wezîfeya wî pêkhatine hevkariya bi komîsyonê re red kir û ev yek bû cihê nîqaşan. ("Bilgisine Başvurulanlar", herweha binêre: Gökçe 2009). Bi heman awayî rêveberên DYP'ê ku di nav wan de seroka partiyê Tansu Çiller jî hebû, îfade nedan komîsyonê.[11] Ji vê meyla beşdarbûnê îstîsnayek girîng Mehmet Ağar bû ku li pêşberî komîsyonê îfade da ku sûcdariyên li ser xwe red bike. Sînordariyeke din ya metodolojiya hevpeyivînan, kevneşopiya nepenîtiyê ya di nav saziyên dewletê de bû. Wekî mînak Mehmet Eymûrê ku Dezgeha Îstixbarata Neteweyî de şefê têkoşîna li dijî terorê bû, paşê di bloga xwe de îdia kir ku ji aliyê saziya wî ve

[11] Ji ber ku ji Çiller nehat xwestin ku were şahidiyê jî bike, di komîsyonê de nîqaşên dijwar di navbera Elkatmiş û parlamenterên çepgir de derketin (Eroğlu 2007 , 128-129).

tenê wekî "şahidê bi şert" destûr ji bo wîhatiye dayîn ku biaxife.[12]

***Rapora Dawîn***

Rapora dawîn, wekî ku li jorê hatî destnîşan kirin, erka qanûnî û mijarên bingehîn ên ku ji hêla komîsyonê ve hatine lêkolîn kirin, vedihewîne. Herweha beşeke wê ya bi navê "Têgîn" jî heye, ku tê de sê têgehên sereke tên diyar kirin: çete *[çete]*, mafya *[mafya]* û rêxistina derqanûnî *[yasadışı örgüt]*. Rastiya ku ev têgeh tevde sûcên rêxistinî yên ku ji bo berjewendiyên taybet hatine kirin bibîrtînin, nîşaneyeke giring ya biryara komîsyonê ye ku sûcên gumanbar di çarçoveyeke siyasî de bi cîh neke.

Beşa mezin ya rapora dawîn, bi tevahî ji 16 lêpirsînan ("İnceleme Bölümü") û kurteyên hevpeyvînan ("Bilgisine Başvurulanlar") pêk tê. Lêpirsîna yekem derbarê qezaya Susurlukê de ye; ya rastî, ji bo sira sûcên Abdullah Çatli yên ji salên 1970an vir ve derxîne holê û aşkere bike bê ew çawa bi serbestî li Tirkiyê dijî, di sînoran re derbas dibû û parastina ku ji ajanên dewletê distend ji bo ku biçe derveyî Tirkiyê û dema ku ji girtîghea Swîsreyê revîya. 15 vekolînên din behsa kuştinên payebilindan, revandina mirovan, çalakiyên çeteyan û kiryarên din ên sûc dikin. Armanca vekolînan ew e ku rastiyên di derheqê bûyereke, rêzeke bûyeran an jî kesên eleqedar de bîghîne hev e. Beşek ji delîlan ji hevpeyivînan tên (li jêrê binêre), lê belê komîsyon ji bo birêvebirina lêpirsînan; belgeyên dadgehê, agahiyên komîsyonên lêkolînê yên berê, û raporên çapemeniyê jî bikar tîne.

Tevahiya metnên hevpeyvînan di rapora dawîn ya komîsyonê de nîn in; lê belê, kurteya her hevpeyivînekê tê de heye. Kurteyên hevpeyivînê destnîşan dikin ku ji herkesên ku bi wan re hevpeyivîn hatine kirin, li gorî paşxane an qada pisporiya wan pirsên taybetî hatine pirsîn. Wisa xuyaye rêbazeke metodolojîk ku di nav hevpeyivînan de hevgirtinekê pêk bîne tuneye. Piraniya kesên ku hevpeyivîn bi wan re hatine kirin, îdîa dikin ku derbarê sûcên diyar û kesên eleqedar de tiştên ku dizanin vedibêjin. Lê dîsa jî, yên din (bi taybetî siyasetmedarên li ser kar yên wekî Hasan Celal Guzel û Dogu Perinçek) li şûna ku agahiyan bidin, li ser girîngiya siyasî û jeopolîtîk ya berfirehtir ya sûcên ku têne îdîakirin texmînan dikin. Di dawiyê de, hevpeyvîn derbarê lîsteya sûcên ku tên îdîakirin de, wekî têkelheviya îdîayên rasteqîn û hîpotezên spekulatîf têne xwendin.

---

[12] https://www.atin.org/detail.asp?cmd=articledetail&articleid=245 Ev nivîsa blogê, yek ji gelek nivîsane ku ji aliyê Mehmet Eymurê ku di navbera salên 1995-1996an de di Dezgeha Îstixbarata Neteweyî de şefê têkoşîna li dijî terorê bû, hatine nivîsandin. Wekî beşdarekî şerên li ser herêman yên di navbera saziyan dewletê yên di salên 1990an de, wî di vê bloga xwe ya şexsî de li gel şîroveyên xwe hinek hevpeyvînên Komîsyonan Susurlukê jî belav kirin.

Rapora dawîn li gel beşeke nirxandina giştî (“Genel Değerlendirmeler”) ji bo her yek ji 16 dozên ku hatine lêkolînkirin jî nirxandinan (“Değerlendirmeler) dihewîne. Di van nirxandinan de naveroka vekolîn û kurteyên hevpeyvînan dubare dibe. Nirxandina tîpîk ji kurteyên rastiyên der barê tawanên îdiakirî de pêk tê, ku di eslê xwe de berhevkirinek ji hevpeyivînên komîsyonê û agahdariyên ji çavkaniyên derve yên mîna belgeyên dadgehê ye, li dûv wê jî banga ji bo vekolîn û dadgehkirina pêşerojê cih digre. Di van nirxandinan de encamên zelal nayên dîtin. Berovajî vê, rapor gelek hîpotezên derbarê tawanên siyasî yên nediyar de bi kurtî radixe ber çavan, lê van hîpotezan ji aliyê pêbaweriyê ve napîve û derbarê mijara li ber dest de nagihêje tu encaman.

Beşa nirxandinên giştî derbirînên zelaltir vedihewîne. Wekî mînak, di dema ku hîn jî hebûna an tunebûna JITEMê tê îddîa kirin de, îdîa dike ku kiryarên ku tên gotin JITEMê kirine, “bi awayekî ku neyê nîqaşkirin” pêk hatine[“JİTEM’in varlığı tartışılırken eylemlerinin tartışmasız gerçek olduğu ortaya çıkmıştır.”] (“Genel Değerlendirme”, herweha binêre: Atılgan and Işık 2011). Bi heman awayî ew, hevrikiya di navbera dezgehan de,  mufetîşên fermî ku lêpirsîna sûcdariyan nakin, karîgeriyên pergala cerdewaniya gundan ya paramîliter û têkçûna bi giştî ya serdestiya hiqûqê wekî sedemên van sûcan destnîşan dike. Beş, ji ber ku Serfermandariya Leşkerî û Dezgeha Îstixbarata Neteweyî redkirin ku agahiyan bidin komîsyonê, bi rexneya wan bi dawî dibe.

Rapora dawîn bi pêşniyaran (“Öneriler”) bi dawî dibe. Xurtkirina serweriya hiqûqê û demokrasiyê, reforma polîs, şefafiyet di sektora giştî de, bihêzkirina mufetîşên giştî, rakirina rewşa awarte li herêma kurdan, ji nû ve hizirkirina rêbazên li dijî terorê, û yasayên nû yên derbarê tawanên rêxistînî de wek pêşniyarên sereke yên ku Neteweyên Yekbûyî (NY) pêşniyarkiribûn derdikevin pêş. Komîsyonê rapor di 3ê Nîsana 1997an de ji meclîsê re şand. Çend pêşnîyazên pir taybet in (wek rêgirtina li ber bikaranîna narkotîkan ji aliyê polîsan ve), lê beşa pêşnîyaran bi piranî wek bangeke ji bo reformên qanûnî-saziyî yên berfireh yên li Tirkîyê tê xwendin.

***Pêvajoya piştî komîsyonê***

Di 28ê Sibata 1997an de, Encumena Ewlekariya Netewî ya ku di bin serweriya artêşê de ye, biryarek derxist da ku tişta ku ew wekî tehdîda îslamî dihesibîne bi paş bixe. Piştî çend mehan koalîsyona RP-DYP di bin zextên mezin ên Serfermandarê Leşkerî de hate hilweşandin û di demeke kurt de Dadgeha Qanûna Bingehîn RP girt û qedexe kir. Ji nişka ve guheztina şertên nîqaşên siyasî ber bi eksena laîsîzm-îslamîzmê û dûrketina ji mijarên ku piştî qezaya Sûsûrlûkê hatibûn rojevê, karîgeriya Komîsyona Sûsûrlûkê bi awayekî zêde kêm kir. Rapora dawîn ji aliyê lijneya giştî ya meclîsê ve nehat nîqaşkirin

jî. Bi kêmanî deh sal di ser re derbas bûn heta ku siyasetmedaran, çapemeniyê û raya giştî dest bi nîqaşkirina têkiliyên di navbera saziyên dewletê û sûcên rêxistinî de kirin.

Tevî vê yekê jî çend saziyan xebatên Komîsyona Susurlukê şopandin. Di 11'ê Çileya 1998'an de Lijneya Teftîşê ya ku di bin banê Serokwezîrtiyê de dixebite [*Başbakanlık Teftiş Kurulu*] rapora xwe ya der barê têkiliyên nepenî yên ku piştî qezaya Susurlukê derketin holê eşkere kir. Her çend vê raporê jî di salên xwe yên destpêkê de nekaribû karîgeriyeke mezin çêbike jî, dadgehan di heman demê de dest bi lêkolîna sûcên têkildar kirin (Selçuk 2011). Di sala 2001ê de, dadgeha ewlekariya dewletê [*Devlet Guvenlik Mahkemesi]* di serî de efserê berê yê leşkerî û endamê Dezgeha Îstixbarata Neteweyî Korkut Eken, li 13 bersûcan ji ber rêxistinkirina komeke sûcdar, cezayê girtîgehê birî. Lê belê Dadgeha Dadî ya Bilind [*Yargıtay*] hemû biryar bi hincetên teknîkî betal kirin. Mehmet Agar di sala 2011'an de, di dozeke cuda de ji ber ku bi pêşengiya rêxistineke sûc kiriye, hate cezakirin. Lê belê di angaştnameyên her du dozan de jî, tu nîşane tune ne ku dozger encam an delîlên komîsyona lêkolînê ya meclîsê bikar anine.

Ji bilî darizandinên ku rasterast bi qezaya Susurlukê ve girêdayî ne, hin kesên ku ji aliyê komîsyonê ve behsa wan hatiye kirin yên bersûcên kiryar, di dozên din de jî bo edaletê hatin radest kirin. Di salên destpêkê yên hikûmeta Partiya Dad û Geşepêdanê [Adalet ve Kalkınma Partisi, AKP] de, carna dozger ji aliyê hikûmetê ve dihatin teşwîqkirin ku li ser angaştên hewldanên derbeyan, binpêkirinên mafên mirovan û sûcên rêxistinî lêkolînê bikin. Bi taybetî jî sûcên ku li JÎTEMê dihatin barkirin, nêzîka deh salan hatin lêkolînkirin û di van deh salan de, derbarê binpêkirinên giran ên li herêma kurdanê de hîn zêdetir agahî ji bo raya giştî hatin aşkere kirin. Lê belê, di çarçoveya pevçûnên di navbera hikûmeta AKP'ê û hevalbendên wan ên berê Cemaeta Gulen de, ku piştre bi armanca hedefgirtina leşkeran bi awayekî neheq hatin sûcdarkirin, darizandina sûcên girêdayî JÎTEM'ê ji nişka ve bi dawî bûn. Di dema nivîsandina vê nivîsê de, tevlêbûna aktorên dewletê di sûcên rêxistinî û binpêkirinên mafên mirovan de mijareke ku baş tê zanînê, lê bi gelemperî hîn jî b awayekî berfireh li ser vê meseleyê nayê sekînin.[13]

Du endamên komîsyonê piştî komîsyonê wekî berdevkên raya giştî di derbarê mijarên ku ji aliyê komîsyonê ve hatine raberkirin de, û yek ji endaman jî wekî şahid di dozeke têkildar de rolên sereke lîstin. Mehmet Elkatmîş di sala 2012'an de li pêşberî Komîsyona

[13] Agahiyên bingehîn yên derbarê dozên binpêkirinên mafên mirovan de ku yên qala JITEMê jî dikin di nav de ne bi zimanê tirkî û ingilîzî di malpera Faili Belli: İnsan Hakları Davaları İzleme Sitesi [*Perpetrator Not-Unknown: Site for Monitoring Trials on Human Rights*], werin peyde kirin. Herweha binêre: https://www.failibelli.org/

Derbeyê îfade da. Di sala 2005'an de serokatiya Komîsyona Daîmî ya Mafên Mirovan a Meclîsê, di sala 2012'an de jî ombudsmaniya mafên mirovan kir. Fikri Saglarê ku tê gotin ji xebatên komîsyonê ne razî ye (Baran 2000, 138), li ser sûcên dewletê kitêb û senaryo nivîsandin û di Sibata 2018'an de di doza JÎTEM'ê ya li Enqereyê de, derbarê wendakirinên bi darê zorê de îfade da.[14] Bi gotineke din, Elkatmîş û Saglar li ser mijarên ku Komîsyona Susurlukê anîne rojevê bi şiyana xwe ya şexsî û bi rêbazên xwe hişyarkirina xwe domandin.

Rêxistinên mafên mirovan û pisporên hiqûqî yên ku bi darizandina cînayetên kiryar nediyar re têkildar in, hem komîsyona lêkolînê ya meclîsê û hem jî rapora serokwezîrtiyê bi caran anîn rojevê. (ji bo şopandina hevahengiya naveroka van raporan û biryarên Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê ya li ser şîdeta dewletê, binêre: Kurban 2020; pp. 263-266).

## Analîza Komîsyona Susurlukê

Bi baldarî xwendina rapora dawîn nîşan dide ku endamên Komîsyona Susurlukê peywira xwe wekî pêşkêşkirina gelek delîlan yên li ser dozên sembolîk ên sûcên rêxistinî dîtine. Lê dîsa jî, wan xwe ji ber nirxandina pêbawerîbûna angaştên ku xwe dispêrin rastiyan yên kesên ku hevpeyvîna bi wan re hatine kirin dane alî. Wekî encam, rapora dawîn gelek agahiyên ku ji gelek çavkaniyan hatine vedihewîne, lê hema bêje ti derbirînên misoger tê de tune ne. Herweha, her çend lêpirsîna wan siyasetmedarên hêzdar hedef girtibin jî, rêbaza lêkolîna mijarê ya Komîsyonê apolîtîk bû. Wekî ku berê hate rave kirin, komîsyonê hilbijart ku cînayetên siyasî yên kiryar nediyar tevlî lêkolîna xwe ya doz bi doz neke.

Analîzeke mîqdarî ya metnê qalibên vegotinê yên ku vê encamê piştrast dikin aşkere dike. Ewra peyvan ya di şiklê 2.1ê de peyvên herî berbelav yên di rapora dawîn de nîşan dide, herweha hejmara peyvan an peyvên hevedudanî, bê çend caran di raporê de derbas dibin jî nîşan dide. Wekî ku ji ewra peyvan jî diyar dibe, komîsyon pirsgirêka sereke ya ku karîgeriyê li welêt dike, wekî sûcên rêxistinî şîrove dike. Di vegotinê de navên serokên mafyayê û siyasetmedarên girêdayî wan û têgînên wekî "sûc" [*suç*], "çek" [*silah*], "polîs" [*polis*] û "îstîxbarat" [*istihbarat*] serdest in. Ev hilbijartin îstîsnayên xwe jî bi xwe re tînê: tevî ku sedema gelek ji sûcên navborî şer û pevçûnên li herêma kurdan bin jî, wekî nimûne, ne pirsgirêka kurd û ne jî binpêkirinên mafên mirovan ên li derdora wê, di navenda vegotinê de cih nagirin. Di rapora dawîn de peyva "mafên

---

[14] Gamze Hızlı, "Ankara Davası İzleme Raporu", *Faili Belli*, 02.02.2018; herweha binêre: https://www.failibelli.org/ankara-jitem-davasi-izleme-raporu-2-subat-2018/

mirovan" [*insan hakları]* bi tevahî 6 caran derbas dibe – bi awayekî berawirdî jî "sûcên rêxistinî" [*organize suç*] 35 caran derbas dibe. Peyva "Kurd" an jî pirhejmara wê "kurdan" 20 caran derbas dibe. Li hember vê, "qumarxane" û "qumar" 58 caran derbas dibe. Dema mirov bifikire ku di metnê de peyvên "şerê taybet" [özel harp] û "şerê xeyrî nizamî" [*gayri nizamî harp*] bi awayekî pir zêde derbas dibin, ev yek bi taybetî balkêştir dibe. Wekî encam, komîsyon karê xwe ji mafên mirovan û pirsgirêka kurd zêdetir wekî bi sûcê rêxistinî re eleqedar dibîne. (Binêre 2.2).

Peyva "revandin" [*kaçırmak*] zêdetirî 100 caran derbas dibe, lê bi xwendineke baldarî tê dîtin ku piraniya wan behsa revandina karsazê bazirganiya narkotîkê Mehmet Alî Yaprak dikin. Behsa wendakirinên bi darê zorê jî tê kirin: peyva "wendabûn" [kaybolmak] bi giştî 61 caran di çarçoveya wendayan de hatiye bikaranîn. Ji wan peyvan 38 jê derbarê wendakirina Tarik Umit ê efserê îstîxbaratê yê beriya ku di bin şert û mercên nepen de wenda bibe, bi wendakirinên bi darê zorê dihat sûcdarkirin ve girêdayî ne. Bi gotineke din, revandin û wendakirinên bi darê zorê ku mexdûrên wan hema bêje her tim muxalif in, di çarçoveya sûcên rêxistinî û hevrikiyên nav dezgehan de têşe girtine.

Ev kêmasî hinekî encama hilbijartina stratejiyên berhevkirina daneyan e. Xeletiyeke din ya giring jî îhmalkirina agahiyên ji mexdûrên binpêkirinên mafên mirovan an rêxistinên mafên mirovan in. Heya sala 1997an, komîsyonê dikaribû bi hezaran qurbanî û xizmên mexdûran bîbîne ku ji ber binpêkirinên mafên yekparebûna laş karîgerî li wan bibû, lê dîsa jî nexwest ku bi wan re hevpeyvînan bike. Ji ber vê yekê, çarçoveyeke mafên mirovan hema hema bi tevahî di rapora dawîn de tune ye.[15] Komîsyonê bi endamên hêzên ewlekariya dewletê û kesên bi awayekî bi wan ve girêdayî re hevdîtin pêk anîn. Agahiyên ku ji hevpeyvînan hatine berhev kirin vê hilbijartinê nîşan didin: Şahid li ser raboriya tarî ya welêt agahiyên bikêrhatî bidin jî, angaşt bi ajanên keleş û siyasetmedarên ku ji bo berjewendiyên xwe bi sûcdaran re li hev dikin hatine çarçovekirin. Ne hewce ye ku were gotin, kesên ku hevdîtin bi wan re hatine kirin, ji bo sûcên ku tên angaştkirin, wê meylê dikin ku dijberên xwe sûcdar bikin û rûmeta saziya xwe biparêzin. Bi vî hawî nakokiyên di navbera serkirdayetiya aliyên cihêreng ên di nav saziyên dewletê de çawaniya vegotina rabirdûyê dişekilînin.

Piştî bi 15 salan serokê komîsyonê Elkatmiş, wekî lêkolîna bûyerekê, behsa Komîsyona Susurlukê kir û derbarê rêbazên xebatên komîsyonên meclîsê û encamên wan de nirxandineke bi giştî kir. Wî angaşt kir ku, destûrnedayîna komîsyonan ku ji çar

[15] Ya rastî Fikri Saglar nêrîneke dijber nivîsand û ji ber ku komîsyon li ser kêşeyên herêma başûrê rojhilat ya Tirkiyê ku gelheya wê bi piranî kurd in nesekiniye rexne li komîsyonê kirin (Eroğlu 2007, 129).

mehan zêdetir bixebitin, bêparkirina ji hêza bangkirinê ya wekî dadgehan (nemaze dema ku endamên artêşe dibin mijar), û civata giştî ya parlementoyê de nîqaşnekirina encamên van komisyonan, karîgerî û çalakiyên van komîsyonan sînordar dikin. Her wiha wî, arşîvên dezgehên leşkerî û îstixbaratê wekî depoyên daneyên ku nehatine bikaranîn nîşan dan.[16]


Wekî encam, Komîsyona Sûsûrlûkê ji bo li Tirkiyê bi salên 1990î re lihevhatinek pêkwere hewldaneke hêja lê belê pir sînordar bû. Atmosfereke siyasî ya guherbar ku tê de dezgehên leşkerî û istixbaratî dikarîbûn bernameyên xwe li gel hevrikiya aktorên siyasî û yên sivîl bi pêş bixin, piştgiriya vegiriya pir sînordar ya komîsyonê kir. Komîsyonê bi xwe, bi dûrketina ji çarçoweya siyasî ya girîng ku tê de sûcê rêxistinî pêşketiye, şensek ji dest xwe kir. Bi ser de komîsyonê bijart ku hevdîtinan ne bi mexdûrên binpêkirinên mafên mirovan re, lê bi nûnerên dewletê û saziyên bi wan ve girêdayî re bike. Ji ber vê bijartinê, komîsyon bi lêpirsîneke ku daxwazên heqîqet, edalet û daxwaza tazmînatê bi cih bîne zêdetir, bi lêpirsîneke wekî fîlmekî sûc û rakêşiyê ku dawiya wî nediyar e bi encam bû.

[16] “Komisyon kurum arşivi incelemeli,” *Anadolu Ajansı*, 16.06.2012. https://www.aa.com.tr/tr/politika/komisyon-kurum-arsivi-incelemeli-/361480

**Şekil 2.1: Ewra peyvan ya rapora dawîn**




Şekil 2.2: Mijarên ku di rapora dawîn de behsa wan hatine kirin



## BEŞA 3.

# KOMÎSYONA DERBEYÊ

# Komîsyona Derbeyê

## Destpêk

Pêşketina demokrasiya Tirkiyê bi du derbeyên leşkerî (1960 û 1980) ku piştî wan Serfermandarê Leşkerî [*Genelkurmay Başkani*] ji bo demên kurt erka biryarwergirtinê hemû girtin ser xwe û du destwerdanên leşkerî (1971 û 1997) ku tê de fermandariya bilind a artêşê, hikûmetên sivîl neçar hiştin ku îstifa bikin hate qut kirin. Li gel van, piştî derbeya leşkerî ya di sala 1960î de damezrandina Lijneya Ewlekariya Neteweyî [*Milli Güvenlik Kurulu*] hişt ku artêş karîgeriyeke berdewam li ser siyaseta sivîl bike, û dadwerî û saziyên din ên sivîl gelek caran biryarên xwe ji bo bi cih anîna hesasiyetên artêşê, yên ku bi gelemperî destwerdana xwe bi angaşta şerê li dijî gefên navxweyî û navneteweyî yên li ser komarê, ango komunîzma salên 1960 û 1970an, û îslamîzm û cudaxwaziya kurdan ya ji salên 1980yî û pê ve, rewa dike. Tevî ku Tirkiye di salên 2000an de ji bo endamtiya Yekîtiya Ewropayê bû berendam û 50 saliya hilbijartinên pirpartiyî pîroz kir jî, gotegotên destwerdana leşkerî qet nesekinîn. Komîsyona Lêkolînê ya Meclîsê ya ji bo Lêkolînkirina Berfirehiya Hemû Derbe, Muxtira û Danûstandinên ku Destwerdana Demokrasiyê û Hemû Înîsiyatîv û Pêvajoyên Din ên ku Demokrasiyê li Welatê Me Kêm Dikin û Tesbîtkirina Tedbîrên ku bêne Girtin, yekem hewla fermî bû ku sedemên bingehîn ên derbe û destwerdanên leşkerî yên li Tirkiyeyê bi analîzên zanistî û rojnamevanî berhev bike.

## Peywend

Komîsyona Derbeyê di serdema herî pêhatî ya desthilatdariya AKP'ê de hat avakirin. Serkirdayetiya partiyê 8 salên xwe yên ewil (2002-2010) wekî têkoşîneke li dijî wesayeta dadwerî û leşkerî teswîr kir. Gelek dozên darazê yên payebilind ku di navbera salên 2005 û 2010'an de destpêkirin û gef li mafê birêvebirin û hebûna AKPê dikirin û daxuyaniya Serfermandariya Leşkerî ya di sala 2007'an de ku wekî li paş perdeyeke zirav gefeke li hikûmeta sivîl hate şîrovekirin, gotinên derbarê wesayetê piştrast kirin. Dema di nav van qeyranên siyasî de AKP biserket ku desthilatdariya xwe ya siyasî bidomîne, dozgerên alîgirê hikûmetê pêleke dozan dane destpêkirin li dijî leşker û sivîlên xanenişînbûyî yên ku guman ji wan dihat kirin ku derbeyeke leşkerî saz dikin. Dozên Mezrebe [*Balyoz*] û Ergenekonê (navê xwe ji geliyekî efsaneyî yê di

mîtolojiya tirkan de wergirtiye).[17] Herweha, dozger û dadwerên alîgirê hikûmetê piştî guherandina destûrê ya di sala 2010an de û hilbijartinên birêvebirina dadweriyê, dest bi wezîfeyên herî bilind ên dadrêsiyê kirin. Bi gotineke din, her tim behsa derbeyê dihate kirin, lê hukûmeta sivîl bi awayekî ku di dema borî de tu kesekî din bi rê pêkneanîbû, desthilata xwe xurt kir.

Partiyên din ên siyasî, bi taybetî jî CHP, bi guman nêzîkî li gefa derbeyê ya ku hertimî hikûmetê dianî ziman kirin. Li gorî vê yekê, AKP û hevalbendên wê yên endamê cemaeta Gulen de, dixwestin desthilata dadweriyê kontrol bikin û fermandariya bilind a leşkerî bi rêya sempatîzanên xwe, bixin bin kontrola xwe û ji bo vê yekê jî bi îdiayên sexte yên plana derbeyê, endamên artêşê û dadweriyê dadgeh kirin, girtin û tirsandin. Ji ber ku berdevkên AKPê û beşeke mezin ya rewşenbîrên lîberal yên Tirkiyê diparastin ku, îdeolojiya kemalîzmê artêş, dadwerî û CHPyê wekî parêzvana wesayeta kevin a li ser hêzên sivîl dihesibîne, Serokên CHPyê pirê caran mecbûr diman xwe biparêzin. (Ji bo nêrîneke rexneyî ya li ser vegotina entelektueliya lîberalî binêre: Ersoy û Üstüner 2016) Helbet, dîroka derbeyên leşkerî yên li Tirkiyê pir têkelhevtir bû: Ji ber ku rexnegirên wan li seranserê salên 2000î gelek caran di gengeşeyên giştî de anîn ziman, CHPê ji bo demeke kurt sûd ji derbeya 1960î wergirt, lê di salê 1960 û 1970an de nêzîkbûna CHPê ya ber bi çepgiriyê ve, bi gelemperî hişt ku ew û artêş nakokiyan bijîn. Lê di rastiyê de CHP jî ligel hemû partiyên siyasî piştî derbeya 1980ê hatibû girtin. Lê dîsa jî, di çarçoveya destwerdana leşkerî ya sala 1997an de ji nû ve pênasekirina veqetînên siyasî yên li ser eksena laîsîzm-îslamîzmê, CHP di nîveka salên 1990 û 2000an de dîsa nêzî artêşê kir.

Dema ku komîsyona sala 2012'an dihat nirxandin, hemû partiyên siyasî bi wê yekê re eleqedar bûn ku destwerdanên leşkerî yên li ser siyaseta sivîl bi awayekî eşkere şermezar bikin. Siyasetmedarên navdar baldar bûn ku pesnê derbe û tehdîdên derbeyê yên berê û niha nedin. Sûcdarkirinên serokên AKPê yên ku digotin muxalefet sempatiya derbeyê diparêze, bi gelemperî li şûna piştgirîya eşkere ya derbeyê, di çarçoweya rojeveke veşartî de hatine destnîşankirin. Li hember vê yekê, muxalefetê hukûmet bi wê yekê sûcdar kir ku; dema ew nîşan dide ku li dijî derbeyan derdikeve, otorîterîzmê kûrtir dike.

---

[17] Li Tirkiyê navê dewleta kûr ya ku dihate angaştkirin bûye cihê gelek nîqaşan. Balkêşe, yek ji cihên ku cara ewil peyva Ergenekonê bi wateya rêxistineke nepen tê de derbas dibe rapora Komîsyona Susurlukê yê. Paşê di sala 2000an de Fikri Saglar ê ku yek ji endamên karîger yê Komîsyona Susurlukê bû, di civîneke çapemeniyê de heman gotin. Anî rojevê. Binêre: Balci 2010, 29.

## Avakirin û xebitîna Komîsyonê

Her çar partiyên ku wê demê di meclîsê de cih digirtin, yanî AKP, CHP, Partiya Tevgera Neteweperest [*Milliyetçi Hareket Partisi*, MHP] û Partiya Aştî û Demokrasiyê [*Barış ve Demokrasi Partisi*, BDP], ji bo derbe û destwerdanên din ên antîdemokratîk ên li ser siyasetê werin lêkolîn kirin, pêşnûmayê xwe pêşkêşî Civata Giştî ya Meclîsa Mezin ya Gel a Tirkiyê kirin. 125 parlementerên AKPê, 24 parlementerên BDPê, 2 parlementerên MHPê û 3 parlementerên CHPê li ser navê her koma partîyeke li meclîsê ew pêşnûma îmze kirin. Ihtîmale, tu partiyên siyasî nexwestin ku bi tevahî wekî dilsozên demokrasiya sivîl xuya bikin.

Komisyona ku di 2ê Gulana 2012an de dest bi xebata xwe kir de van endaman cih girt: Nimet Baş (AKP, serok), Mehmet Naci Bostancı (AKP), Idris Şahin (AKP), Cengiz Yavilioglu (AKP), Feyzullah Kiyiklik (AKP), Mustafa Şentop (AKP), Şirin Unal (AKP), Yaşar Karayel (AKP), Idris Bal (AKP), Selçuk Ozdag (AKP), Ahmet Toptaş (CHP), Suleyman Çelebi (CHP), Mehmet Şeker (CHP), Riza Oztürk (CHP), Ozcan Yeniceri (MHP), Atila Kaya (MHP) û Sırrı Sureyya Onder (BDP). Ev pêkhate serdestiya eşkere ya AKP ya desthilatdara wê demê nîşan dide, ji ber ku 10 ji 17 endaman komîsyonê endamê wê partiyê bûn. Seroka komîsyonê Nimet Baş, endameke damezrîner ya AKPê bû û di hikûmeta yekem a AKP'ê de weke Wezîra Malbat û Jinê û di hikûmeta duyemîn de jî wekî Wezîra Perwerdeyê kar kiribû. Komîsyon ji bo lêkolînkirina derbeya 27ê Gulana 1960an, Mudaxaleya leşkerî ya 12ê Adara 1971ê, derbeya 12'ê Îlona 1980î û pevgihîna mûdaxaleya 28ê Sibata 1997an û 27'ê Nîsana 2007an pêk hatî bike, veqetiya çar komîsyonên jêr. Komîsyonê sê rêbazên berhevkirina daneyan bi kar anîn: hevpeyvîn, lêkolîna di arşîvên dewletê de û lîteratura duyemîn.

Ihtîmal e, belgeyên hevpeyvînan yên komîsyonê berhevoka herî berfireh a vegotinên ji devê kesên yekem yên dîroka siyasî ya Tirkiyê ye ne. Bi tevahî bi 160 kesan re hevpeyvîn hatine kirin – balkêş e, kesên ku hevpeyvîn bi wan re hatine kirin, destwerdana 1971ê ne tê de, ji bo ronîkirina hemû derbe û destwerdanên li jorê navên wan boriye, hatine hilbijartin. Di lîsteyê de li gel gelek siyasetmedarên sereke yên ku ji salên 1960an û vir ve çalak bûn, rojnamevan û akademîsyenên navdar û pêşeng jî hene. Piştre Serokwezîrê wê demê Recep Tayyip Erdogan bi bersivên nivîskî yên pirsên komîsyonê, beşdarî komîsyonê bû. Du serlehengên siyaseta salên 1990î, Tansu Çiller û Mehmet Agar jî, ne wekî bersûcên gumanbar ên binpêkirinên mafên mirovan yên berê, lê wekî mexdûrên destwerdana leşkerî ya sala 1997an, îfade dan.[18] Li gorî agahiyan,

[18] Bi Agarê ku, di Îlona 2011an de ji ber serokatiya rêxistina sûca hatibû girtin re, di serê Mijdara 2012an de li hepsê hevpeyvîn hate kirin.

Endamê Komîsyonê yê ji BDP'ê Onder, ji Çîller binpêkirinên mafên mirovan ên di serdema serokwezîrtiyê de pirsîne, lê bersiveke têrker wernegirtiye.[19] Yek ji stêrkên ku hevpeyvîn pê re hatibû kirin jî Suleyman Demirel bû ku di salên 1971 û 1980î de serokwezîr û di sala 1997an de jî serokkomar bû.

Komîsyonê her wiha ji saziyên dewletê xwest ku bi dehan belgeyan radestî wan bikin - bersiv û bangên bê bersiv mayî yên wan saziyan di pêveka rapora dawîn ya komîsyonê de ("EK-B: Kurum ve Kuruluşlardan Talep Edilen Bilgi ve Belgeler") hatine nivîsandin. Rapora dawîn ne tenê behsa belgeyên hatine şandin, di heman demê de behsa rastiya ku hin saziyan agahdarî jî bi wan re parve nekirine jî dike. Lê dîsa jî, serokê komîsyonê Baş, ji ber ku saziyên dewletê di parvekirina belgeyan de ji erka xwe derbas bûne, paşê pesnê wan da. (Baş, Sancar, and Özgürel 2012, 25).

Di dawiyê de, lêkolîna komîsyonê ya li ser lîteratûra duyemîn ji çavkaniyeke berfireh ya li ser demokratîkbûn û otorîterîzma li Tirkiye, Rojhilata Navîn û cîhanê pêk tê. Di raporeke komîsyona meclîsê de bikaranîna lîteratûreke akademîk bê guman der adedî ye; Herweha, di çavkaniya ku ji 37 rûpelan pêk tê de, curedariya mijarên ku li ser wan hatine sekinîn balkêş e. Çavkanî, gotarên akademîk, kitêb, tezên mastirê, nûçeyên rojnamegeriya lêkolîner yên derbarê dîroka derbeyan, siyaseta dadwerî, partiyên siyasî, dîroka aboriyê, dîroka sendîkayên karkeran, geşedanên salên dawî yên Dewleta Osmanî, qeyrana Kibrisê ya di salên 1960 û 1970î, terorîzim û gelek tiştên din dihewîne. Ihtîmal e, Komîsyona Derbeyê, di dîroka Tirkiyeyê de ji aliyê entelektueliyê ve komîsyona herî bi pêşketi ye.

## Rapora Dawîn

Rapora dawîn ji pênc beşan pêk tê: Nirxandina giştî ("Genel Değerlendirme") ku armanc dike têkiliyên sivîl û leşkeran yên li Tirkiyeya modern bi xwendevanan bide nasîn û çar beşên din ku her yek jê li ser destwerdanên leşkerî (derbeyên 1960 û 1980î, û destwerdanên 1971 û 1997/2007) yên ku ji bo analîzê hatibûn hilbijartin e. Beşên derbarê destwerdanên leşkerî de bi giştî li ser beşan hatine dabeş kirin ku sedem, hincet û encamên her destwerdanê vedibêjin. Derbeya 1980 û destwerdanên 1997/2007 di rapora dawîn de ji derbeya 1960'i û destwerdana 1971an (her yek ji wan bi qasî 200 rûpelan e) bi gelekî zêdetir cîh digire (her yek ji wan bi qasî 400 rûpelî).

19 "Tansu Çiller, Darbeleri Araştırma Komisyonu'nda ağladı!" *T24*, 7.11.2012; herweha binêre: https://t24.com.tr/haber/cillerin-duygulu-anlari,216857. Parlamenterên CHPê, hevkarên xwe yên AKPyî sûcdar kirin ku ew Çîllerê bi rêkûpêk nadin lêpirsinê û rola wê ya di paramîlîtarîzekirina dewletê ya salên 1990î de vedişêrin lê erka wê ya di muxtiraya sala 1997an de, di dema komîsyonê û piştî komîsyonê de jî raya giştî mijul kir.

Sernavên beşa nirxandina giştî bi xwe jî fikrekî didin, bê rapora dawîn çi qasî berfireh e: Sernav û jêrsernavên rapora dawîn weha ne: Kevneşopiya Dewletê û Demokrasiya li Tirkiyê ("Türkiye'de Devlet Geleneği ve Demokrasi"), ku jêrnavên wê yên wekî Milîtarîzm, Şerê Sar û Rolên Pergala Navneteweyî yên di Derbeyan de ("Militarizm, Soğuk Savaş ve Uluslararası Sistemin Darbelerdeki Rolü") û  Demokrasî, Derbe û Modernbûna Tirkiyeyê ("Demokrasi, Darbeler ve Türk Modernleşmesi") hene. Sernavê Lijneye Ewlehiya Neteweyî ("Millî Güvenlik Kurulu") ku jêrsernavên wê jî ev in: Siyaseta Ewlehiya Neteweyî ("Ulusal Güvenlik Siyaseti") û Bîrbiriya Gefên Hûndirîn ("İç Tehdit Algısı"); Teşkîlta Dewletê û Serfermandariya Leşkerî ("Devlet Teşkilatı ve Genelkurmay Başkanlığı"); Ewlehiya Hûndirîn ("İç Güvenlik"); Daireya Şerê Taybet, Kontrgêrila û Şerê Xeyrî Nizamî ("Özel Harp Dairesi, Kontrgerilla ve Gayri Nizami Harp"); Perwerdehiya Leşkerî ("Askerin Eğitimi"); Yekîtiya Dadweriyê û Dadweriya Leşkerî ("Yargı Birliği ve Askeri Yargı"); Aborî û Derbe ("Ekonomi ve Darbeler"); Kontrola Karên Leşkerî ("Askeri İşlerin Denetimi"); Îstîxbarata Neteweyî û Derbe ("Ulusal İstihbarat ve Darbeler") û Çapemenî, Rewşenbîr, Civaka Sivîl û Derbe ("Medya, Aydınlar, Sivil Toplum ve Darbeler").

Rapora dawîn ya komîsyonê wekî metneke zanista civakî tê xwendin. Di rastiyê de şêwaza vegotina edlî ku di Komîsyona Susurlukê ya 1997an de heye, di rapora vê komîsyonê de qet tune ye. Di zêdetirî 1400 rûpelan de jêgirtinên ji hevpeyvînan, beşên belgeyên ku ji aliyê partî û saziyên dewletê ve hatine weşandin, pênasekirina bûyerên tundiyê yên di dema destpêkirina derbeyan de, û analîzên dirêj ên gelek faktorên ku tê angaştkirin di destwerdanên leşkerî de rolên sedemî dilîzin, hene. Metn ji bo dîroka siyasî ya Tirkiyeyê vebêje, di heman demê de, lenseke  qanûnî, saziyî, çandî, aborî û siyasî bi kar tîne.

Beşa dirêj a li ser derbeya 1980yî bi du beşên ku pirsgirêkên heqîqet û dadmendiyê yên piştî derbeyê vedibêjin bi dawî dibe; ev yek di analîza destwerdanên din de tune ye. Di beşa 13an ya beşa bi navê ("12 Eylül Darbesinin Yargılanmasına İlişkin İddianame") de, angaştnameya derbarê mîmarên derbeyê de ya bi dîroka 2012an ku bi qasî biryara derbeyê, binpêkirinên mafên mirovan yên di serdema rejîma leşkerî de û bi taybetî jî îşkenceya li girtiyên siyasî vedihewîne, cih digre. Di beşê de herweha agahiyên derbarê argumanên parastina generalên wekî Kenan Evren û Ali Tahisn Şahinkaya ku serokatiya derbeyê û ya hikûmeta leşkerî ku piştî derbeyê pêkhatibû agahiyan dide.  Bi vî hawî, ev beş peyketina derbeyeke di raboriyê de pêkhatî, bi awayekî kêmpeyda belge dike.

Beşa 16an ya bi navê Li Cîhanê Komîsyonên Derbarê Derbeyan de Hatine Avakirin û Encamên Wan ("Dünyada Darbelerle İlgili Kurulan Komisyonlar ve Sonuçları"), derbarê

komîsyonên heqîqetê de agahiyan dide ku armanca wan hesabpirsîna ji derbeyên berê yên li Arjantîn, Gana, Haîtî, Şîlî, Uganda û Uruguayê ne. Dema em darîçav bigrin ku komîsyon bixwe jî angaşt dike ku ew jî rolekê bi heman rengê komîsyonê li jorê dilîze, dibe ku endamên komîsyonê xwestibin berê xwendevanan bidin ezmûnên bi vî rengî û fikrekî bidin xwendevanan bê li her derê cîhanê, komîsyonên heqîqetê lêkolînên xwe çawa dimeşînin. Di dawiya beşê de, derheqê dersên ji tecrubeyên gerdûnî hatine wergirtin, an jî pêşniyarên avakirina komîsyonên bi vî rengî li Tirkiyeyê tu tişt nîne, ji ber vê yekê ev beş di rapora dawîn de wekî beşeke girîng lê bê encam ya raporê dimîne.

Yek ji xalên şaşwazker ên rapora dawîn jî ew e ku têgînên xwe yên sereke - ango derbe [*darbe*], hewldana derbeyê [*darbe girişimi*] û muxtirayê [*muhtıra*] pênase nake. Herweha tişta sosret ew e ku di vegotina rapora dawîn de tenê carekê behsa angaştên derbeyê yên dawî, ango Balyoz û Sarikizê dike. Dema peywenda ku komîsyon tê de hatiye avakirin darîçav were girtin, di dema ku raya giştî her tim bi girtinên bi van angaştan pêkhatî re rû bi rû dimîne de, mirov dikare texmîn bike ku komîsyonê nexwestiye bikeve nava nîqaşên îro yên derbarê peyketinan de.

Xaleke din ya balkêş ya rapora dawîn jî ewe ku destwerdana 1997an û muxtiraya 2007an wekî ku yek mijar bin hatine lêkolîn kirine. Wek ku berê jî hatibû behskirin, Encumena Ewlekariya Neteweyî ya ku di bin serweriya leşkerî de ye di sala 1997an de bi biryarên ku wergirtin, hikûmeta koalîsyonê ya ku ji hêla Partiya Refahê ya Îslamî (RP) û Partiya Rêya Rast (DYP) ya rastgir ve hatibû avakirin neçar hişt ku îstifa bike. Piştre jî li hember aktorên siyasî yên Îslamî yên di navbera salên 1997 û 2001ê de çalak bûn, tepeserkirinekê pêk hat Qaşo e-muxtira *[e-muhtıra]* ya sala 2007an di çarçoveyeke siyasî ya cuda de pêk hat ku wê demê hikûmeta AKP'ê zêdetirê 4 salan bû ku desthilatdar bû. Bi rastî di muxtirayên salên 1997 û 2007an de tiştên wekî hev hene: her du jî li dijî hikûmetên ku ji hêla partiyên ku xwe wekî muhafezekar an îslamîst didin nasîn (RP û AKP), di dema ku ew partî gefên qedexekirinê yên Dadgeha Qanûna Bingehîn jî tê de bi berxwedana dadweriyê re rû bi rû man de, pêk hat. Di gel vê yekê, cudahî jî diyar in: Belgeya bi îmzeya Serfermandarê Leşkerî Yaşar Buyukanit ya bi dîroka 2007an li ser malpera Serfermandariya Leşkerî hat barkirin (lewma wekî e-muxtira tê zanîn); Vê muxtirayê wekî ku di sala 1997 de bibû, biryara lihevkirî ya Encumena Ewlekariya Netewî nîşan neda.  Ji xwe em qala rastiya ku AKP di Nîsana 2007 de zêdetirî çar salan bû ku îktîdar bû jê re pir hêsan bû ku Buyukanit bêdeng bike. Arşîvên çapemeniyê nîşan didin ku daxwaza CHP'ê ya avakirina komîsyoneke jêrîn a ji bo lêkolîna bûyera 2007an,  ji aliyê komîsyona ku prianiya endamên wê AKPyî bûn

ve hatiye redkirin.[20] Ji ber vê yekê, biryara komîsyonê ya lêkolînkirina wan her du destwerdanan ya bi hev re wekî biryarek siyasî xuya dike.

Hem CHPê hem jî MHPê diyar kirin ku ew bi tevahî naveroka rapora dawîn napejirînin û raporên cuda pêşkêş kirin.[21] Çar parlementerên CHPê û 2 parlementerên MHPê ji bo balê bikşînin ser aliyên raporê yên ku ew ji wan ne razî ne, nêrînên ji hev cuda nivîsandin. Nêrîna CHPê ya ku ji 18 rûpelan pêk tê, lîsteyeke berfireh a mijarên ku dikaribû di komîsyonê de bihatana nîqaşkirin, lê nehatibûn nîqaş kirin, pêşkêş dike. Di eslê xwe de, ew komîsyonê ji ber sedêmên wekî yên li jêrê sûcdar dike: Ji salên 1970an[22] vir ve têkiliya di navbera komên rastgir yên kontrgerîla û şîdeta ku ji hêla dewletê ve hatî piştgirî kirin nîqaş nake, karakterê rastgir ê darbeya 1980an vedişêre, şîdeta îslamî bi awayekî efûkar nîqaş dike û muxtiraya sala 2007an nîqaş nake, nemaze hevdîtina serokwezîr Erdoğan û Serfermandarê Leşkerî Büyükanit ku piştî muxtirayê re pêkhatî û rastî tu bertekekê nehatibû nayê nîqaş kirin. (r. 1328-1345).

Berevajî reseniya nêrîna cuda ya CHPê, parlementerên MHPê di nêrîna xwe ya kurt de sê îtîrazên li ser rapora dawîn tomar kirin: Ya yekem, ew angaşt dikin ku têgeha "dewleta kûr" nisbî ye û ji ber vê yekê ne mimkûn e ku bi lêkolîna parlamentoyê were keşifkirin; ya duduyan, ew ji çarçoveya ku terorîzma cudaxwaz wekî "pirsgirêka kurd" tê hesibandin, ne razî ne; û ya sêyem, ew naxwazin ku komîsyon bi komîsyona heqîqetê re were têkelhevkirin ku bi bawerîya wan komîsyona heqîqêtê daxwaza cudaxwazan e li Tirkîyê (r. 1346-1349).

Di nav pêşniyarên rapora dawîn yên ku bi yekdengî li ser wan hatiye lihevkirin de, xalên wekî; danîna sînorên zelal ên hêz û desthilatdariya artêşê, kontrola sivîlan a li ser artêşê, kûrkirina demokratîkbûnê, hesabdayineke tam ya berpirsyarên derbeyên berê û naskirina mexdûriyeta kesên ku di heyamên derbeyê de bûne hedef. Li gel van di raporê de tê xwestin ku komîsyonên lêkolînê werin avakirin ji bo lêkolînkirina binpêkirinên mafên mirovan ên ku nehatine çareserkirin ku heta salên 1970yî vedigerin.

---

20 "AKP, 27 Nisan bildirisi için alt komisyon kurulmasına karşı çıktı," *T24*, 10.05. 2012; herweha binêre: https://t24.com.tr/haber/akp-27-nisan-bildirisi-icin-alt-komisyon-kurulmasina-karsi-cikti,203593

21 "Darbe raporu tamam," *HaberTürk*, 28.11.2012; herweha binêre: https://www.haberturk.com/gundem/haber/798461-darbe-raporu-tamam

22 Endamê komîsyonê yê CHPyî Suleyman Çelebi, ji jêr komîsyona lêkolîna derbeya 1980yî xwest ku bi sûcdarên neteweperest yên salên 1970an Mehmet Ali Agca û Haluk Kirci re hevpeyvînan bike lê encamek bi dest nexist. "TBMM Darbe ve Muhtıraları Araştırma Komisyonu Sözcüsü Şahin'in Açıklamaları...", *TBMM Archive*, 23.05.2012; herweha binêre: https://meclishaber.tbmm.gov.tr/develop/owa/haber_portal.aciklama?p1=121861

## Pêvajoya piştî komîsyonê

Komîsyonê rapora xwe ya dawîn di 28ê Mijadara 2012ê de pêşkêşî serokê parlamentoyê kir. Seroka komîsyonê Nimet Baş di dema proseya komîsyonê û yekser piştî komîsyonê de, di ravekirina karê xwe û hevkarên xwe de çalak bû. Berî bi pêşkêşkirina rapora dawîn bi du hefteyan, di hevpeyvîna ku dabû bi çapemeniyê de wê helwesta xwe ya li ser nakokiyên derbarê komîsyonê de diyar kir. Herweha wê di wê hevpeyvînê de diyar kir ku xebatên komîsyonê arşîveke zêdetirî 4,000 rûpelan pêktînin ku ji wan 187 divê nehênî bimînin.[23]

Bi mehekê piştî radestkirina rapora dawî ya Komîsyona Derbeyê, saziya hizrî ya alîgirê AKPê Weqfa Lêkolînên Siyasî, Aborî û Civakî [*Siyaset, Ekonomi ve Toplum Araştırmaları Vakfı,* SETA] serokê komîsyonê Nîmet Baş, rojnamevan Avnî Ozgurel û akademîsyen Mîthat Sancar ji bo panelekê vexwendin û wan jî beşdarî li panelê kirin. Rapora derketî holê, mînakeke pir kêm tê dîtine ku endamekî  komîsyona lêkolînê ya meclîsê beşdarî paneleke li pêş gel dibe (Baş, Sancar, and Özgürel 2012). Baş di wir de li gel nirxandineke derbarê sînordarkirinên peywîr û selahiyetên komîsyonê de, pênaseyeke bi berfirehî ya komîsyonê û analîza wê pêşkêş dike. Analîza Sancar ya di wê panelê de hêjaye ku bi taybetî were bibîranîn, lewra ew ji bo nîqaşkirina avantaj û dezawantajên her modelê, komîsyonên lêkolînê yên meclîsê bi komîsyonên heqîqetê re li gel aliyên wan ên ku dişibin hev û berovajî hev in ve berawird dike. Nirxandina wî ya li ser Komîsyona Darbeyê bi tevahî pir erênî ye.

Têkiliya komîsyonê û peyketinên derbeya 1980 û destwerdana 1997an sist maye. Komîsyonê nusxeyeke rapora dawîn ji dozgeran re neşand, lê li gorî Baş, her dema ku dozgeran daxwaz ji wan kiriye, wan agahiyên têkildar parve kirine.[24] Tenê delîlek heye ku îhtîmale tesbîtên komîsyonê di darizandineke sûc de hatibe bikaranîn: Dadgeha lêpirsîna doza JÎTEM'ê ya li Enqereyê di 10'ê Sibata 2017an de ji Komîsyona Derbeyê îfadeyên derbarê wê mijarê de xwestin.[25]

Di dema Komîsyona Derbeyê de 4 dozên têkildarî derbeyê hebûn: Doza Ergenekonê, ku di sala 2008an de dest pê kir û angaşt dikir ku li şebekeya sûc a di nava saziyên dewletê

---

[23] Serpil Çevikcan, "Genelkurmay ve MİT bize bazı belgeleri göndermedi," *Milliyet*, 15.11.2012; herweha binêre: https://www.milliyet.com.tr/yazarlar/serpil-cevikcan/genelkurmay-ve-mit-bize-bazi-belgeleri-gondermedi-1627158

[24] "Suikastları aydınlatmak boynumuzun borcu," *Milliyet*, 1.12.2012; herweha binêre: https://www.milliyet.com.tr/siyaset/suikastlari-aydinlatmak-boynumuzun-borcu-1635379

[25] Kezban Horasan Yıldız û Melike Polat, "Ankara JİTEM Davası İzleme Raporu," *Hafiza Merkezi*, 05.05.2017; herweha binêre: https://hakikatadalethafiza.org/ankara-jitem-davasi-izleme-raporu-5-mayis-2017/

de dikole, doza Balyoz, ku di sala 2010an de ji bo lêpirsîna plana derbeya 2003an dest pê kir. Doza derbeya 12ê Îlona 1980ê ku di sala 2011an de dest pê kir û doza destwerdana leşkerî ya 28ê Sibata 1997an ku girtinên ji ber vê dozê hîn dema ku Komîsyon çalak bû pêkhatibûn lê qonaxa dadgehkirina wê di sala 2013an de dest pê kiribû. Dozger û dadwerên van hemû dadgehan bi piştgirîkirina Fetullah Gulen, ku piştî Kanûna 2013'an ji bo meşrûkirina pêvajoya dozgeriyê ji holê rake xizmet dikir hatin sûcdar kirin. Doza derbeya 1980'yî ji ber ku generalên mehkûm bibûn di dema temyîzê de mirin, di her rewşê de diviya bû were betal kirin. Herweha, lihevanîna delîlan ya di doza Balyozê de jî di nav de, kêmasiyên cidî yên prosedurê, baweriya derbarê dozên Ergenekon û Balyozê kêmtir kir. Ji çar komên peyketinê, tenê darizandinên 28'ê Sibata 1997'an di sala 2018'an de bi biryarên ku bersûc, sûcdar dîtin derketin, ku di sala 2021'an de di temyîzê de jî hatin erêkirin.

Di dema Komisyona Derbeyê de derdorên hikûmetê tirsa destwerdaneke leşkerî ya ji hêla Kemalîstan ve anîn ziman. Dibe ku îronîk be lê dema ku hewldana derbeya 15ê Tîrmeha 2016an pêk hat, tiliyan Gulen û şagirtên wî nîşan dan, ku di sala 2012an de bi awayekî dostane bi wan re muamele dihat kirin. Tiştên derbarê Gulen yên ku di rapora dawîn ya Komîsyonê Derbeyê de derbas dibin, ji angaştên Encumena Ewlekariya Neteweyî pêk tên ku vedigerin salên 1997-1998an.  Wê demê artêşê çalakiyên vê komê bi destdanîna ser saziyên dewletê ya ji aliyên îslamiyan ve girêdidan. Ji bilî vê, komîsyonê bi hin Guleniyên sereke yên sektora medyayê re hevpeyvîn kirin. Di rapora dawîn de ti nîşaneyek nîne ku têkiliya Gulen û alîgirên wî bi planên derbeyê re hebe. Ji ber vê yekê hewldana derbeyê ya sala 2016'an li gorî vegotina navendî ya rapora dawîn ya komîsyona 2012'an cih negirt. Di rastiyê de, ji bo lêkolînkirina hewldana sala 2016an komîsyoneke lêkolînê ya parlementoyê hebû, lê serokatiyê AKPê di sala 2016an de ev komîsyon ragirt. Sedem belkî jî tirsa ku wê ev komîsyon hevalbendiya deh salan ya AKPê bi Gulen û alîgirên wî re derxista holê ku ew niha bi derbexwazî û xayintiyê têne tawanbar kirin.  Wekî encam, geşedanên sala 2016'an xebatên komîsyona sala 2012'an, ku demekê wekî raporeke fermî ya herî berfireh a derbeyên leşkerî û destwerdanên li Tirkiyeyê dihatin naskirin, ji bo rêveberiya AKPê kirin xetere. Bi vî hawî hem rapora 2012'an û hem jî xebatên ragihandinê yên li derdora wê ji aliyê AKP'ê û çapemeniyê ve hatin paşguhkirin.

## Analîza Komîsyona Derbeyê

Rapora dawî ya Komîsyonê mîna dîrokeke siyasî ya dirêj a Tirkiyeyê ye. Ravekirinên dûr û dirêj ên qada siyasî ya beriya derbe û destwerdanên leşkerî dihewîne. Bîbliyografya ne tenê ji hêla mijaran ve, lê di heman demê de ji hêla cûrbecûriya paşxaneya rewşenbîrî û meyla siyasî ya nivîskaran ve jî berfireh e: Rojnamevan û

zanyarên civakî, aborînas û zanyarên siyasî, sosyalîst û muhafezekar, ku çendeke ji wan e.

Berevajî Komîsyona Susurlukê, ku ewra peyvan wêneyekî zelal yê pêşaneyên di vegotinê de derdixe holê, ji bo ewra peyvan ya Komîsyona Derbeyê (binêre. Şikil 3.1) em nikarin bêjin ku şêwazeke serdest ya ravekirinê dihewîne. Aşkere ye ku têginên mîna "derbe" [*darbe*], "artêş" [*ordu*] û "hikûmet" [*hükümet*] di belgeyeke derbarê derbeyên leşkerî de gelek caran derdikevin pêşberî mirov, lê di encamê de, gelek komên têgînan ku têgînên hiqûqî, têgînên aborî, kurtasiyên wekî Lijneya Ewlekariya Neteweyî (*mgk*) û zanîngeha (*üniversite*) di rapora dawîn ya Komîsyona Derbeyê de cih digrin. Herweha komîsyon gelek referansan li têgehên têkildarî mafên mirovan û pirsgirêka Kurd dike (binêre. şikil 3.2). Di heman demê de bi rêkûpêk behsa têgînên wekî kontrgerîla, Gladio, şerê xeyrî nizamî û hwd dike. Bi gotineke din, danasîna jimareyî bi xwendineke bi baldarî re hevaheng e: Komîsyona Derbeyê ji gelek aliyan ve û bi bikaranîna gelek rêbazên analîzan nêzî mijara xwe dibe.


Rola hikûmetên biyanî, bi taybetî jî ya Hikûmeta Amerîkayê, li gel raya giştî komîsyon jî mijûl kir. Mînak, temaşevanek di panela SETA ya ku li jor hatî behs kirin de, di derbeyên leşkerî de rola Dewletên Yekbûyî yên Amerîka û NATOyê dipirse. Komîsyon 43 caran behsa Dezgeha Îstixbarata Navendî (CIA) û 30 caran jî behsa Gladio (ku di vê peywendê de wekî yekîneyên taybet ên ku operasyonên şerê xeyrî nizamî li welatê başûrê Ewropayê yên endamên NATO'yê pêk tînin tê bikaranîn) dike. Derketina holê ya yekîneyeke şerê xeyrî nziamî ya Tirk bi hevkariya CIAyê wekî îhtîmalek pir muhtemel û faktoreke potansiyel a destpêkirina derbeyan tê pêşandan. Li gel vê yekê, rapora dawîn vê îhtîmalê piştrast nake. Yek ji îtîrazên ku ji aliyê endamên CHPyî ve hatiye kirin jî, derbarê vê referansa nepen ya Gladioyê ye de ye. (1334, 1341).

Komîsyona Derbeyê bi amadebûna xwe ya ji bo nîqaşkirina binpêkirinên mafên mirovan ên mezin ku mohra xwe li raboriya bi kêşê ya Tirkiyeyê xistine derdikeve pêş. Bûyerên tundûtujîyê yên wekî, 6-7ê Îlona 1955an ku li Stenbolê li dijî xeyrî muslîman pêkhatibûn, di 1ê Gulana 1977an de, dema ku êrîşkaran gule li meşa karkeran reşandin, tundiya li dijî elewî û çepgirên li Mereş û Çorumê pêkhatibû, derbeya 1980î, muameleya xerab û îşkenceya ku di dema rejîma leşkerî de li zindana Diyarbekirê li girtiyan hatibû kirin, Komkujiya Sêwasê ya 1993an, kuştinên kiryar nediyar yên salên 1990î û li herêmên kurdan valakirina gundan a bi darê zorê di raporê de cih digrin. Wekî ku beşa nirxandina giştî ya vê raporê dê eşkere bike, Komîsyona Derbeyê tekane cureya van komîsyonana ku piraniya van bûyerên tundûtûjiyê nîqaş dike.

Li gel vê yekê, çarçowekirina van beşan ji aliyê Komîsyonê ve, wê yekê aşkere dike ku komîsyon naxwaze van têgînan bi awayê bibîrxistîna rexneyî bikarbîne. Wekî mînak, tundûtûjiya sala 1955an de pêkhatî ji devla wekî komkujî (*katliam*) an pogrom bi nav bikî, wekî "bûyer" [*olay*] bi nav dike. Bûyerên tundûtujiyê yên di sala 1978an de li Mereşê pêkhatî 49 caran wekî bûyer, 3 caran jî wekî komkujî hatine bi nav kirin. Ji 22 behskirinên bûyerên tundûtujiyê yên li  Çorumê 21 jê wekî bûyer derbas dibin û tenê yek jê bi referansa komkujiyê hatiye bikaranîn, ji 26 behskirinên bûyerên li Sêwasê 25 jê wekî bûyer derbas dibin. Bikaranîna bi vî rengî, meyla dewlet û medyaya sereke ku dixwazin xweza û mezinahiya şîdeta siyasî veşêrin ji nûjen ve hildiberîne.


Wekî encam, Komîsyona Derbeyê dîroka siyasî ya Tirkiyê pêşkêş kiriye – ne tenê ji ber mijara xwe, lê ji ber ku dema endaman dîrok nivîsiye gotinên xwe, çarçoveyên vegotina xwe, mijarên û bêdengiya xwe wekî peywireke siyasî wergirtine siyasî ye. Metnekî wisaye ku hêjaya bi awayekî rexneyî mirov fêr bibe û analîza wî bike. Li gel vê yekê jî, salên 2010an de yên ku hewaya siyasî bi lez diguherî û Erdogan û serkirdeyên AKPê bi awayekî berdewamî tifaq û axaftinên xwe diguherandin, li ser Komîsyona Derbeyê bandoreke kêm ya raya giştî pêkanî.

**Şekil 3.1: Ewra Peyvan ya Rapora Dawîn**




**Şekil 3.2: Mijarên ku di rapora dawîn de behsa wan hatine kirin**

*Hejmara giştî ya mijarên ku Komîsyona Derbeyê behsa wan kiriye*



BEŞA 4.

# KOMÎSYONA JÊR A BİNPÊKİRİNÊN MAFÊN JİYANÊ

# Komîsyona Jêr a Binpêkirinên Mafên Jiyanê

## Danasîn

Pevçûnên tund yên di navbera dewleta Tirk û PKK'ê de, ku di sala 1984'an de dest pê kiribûn, di sala 2011an de jî berdewam bûn. Tevî ku burokrasiya dewletê derbarê qurbaniyên şer û pevçûnan de îstatîstîkên fermî bi caran belav kiribin jî, nezelaliya li ser hejmara kuştiyên qadên pevçûnan yên ji her du aliyan, nexasim hejmara qurbaniyên binpêkirina mafên yekparebûna bedenî, berdewam bûn. Lêpirsînên meclisê yên salên 1993 û 1997an hejmarên teqez aşkere nekirin û bi her awayî şîdet û binpêkirinên kujende û nekujende heta salên 2000î berdewam kirin. Ji ber vê yekê, hesabekî fermî yê sedem û encamên pevçûnên çekdarî yên navxweyî hîn nehatibû kirin.

## Peywend

Wekî Komîsyona Derbeyê û Komîsyona Pêvajoya Aştiyê, piştî serkeftina AKPê ya di  hilbijartinên Hezîrana 2011an de ku partiyê ji sedî 49,83 ê dengan girt û ji 3 parên kursiyên meclîsê 2 jê wê bi dest xistin, Komisyona Jêr a Meclîsê ya Binpêkirinên Mafên Jiyanê, di demeke kurt de hat avakirin. Heya wê demê, pabendbûna AKP'ê ya ji bo kûrkirina demokrasiyê û serweriya hiqûqê her ku diçû zêdetir dibû cihê pirsiyariyê. Lê hêviya ku wê serokatiya partiyê lêkolînkirina binpêkirinên mafên mirovan ên berê yên li herêma kurdan û çareseriya aştiyane ya pevçûnan pêk bîne, bi temamî ji holê ranebibû. Di hilbijartinan de CHPya ku rêjeya dengên xwe %5 zêde kir û bi hêztir bibû û MHPya ku lawaz bibû lê tevî vê yekê jî 53 parlementer derxistibûn ketin meclîsê. Di van hilbijartinan tevgera siyasî ya kurdî ji bo benda hilbijartinê ya ji %10an derbas bike, biryar da ku bi namzedên serbixwe beşdarî hilbijartinan bibe. Vê yekê encamên erênî dan û hişt ku tevgera siyasî ya kurdan 35 parlamenteran bişîne parlamentoya Tirkiyê ku ji 550 parlamenterî pêk tê.

Wexta ku Komîsyona Jêr a Meclisê dest bi xebata xwe kir, serokatiya AKPê, cemaeta Gulen, medyaya alîgirê AKPê û çend rewşenbîrên lîberal ên girêdayî wê, biserketibûn ku çîrokeke li ser dîroka komarê ya ku li dijî gelek tiştên dîroka fermî derdiket, bipêş bixin û biweşînin. Bi gotineke sade, ev vegotina alternatîf li dijî wê fikrê derket ku artêş û dadgerî wekî parêzvanên xwebexş û siyasî yên bêalî yên komarê û nirxên wê, ango neteweperestiya sivîl û laîsîzmê radiwestin. Di şûna wê de, hate angaştkirin, ku di jêr tifaqa serweriya bilind ya leşkerî û dadgehên bilind de, hikûmetên sivîl yên ku bi hilbijaritnê hatine, bi awayekî perîyodîk bi derbe û destwerdanên wekî derbe-

yan ji kar tên bi dûr xistin û erkên wan ji dest wan tên girtin û Tirkiye di jêr pergala wesayeta [*vesayet*] burokratîk de êşê dikşîne. Wekî ku di beşa berî niha de bi berfirehî hatibû nîqaşkirin wan ji bo serweriyê bidest bixin gefa derbeyê bikardianîn. Wekî din, vegotina alternatîf angaşt dikir ku ev hevalbendî ji hêla îdeolojiya hevpar ve ango Kemalîzmê (navê xwe ji damezrînerê komarê Mustafa Kemal Atatürk wergirtiye) ve tê birêvebirin ku giraniya wê li ser laîkparêziya milîtan û neteweperestiya tirkan e. Herweha berpirsiyarê bidûrxistina fermî ya Misilmanên muhafezakar ji hikûmetê û bi dûrxistina kurdan ya ji pergala siyasî ye, ku di encamê vê yekê de pevçûnên tund û binpêkirinên mafên mirovan li rojhilat û başûrê rojhilatê welat pêk tên ku bi piraniyan niştecihê wan herêman kurd in. Ji ber vê yekê AKP'ê bi saya têkoşîna xwe ya li dijî Kemalîzmê xwe wekî aktorekî demokratîkbûyîn, sivîlbûn û çareseriya pevçûnan nîşan da.

Bi rastî jî, wekî ku di beşa 3em de hatibû ravekirin, komîsyon yekser piştî pêla herî mezin a dadgehkirinên li dijî artêş û hevalbendên wê ya di dîroka nêz de hate ava kirin. Ji sala 2007an pê ve, bi sedan personelên leşkerî yên çalak û teqawîtbûyî û hevalbendên wan ên sivîl bi tawanên plankirina derbeyên li dijî hikûmeta sivîl re rû bi rû man. Binpêkirinên mafên mirovan di van peyketinan de ne navendî bûn, lê medyaya alîgirê hikûmetê, hin çîrokên derbarê bersûcan de belavkirin ku rola wan ya di binpêkirinên mafên mirovan yên li herêmên kurdan de hebû aşkere dikirin û piştî demeke kurt, hin kesên ku dihat angaştkirin ku kirde ne, bi taybetî jî yên ku bi endambûna JITEMê ya girêdayî cendirmeyan dihatin tawanbar kirin hatin girtin û darizandin.

## Avakirin û xebitîna komîsyonê

Berevajî komîsyonên din ên ku di vê raporê de hatine lêkolînkirin, ku komîsyonên lêkolînê yên meclîsê bûn û ji bo armancên taybet hatibûn damezrandin, ev lijneya ku di 13ê Cotmeha 2011an de hat damezrandin, wek komîsyona jêr a Komîsyona Mafên Mirovan a meclisê ya ku di sala 1990an de wek şaxeke daîmî hat avakirin, xebitî. Endamên wê yên AKP'ê piraniya komîsyonê pêkdianin, lê endamên ji partiyên din jî tê de beşdar bûn. Endamên wê ji van kesan pêk dihatin; Naci Bostanci (AKP-Serokê Komîsyonê), Yalçin Akdogan (AKP), Oya Eronat (AKP), Mehmet Metiner (AKP), Hüseyin Aygun (CHP), Yusuf Halaçoğlu (MHP), Ertuğrul Kurkçu (BDP).

Lîsteya endaman potansiyela nakokiyên navxweyî yên giring nîşan dide: Bostanci beriya ku tev li AKP bibe wekî akademîsyenekî neteweperestê tirk dihate naskirin. Eronata ku di sala 2008an de kurekî xwe di êrîşeke PKKê de ji dest dabû, piştî ku parlamenteriya Hatip Dicleyê BDPyî ji hêla Desteya Bilind ya Hilbijartinê ve hate betalkirin, wekî parlamenter di meclîsê de cihê wî wergirtibû. Halaçoğluyê ku netewperestekî pir rijd yê dîroknas e, bi redkirina bi awayekî rijd ya Komkujiya Ermenan û

spekulasyonên, derbarê eslê elewî, kurd, ermen û tirkan de dihate nasîn. Metiner, berî ku tevgera siyasî ya kurd red bike û beşdarî AKPê bibe, salên dirêj di navbera tevgera siyasî ya kurd de mabû. Bi gotineke din, komîsyoneke ku li hev bike, ji serî de ne pêkan bû. Li gel vê yekê jî, li gel rehên ku tu hêvî nedida mirovan jî, komîsyonê ji aliyên cur be cur yêncivakê agahî berhev kirin.

Xuya ye ku komîsyonê li ser xwezaya lêkolîna xwe sînor danîne. Di lîsteya rêxistinên terorê de PKK, komên din ên bi eslê xwe Marksîst-Lenînîst yên wekî Artêşa Rizgariya Karker û Gundiyên Tirkiyeyê *[Türkiye İşçi ve Köylü Kurtuluş Ordusu, TİKKO],* Eniya Partiya Rizgariya Gel a Şoreşger *[Devrimci Halk Kurtuluş Partisi - Cephesi, DHKP-C]* û komên îslamî yên mîna El Kaide û Hizbullah (divê bi Hizbullah a Lubnanê re neyê têkelhev kirin) hene. Her çiqasî behsa van rêxistinên din bê kirin jî, rapora dawîn hema hema bi tevahî li ser PKKê ye.

Rapora dawîn êrîşkariyê, terorê, terorîzmê,tundiyê û anarşîyê pênase dike û beşeke ji beşa ewil ji bo kitekitên ku psîkolog û zanyarên civakî li ser van têgehan ("Saldırganlık, Şiddet, Terör, Anarşi ve Terörizm Kavramları") gotine vediqetîne. Li gel pûtepêdana li ser pênaseyan jî, komîsyon cudahiyê naxe navbera kiryarên terorîstî û kiryarên tundûtûjiyê yên ku armanca wan ne derxistina tirs û xofê û terorîzma di nav sivîlan de ye; hemû tundiya ku ji aliyê aktorên derveyî dewletê ve tên kirin weke terorîzmê tên pênasekirin. Bi heman awayî, di nava nivîsê de tu îşareteke ku wezîfedarên dewletê û rêxistinên paramîlîter dikarin kiryarên terorê bikin tuneye. Bi gotineke din, li gor komîsyonê terorîzm, hemû kiryarên tundûtûjiya siyasî yên ku ji aliyê aktorên derveyî dewletê ve tên kirine.

Komîsyonê hejmara kuştiyan ji polîs û leşkeran û ji du rêxistinên mafên mirovan, yên bi navên Komeleya Mafên Mirovan *[İnsan Hakları Derneği]* û Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê *[Türkiye İnsan Hakları Vakfı]* berhev kirin. Ji bo verastkirina hejmaran vekolîneke cuda nekir. Komîsyonê ji bilî berhevkirina jimareyan, bi 54 kesên ku di nav wan de rojnamevan, parêzvanên mafên mirovan, mexdûr, xizmên windayan û siyasetmedar jî hebûn, agahî berhev kirin.[26] Her wiha komîsyon di nava 8 rojan de li 8 bajaran geriya ku 4 ji van bajaran li başûrrojhilat û 4 ji wan jî li rojava bûn. ("Alt Komisyonun Yerinde Yaptığı İncelemeler") Rapora dawîn pêvajoya hilbijartina qadên ji bo hevpeyivînan rewa nake. Ew bi tenê "profîla terorê" ya her bajarî vedibêje û lîsteya kesên ku li wir bi wan re hevpeyvîn hatine kirin derdixe holê. Dikare bê gotin ku endaman bi hevpeyvînên bi kesên ji aliyên cihê yên pevçûnên tund û ji deverên cuda yên

[26] "Meclis İnceleme Komisyonu Raporu- 2013: Kayıplar Aydınlatılmalı," *Bianet*, 30.08.2013; herweha binêre: https://bianet.org/kurdi/insan-haklari/200332-meclis-inceleme-komisyonu-raporu-2013-kayiplar-aydinlatilmali

welêt re, dixwestin toreke berfireh ava bikin.

## Rapora Dawîn

Rapora dawîn ji heşt beşan pêk tê: Çarçoveya têgînî û yasayî ya lêkolîna mafên mirovan û terorê ("İnsan Hakları ve Terör Konusunda Kavramsal ve Hukuksal Çerçeve"), binyat û profîla rêxistinên terorê ("Terör Örgütlerinin Yapısı ve Profilleri"), dîroka terorê ya 30 salan û daneyên li ser binpêkirinên mafê jiyanê yên diencama terorê de ("Terörün 30 Yıllık Geçmişi ve Neden Olduğu Yaşam Hakki İhlalleri Verileri"), lêkolînên ku Komîsyona Jêr li cihê bûyeran kirine ("Alt Komisyonun Yerinde Yaptığı İncelemeler" ), tesbît û nirxandinên di derbarê kêşeya terorê de ("Terör Sorununa İlişkin Tespit ve Değerlendirmeler"), rengên rastîn yê PKKya rêxistina terorê ("Terör Örgütü 'PKK'nın Gerçek Yüzü"), travmayên civakê, malbatê û kesan ku teror pêktîne ("Terörün Yarattığı Toplumsal, Aile ve Kişi Üzerindeki Travmalar"), û pêşniyarên ji bo çareseriyê ("Çözüm ve Öneriler").

Rapora dawîn ya komîsyonê ya derbarê binpêkirinên mafê jiyanê de, hejmara miriyên heta sala 2011an bi berfirehî nîşan dide û tesbît dike ku bi giştî 7918 endamên hêzên ewlekariya dewletê, 22101 serhildêr û 5557 sivîl ji ber terorê jiyana xwe ji dest dane. ("Terör Nedeniyle Yaşanan Toplam Can Kaybı"). Hejmara 35 hezarî ku carinanlê zêdekirin jî pêktên an tê ji bo hesabekî rastîn tê gotin, di medyaya Tirkiyê de ji bo ku behsa hejmara kuştiyên terorê bike bi awayekî berfireh tê bikaranîn. Li gel vê yekê di raporê de hat diyarkirin ku 386.360 kes bi darê zorê ji malên xwe hatine derxistin.

Her çend rapora dawîn ji bo bibîrxistina mijara xwe bêjeya giştî ya "terorîzm"ê bi kar anîbe jî, diyar e ku lêkolîna wê hema bêje bi tevahî li ser PKKê ye. Aktorên din ên tundûtûjî yên derveyî dewletê tenê di derbasbûnê de têne binav kirin: Bi giştî çar caran behsa TÎKKO, çar  caran behsa DHKP-C, çar caran behsa El Kaide û çardeh caran behsa Hizbullahê tê kirin. Beşên V, VI û VIIIê di çarçoveya pirsgirêka Kurd de bi zelalî behsa tundî û terorê dikin; Bi rastî, Beşa VIê bi navê "Rengên Rast ê Rêxistina Terorê PKK" ("Terör Örgütü 'PKK'nın Gerçek Yüzü'"] ye ("True Face" Di wergera edebî de tê wateya Rûyên Rast...). Di raporê de her wiha derbarê pratîkên leşker girtina PKKê de jî agahî hene: piraniya wan ciwanên betal xuya dikin, û di rapor destnîşan dike ku îhtîmale ji %40ê wan biçûk bin ("Çocuk Teröristler") – ev reqema ku paşê di medyayê de bi berfirehî hat bikaranîn, li ser lêkolîneke yekane ya Nihat Ali Ozcan ("PKK Terör Örgütü Üyeleri Araştırması, Şubat 2012") hatiye avakirin û ji aliyê xebatên komîsyonê yan jî lêkolîneke din ve nehatiye piştrastkirin.

Beşeke mezin ya raporê ji şermezarkirina PKKê re hatiye veqetandin ji bo ku PKKê serhildan daye destpêkirin, binpêkirinên mafên mirovan dike, mirovên bêsûc ên ku haya wan ji binyata rastîn ya rêxistinê tuneye digre leşkeriyê, çalakiyên xwe bi rêyên derqanûnî fînanse dike û ji bo ku dest ji çekan naberde. Hin beş hene, bi gelemperî bi ji neqilkirinên de devkî hatine nivîsandin ku kesên hevpeyvîn bi wan re hatine kirin, hêzên ewlekariya dewletê ji ber binpêkirinên mafên mirovan, bi taybetî valakirina gundan ya bi darê zorê û kuştinên bê daraz şermezar dikin. Ji ber vê yekê, li gel ku rapora dawîn hin binpêkirinên ji aliyê aktorên dewletê ve hatî kirin belge bike jî, bala xwe dayê ku vê yekê bi rengekî ku berpirsiyariya qanûnî, siyasî an exlaqî derxîne holê nebêje. Mînak, beşên ku mexdûran didin nasîn, ferqeke zelal nîşan didin bê tê angaşt-kirin ka ji aliyê kê ve hatine mexdûr kirin: Eger hêzên dewletê sûcdar bin, komîsyon her tim peyva “angaşt kirin” lê zêde dike, lê eger sûcdar PKK be, naxêr. Zimanekî wiha tê bikaranîn. Ev du hevpeyivînên du kesên ji parêzgeha Tunceliyê li dû hev in (r. 100):

> 6-Guler KARATAŞ (Hevsera Bulent Karataş ê ku tê angşatkirin di 27ê Îlona 2007an de ji aliyê leşkeran ve hatiye kuştin) (27 Eylül 2007’de odun toplarken askerler tarafından öldürüldüğü iddia edilen Bülent KARATAŞ’ın eşi)
> 7-Ahmet OZDEMIR (Kurê Fikri Ozdemirê ku di 12ê Îlona 1996an de li goristana bajarokê Atpazari yê bi ser parezgaha Tuncelî ve ji aliyê terorîstên PKKyî ve hatî kuştin) (12 Eylül 1996’da Tunceli Ili Atpazarı Belde mezarlığında PKK’lı teröristler tarafından öldürülen Fikri ÖZDEMİR’in oğlu)

Bi heman awayî, kesên ku di encama valakirina gundan de neçar man koç bikin, bêyî ku behskirina wan şert û mercên taybet an jî aktorên ku bi zorê ew dane koçkirin, wekî “ji ber terorê” koç kirine tên pêşkêş kirin. (wek nimûne, li pêşkêşkirina hevpeyvînên ji Sêrtê yên di rûpela 105 de binêre). Ji ber vê yekê komîsyon hildibijêre ku bûyerên kesên ku hevpeyivîn bi wan re hatine kirin wekî şîdeta dewletê binav dikin wekî nûçeyekê rapor bike, lê di heman demê de ji pejirandina berpirsiyariya dewletê jî dûr disekine û bûyeran di bin têgîna amorf a “terorê” de kom dike.

Pêşniyarên rapora dawîn yên ji bo bidawîkirina binpêkirinên mafên jiyanê, rêveberiya lîberal-demokratîk û serkutkirina serhildanê dike yek. Xwezaya piralî ya pêşniyaran ji ber bikaranîna dengên raporkirî ne: ji ber ku komîsyon dema ku nêrîn û serpêhatiyên kesên ku hevpeyvîn bi wan re hatine kirin bi kurtasî radigihîne xwe ji ber dengên ça-lak daye alî, hejmareke mezin ya pêşniyaran di beşa dawîn de cih digrin. Ji ber vê yekê, li gorî ku ji kê tê pirsîn, hem teknîkên çareseriyên pevçûnê yên ku tundiyê dihewînin û hem jî yên ku tundiyê nahewînin têne pêşniyar kirin. Li gorî vê yekê, ji dewletê tê xwestin ku hêvi û travmayên sivîlan bi rêk û pêk bi rê ve bibe, maf û azadiyên tevahiya gel berfireh bike û ji bo çareseriya bê tundûtûjî ya pevçûnan rêyekê veke (divê bê gotin

ku ev rapor di sala ewil a muzakereyên di navbera dewlet û PKKê de hate temamkirin) û bi rêya dadgeh û komîsyoneke heqîqetê rastî û edaletê peyda bike, di heman demê de kurdên sivîl û terorîstan ji hev cuda bike û bi tedbîrên li dijî serhildanê şerê terorê bike.

## Pêvajoya piştî komîsyonê

Tu nîşan û işaret tune ne ku endamên Komîsyonê di pêvajoya piştî komisyonê de xwestine dîtin û pêşniyarên xwe ji raya giştî re aşkere bikin. Wekî encam rapora dawîn ya Komîsyona Jêr bi çarçove û naveroka xwe, qet nebe di asta herî kêm de, gelek girse razî kirine. Berevajî Komîsyona Susurlukê, Komîsyona Jêr hilbijart ku ne tenê bi mexdûrên PKKê re, lê bi mexdûrên hêzên ewlekariya dewletê re jî hevpeyvînan bike. Bi heman awayî, Komîsyona Jêr daneyên ku ji hêla rêxistinên mafên mirovan ve hatî berhev kirin jî bikar anîn.

Çapemeniya sereke zêdetir li ser beşa teknîkên girtina leşkeran ya ji aliyê PKKê ve rawestiya. Di rastiyê de, lêgerîna li arşîvên medyaya dîjîtal aşkere dike ku agahdariya herî zêde ji rapora dawîn hatiye wergirtin, angaşta ku ji %40ê leşkerên PKKê biçûk in e. Wekî din, çapemeniyê bi gelemperî angaşt û pêşniyarên rapora dawîn paşguh kirine.

## Analîza Komîsyona Jêr ya Binpêkirinên Mafên Jiyanê

Di çarçoweya Komîsyonê de xuya ye ku pêşnîyarên nisbeten lîberal ên derbarê çareserkirina tundûtujiya siyasî de vegotineke dewlet-navendî vedihewînin. Rapora dawîn şîdeta dewletê ya li dijî sivîlan qebûl dike, û bang li rêyên qanûnî, sazî, aborî û perwerdeyî dike ji bo çareserkirina sedemên bingehîn ên ku ew jê re dibêjin teror.[27] Lê dîsa jî, ev nêzîkatiya hinekî zelaltir bi awayekî hevgirtî, di warê parastina gel ya ji terorîstên dirinde de tê çarçove kirin.

Rapora dawîn ya Komîsyona Jêr vegotina dewletê ya li ser şîdeta siyasî ji nûjen ve hildiberîne û di heman demê de qebûl dike ku dewletê jî binpêkirinên mafên mirovan pêkanîne. Terorîzm wekî; di pratîkê de hemû kiryarên tundûtûjiyê yên ku ji hêla aktorên derveyî dewletê ve tên kirin hatiye pênasekirin; ji ber vê yekê şîdeta dewletê wekî ihtîmalekê ji pênaseyê tê derxistin. Di bingeha terorîzmê de, kêmpêşketin û kiryarên "kêşeyî" yên saziyên dewletê hene: "Di civînên cuda yên Komisyonê de hate gotin ku hin tevgerên rayedarên dewletê, hêzên ewlehiyê û yekîneyên leşkerî yên li herêmê raya giştî bêzar kirine, bûne sedema geşedanên neyînî, û paşxaneyek civakî ya ku tê de rêxistinên terorî dikarin zêdetir milîtanan bi dest bixin, afirandine. ["Bölge-

[27] "İmha Değil, Hayatta Tutma Yaklaşımı", Bianet, 29.01. 2013; herweha binêre: https://m.bianet.org/bianet/print/143956-imha-degil-hayatta-tutma-yaklasimi

deki kamu görevlilerinin, güvenlik kuvvetlerinin ve askeri birliklerin bazı uygulamalarının da toplumu rahatsız ettiği, olumsuz gelişmelere yol açtığı ve terör örgütlerinin daha fazla militan kazanabilecekleri bir toplumsal zemin oluşturduğu görüşleri Komisyonun çeşitli toplantılarında dile getirilmiştir"] ("Terör Sorununa İlişkin Tespit ve Değerlendirmeler"). Li gorî rapora dawîn, rêxistinên terorîst bi awayekî şareza van pirsgirêkan manîpule dikin da ku milîtanan berhev bikin û çalakiyên xwe fînanse bikin.

Nakokiya bingehîn ya di rapora dawîn de ji nû ve hilberandina vegotina fermî ya di encama pêvajoyeke hevpeyivînan ya nisbeten piralî de ye. Wekî ku berê jî hatibû gotin, hinek ji wan kesên ku hevpeyvîn bi wan re hatine kirin çalakvanên mafên mirovan û mexdûrên şîdeta dewletê ne. Ozturk Turkdoganê, hevserokê Komeleya Mafên Mirovan û yek ji kesên ku Komîsyona Jêr û Komîsyona Pêvajoya Aşitiyê pê re hevpeyvîn kiribûn, destnîşan dike ku têkiliya Komeleyê bi Komîsyona Lêkolîna Mafên Mirovan a daîmî ya Meclisê re [Meclis İnsan Hakları İnceleme Komisyonu] vedigere salên destpêkê yên 1990an ku ew komîsyon wan salan hatibû avakirin. Bi vî hawî dema ku Komîsyona Jêr hate avakirin, parlamenteran xwestin ku ji wî hîn zêdetir fêrî tiştan bibin. Ji aliyê endamên BDPyî ve bi awayekî fermî hate vexwendin.[28] Her wiha Nadire Mater a ku ji bo nivîsandina pirtûkeke ku rexneyê li nêzîkatiya dewletê ya li dijî terorê dike, bi leşkerên ku di salên 1990an de li herêma kurdan şer kirine, hevpeyvîn kirine, dibêje ku ew ji aliyê parlementerê BDPê Ertugrul Kurkçu ve hatiye vexwendin. Hem Turkdogan û hem jî Mater beşdarbûna xwe ya di pêvajoya Komîsyonê de wekî dijwarî bibîrtînin. Mater bi bîr xist ku dema wê nêrînên xwe pêşkêş dikirin rastî êrîşê devkî ya Oya Eronat û Yusuf Halaçoglu hatiye.[29] Turkdogan dide zanîn ku di komîsyoneke jêr ya ku piraniya wê ji parlamenter û pisporên netewperest pêk tê de, nêrînên wî bi berdewamî wekî "nêrînên din" hatine temsîlkirin.[30]

Parçeyên ji guhertoyên bûyeran, mexdûran û çalakvanên mafên mirovan wêneyekî pir tevlihevtir pêşkêş dike ji yê ku vegotina navendî destûrê didiyê. Wekî mînak, gelek kesên hevpeyvîn bi wan re hatine kirin, behsa zehmetiyên ku di dema di nav civakê de bi kurdî diaxifin bi wan re rû bi rû tên kirine ku di nva wan zehmetiyan de tundûtujiya fizîkî jî heye. Lê dîsa jî, pêşnîyarên rapora dawîn bêyî ku qet behsa mafên zimanî an jî kulturî bike, bi têgînên giştî banga berfirehkirina azadiyan dike. Nimûneyek din a balkêş jî di beşa pênaseyan de ye, di vê beşê de Nadire Mater derpêş dike ku bi awayekî gerdûnî li ser pênaseya têgîna terorîzmê lihevkirinek tuneye û ji ber vê yekê dema ew

[28] Hevpeyvîna bi Ozturk Turkdoğan re, Çile 25, 2022 (Zoom).

[29] Hevpeyvîna bi Nadire Mater re, Sibat 2, 2022 (Zoom).

[30] Hevpeyvîna bi Ozturk Turkdoğan re, Çile 25, 2022 (Zoom).

bi berfirehî li sermijarê diaxife, hildibijêre ku wê têgînê di çarçoweya wê de bikar neyine ("Dinlenen Kişilerin Terör, Terörizm ve Terörist Tanımına İlişkin Görüş ve Değerlendirmeleri"). Her çend nivîskarên raporê bi aşkereyî derbirînên wê ji nedîtî ve hatibin jî rapora dawîn nêrînên wê dihewînin.

Nakokiya rapora dawîn ya li ser sekinîna şideta dewletê li tu derê din ew qasî bi aşkereyî dernakeve holê. Gelek hevpeyvîn behsa valakirina gundên kurdên sivîl ya bi rêya şewitandina gundan *[köy yakma]* û bi darê zorê valakirina gundan *[köy boşaltma]* dikin. Her wiha di hevpeyvînan de zêdetirî 30 caran behsa wan sûcan tê kirin ku li ser JÎTEMê tên hesibandin. Lê dîsa jî, rapora dawîn li ser sûcdarên ferdî û saziyî yên şîdeta dewletê ya li dijî sivîlan bêdeng dimîne. Rapora dawîn, li gorî raporên komeleyên mafên mirovan, radigihîne ku 2,872 kes ji aliyê kesên nenas ve, û 1,945 kes bi înfazên bê daraz hatine kuştin ("Faili Meçhuller ve Kayıplara İlişkin Veriler", herweha binêre: Goral 2021, 803), lê behsa kesên berpirsîyarê van bûyeran nake. Berevajî Komîsyona Susurlukê ya sala 1997an, ku bi awayekî bêyî cihê nîqaşê peyitandibû ku sûcên ku li ser JITEMê tên hesibandin pêkhatine, Komîsyona Jêr ya Binpêkirinên Mafên Jiyanê, ji bo bi tena serê xwe negihe encamekê, tenê navê JITEMê hildidê û derbirînên nûçeyî bikartîne. Her çiqas di vegotinê de bi awayekî diyar pergala cerdevaniyê cih bigire jî, berpirsyariya potansiyel ya cerdevanan a di binpêkirina mafên mirovan de nayê nîqaşkirin. Di rapora dawîn de têgîna *paramîlîter* cih nagire. Bi heman awayî kesên wek Abdullah Çatli, Mehmet Agar, Korkut Eken û hwd ku di rapora dawîn ya Komîsyona Susurlukê de cih girtibûn (her çend ji binpêkirinên mafên mirovan zêdetir ji ber sûcên rêxistînî be jî) di rapora dawîn ya Komîsyona Jêr de bi tevahî tune ne.

Ewra peyvan ya rapora dawîn (Şiklê 4.1) zêdebûna vegotina terorê nîşan dide, ji ber ku peyvên "teror" [*terör*], "rêxistina terorê" [*terör örgüt*][31], "şehîd" [*şehit*] û "pkk" peyvên ji aliyê hejmara xwe ve herî zêde ne. Têgînên bi wateya hiqûqa cezayî yên wekî "îfade" [ifade] û "girtename" [tutanak] jî di raporê de derdikevin pêş. Li gel van, têgînên bi mafên mirovan re eleqedar yên wekî "kuştina kiryar nediyar" [*fail meçhul*], "binpêkirin" [*ihlal*], "bersûc" [*fail*] û "mexdûr" [*mağdur*] jî herçend kêm bin jî hene. Baldariya li ser fikarên mafên mirovan bi hejmara mijarên ku ji hêla Komîsyona Jêr ve behsa wan hatiye kirin jî tê piştrast kirin (Şiklê 4.2). Tiştê balkêş ev e ku raporeke dawîn ya ku ew qasî girîngiyê dide terorîzm û çalakiyên serkutkirina serhildanê, derbarê şerê xeyrî nizamî û têkiliyên dewletê yên bi sûc re tu tiştekî nabêje. Komîsyona Susurlukê û Komîsyona Jêr li ser heman dem û herêma ku di salên 1990an de gelek binpêkirinên mafên mirovan lê qewimîbûn, yanî li ser herêmên kurdan hûr bibin jî, mijarên ku wan bala xwe dane ser hema bêje neynika hev in. Bulut sözcüğü, sözcükleri kök biçiminde

[31] Ewra peyvan, peyven kok hildigre, lewra di peyvên tirkî de qertaf tune ne.


kullanır; bu yüzden Türkçe ekleri yoktur.

Wekî encam, Komîsyona Jêr, têkariyeke sînordar di raporên fermî yên li ser binpêkirinên mafên mirovan li Tirkiyê kiriye. Li raporê, zêdekirina daneyên rêxistinên mafên mirovan û hilbijartina komîsyonê ku bi xizmên mîlîtanên PKKê yên di şer de hatine kuştin, xizmên sivîlên wenda û parêzvanên mafên mirovan re heypeyvîn kirin, di dîroka komîsyonên fermî de hîn jî ezmûneke bêhempa ye. Lê belê xebatên komîsyonê jî kêşeyên cidî dihewînin. Berî her tiştî, komîsyonê tu hewil nedaye ku daneyên xwe yên li ser qurbaniyan an şêwazên girtina kesan jibo leşkeriyê ji aliyê PKKê ve berhev bike an jî rastbûna encamên ku hatine destnîşan kirin ducar kontrol bike, bi tevahî xwe spartiye vekolînên din, û. Bi vê ve girêdayî, stratejiya komîsyonê ya bikaranîna axaftinên ragihandinê ji bo perspektîfên rexneyî yên li ser şîdeta dewletê û di heman demê de paşguhkirina wan perspektîfan di diyarkirina têgeh, rêbaz û dîtinên wê de, bûye sedem ku raporeke tevlihev derkeve holê ku ne rola  Dewleta Tirkiyê di binpêkirinên mafên mirovan de înkar dike dike ne jî tam qebûl dike.

**Şekil 4.1: Ewra peyvan ya rapora dawîn**




**Şekil 4.2: Mijarên ku di rapora dawîn de behsa wan hatine kiri**



BEŞA 5.

# KOMÎSYONA PÊVAJOYA AŞTÎYÊ

# Komîsyona Pêvajoya Aştiyê

## Danasîn

Şerê çekdarî yê navxweyî yê di navbera dewleta Tirk û PKK'ê de ku ji sala 1984an û vir ve berdewam dike, wekî ku Komîsyona Jêr ya Binpêkirinên Mafên Mirovan û çavkaniyên din belgekirine, li pey xwe tomareke tirsnak a binpêkirinên mafên mirovan hiştiye û hîn jî dihêle. Di nava vê demê de, bi taybetî di sala 1993an de û piştre jî di nîvê salên 2000an de, di navbera her du aliyan de gelek caran diyalog hatin destpêkirin. Lê ji bo hevdîtinên aştiyê cara ewil ji raya giştî re werin ragihandin, diviya em li hêviya dawiya sala 2012an de bimana ku serokwezîrê wê demê Erdogan ragihandin ku Dezgeha Îstixbarata Neteweyî bi Serokê girtî yê PKKê Abdullah Ocalan re hevdîtin pêk anîne. Îhtîmala bidawîkirina pevçûnan bi rêyên ku tundûtûjiyê nahewînin li Tirkiyê mijareke tabûyî bû û niha jî ev rewş her wisa berdewam e. Ji ber vê yekê dema kurt a di navbera Kanûna 2012a û Tîrmeha 2015an de wekî derfeteke kêmpeyda derdikeve pêş ku parlamento û saziyên din ên dewletê amade bûn ku der barê mijarê de fêrî hin tiştan bibin û li ser rêbazên çareseriya pevçûnan kû tundûtûjiyê nahewînin nîqaşan bikin.

## Peywend

Piştî Erdoğan ragihand ku bi Ocalan re hevdîtinan dest pê kirine, tundûtujiya li herêmên kurdan hema bêje yekser rawestiya. Artêşê tu carî agirbesteke fermî îlan nekir, lê operasyonên wê yên li herêmê hema bêje rawestiyan. PKKê di Adara 2013an de agirbesta yekalî ragihand. Bi vî rengî ji dema di navbera Kanûna 2012an û Tîrmeha 2015an de ji aliyê dewlet û PKKê ve bi aştiyane derbas bû. Di destpêkê de, ev yek ji bo hukûmeta AKPê wekî serkeftineke girîng ya têkiliyên bi gel re hate dîtin, ku berdevkên wê bi caran vegotineke dîrokî ya bijartî pêşkêş kirin û bal kişandin ser berevajiya tundiya iktîdarên berê û aştiya desthilatdariya wan.

Tevî ku tundûtûjî di nav piraniya raya giştî de - bi taybetî jî kurdên ku ji sala 1984an û vir ve jê gelek zerar dîtibûn populer be jî, ji aliyên cihê ve, li hember pêvajoya aşitiyê bêbaweriyek mezin hebû. Wekî ku lêkolînên raya giştî yên berî û di dema danûstandinên aştiyê de jî nîşan didin, piraniya welatiyên ne kurd, ku di nav de binkeya piştevaniya hikûmetê jî hebû, piştgirî nedane fikrê ku ji PKKê re tawzîên siyasî bên dayin.[32] Bi taybetî ultranetewperest ev pêvajo wekî xiyanetê bi nav kirin.

[32] Ji bo nimûne binêrin: KONDA Araştırma ve Danışmanlık. 2011. *Kürt Sorununda Algılar ve Beklentiler* . İstanbul: İletişim.

Tevgera siyasî ya kurd jî guman dikir ku Erdogan û tevahiya serkirdayetiya AKPê ji bo danûstandinan bidin berdewam kirin gavên pêwîst yên wekî derxistina nexşerêyekê û tayînkirina navbeynkaran neavêje. Tişta ku atmosfera bêbaweriyê zêdetir kir ew bû ku, di dema berî danûstandinan û di dema danûstandinan de bi awayekî bilez ya hilweşîna demokrasiyê û serweriya hiqûqê bû. Balafirên leşkerî di Kanûna 2011an de bajarokê li ser sînor yê bi navê Robozik 34 sivîlên Kurd qetil kiribûn û tu şaxên hikûmetê derbarê vî sûcî de lêkolîn nekirin. Cemaeta Gulen bi piştgiriya serokatiya AKPê di dadgehên bilind û rêvebiriya dadweriyê de si serweriya xwe kiribû. Hem CHPê û hem jî BDPê di salên 2011 û 2012an de li hember binpêkirinên prosedurê yên di peyketinên dozên siyasî de hişyarî dabûn - bê encam ma. Dema sal bû 2013, Erdogan êdî nediveşart ku ew dixwaze partiya xwe bi tevahî kontrol bike û pergala siyasî ya welêt ji nû ve dîzayn bike da ku xwe bike serokekî xwedî hêzeke awarte.

Komîsyonên meclisê û yên derveyî meclisê, beşeke girîng a kampanyayên têkiliyên bi gel re yên Hikûmeta AKPê pêkdianîn, ji bo ku raya giştî ya potansiyel û bi guman qanî bikin. Di vê çarçoveyê de Komîsyona Lêkolînê ya Meclîsê ya Lêkolîna Rêyên Aştiya Civakî û Nirxandina Pêvajoya Aştiyê [*Toplumsal Barış Yollarının Araştırılması Ve Çözüm Sürecinin Değerlendirilmesi Amacıyla Kurulan Meclis Araştırması Komisyonu*] di Nîsana 2013'an de hat avakirin.

## Avakirina komîsyonê û xebitîna wê

AKPê, CHPê û BDPê her yekê ji wan ji bo avakirina komîsyonekê pêşnûma pêşkêş kirin. Lijneya ku derket holê ji 11 kesan pêk hat: Naci Bostanci (AKP, serok), Abdulkerim Gok (AKP), Idris Şahin (AKP), Fatoş Gurkan (AKP), Mehmet Metiner (AKP), Ziver Ozdemir (AKP), Halil Urun (AKP) Yalçin Akdogan (AKP), Fatih Çiftci (AKP), Mehmet Hamzaogullari (AKP) û Husamettin Zenderlioglu (BDP) – 10 endam ji AKPê û yek jî ji BDPê. CHPê û MHPê tu parlementer neşandin komîsyonê. Berdevkên CHPê, tevî ku beriya niha jî pêşnûmanameyek pêşkêş kiribûn jî, angaşt kiribûn ku diviyabû komîsyon, ne di dema hevdîtinên bi PKKê re, lê beriya hevdîtinên bi PKKê re were ava kirin û ew naxwazin ku partiya wan di xebatên Hikûmeta AKPê yên têkiliyên bi gel re cih bigre. MHP bi awayekî kategorîk li dijî danûstandinan û komîsyonê bû derket.

Ev hewldana parlementoyê ji bo bala raya giştî bikşîne diviya bû ku bi komîsyoneke din re hevrikiyê bike: li ser bang û israra hukûmetê, rewşenbîr û navdaran komîsyoneke civaka sivîl, ya bi navê "Lijneya Mirovên Aqilmend" [Akil İnsanlar Heyeti] tê naskirin, ku dixwest aşitiyê populer bike, damezrandin. Ew komîsyon jî di bihar û havîna 2013an de civiya. Dema mirov li wê demê binêre, xuya ye ku ev komîteya derveyî parlemantoyê ya navdaran neçar hatiye hiştin ku di serî de wekî dûblorekî

danasînê kar bike. Ozturk Turkdoganê, ku di Lijneya Mirovên Aqilmend de cih girtibû û Komîsyona Pêvajoya Aştiyê jî pê re heypeyvîn kiribû, dibêje ku raporên herêmê [*bölge raporları*] yên Lijneyê belgeyên agahdar û bikêrhatî ne, lê heta niha bi raya giştî re nehatine parvekirin.[33] Ya rastî, heya roja îro, tu nîşaneyek tuneye ku endamên hukûmetê rapora dawîn ya Lijneyê xwendine an jî li ber çavan girtine.

Erka Komîsyona Pêvajoya Aştiyê cihê nîqaşê bû ji ber ku Ocalan û endamên tevgera siyasî ya Kurd ji komîsyonê xwestin ku ji bo danûstandinên aştiyê çarçoveyekê diyar bike. Li gel vê yekê jî, ji ber ku hemû danûstendin di jêr kontrola tam ya sazîya qanûndanêr de bûn, dawiya dawî komîsyonê hewil neda ku vê yekê bike. Di şûna wê de, komîsyonê karê xwe wekî lêkolîna tevdîrên potansiyel yên çareseriya pevçûnan dît da ku pêşniyaran bike (Sunca 2016, 26).

Komîsyonê di 8ê Gulana 2013an de dest bi xebatên xwe kir. Bi tevahî çar mehan xebitî – di eslê xwe de sê mehên xebatê yên ku dabûn pêş xwe û meheke ku li van sêmehan hate zêde kirin. Komîsyon di betlaneya havînê de jî xebatên xwe domandin. Di parlementoyê de 43 hevpeyvîn kirin. Fikra ku di metodolojiya hevpeyivînan de hevsengiyekê çêbike, balê dikişîne: Komîsyonê endamê berê yê PKK'ê Ali Oruç û her wiha Murat Caner ê xazîyê leşkeriyê ku di pevçûneke bi PKKê re de birîndar bûbû vexwendibûn. Herweha, komîsyon di dema xwe ya kurt de li 8 bajarên welêt geriya û bi 129 kesan re hevpeyvîn kirin. Ne diyare bê endamên komîsyonê qadên hevpeyvîn û kesên hevpeyvînê li gor kîjan pîvangan bijartine. Komîsyonê rapora xwe ya dawîn di Mijdara 2013an de pêşkêşî desteya Serokatiya Parlamentoyê kir û di 2ê Berfenbara 2013an de bi civîneke çapemeniyê ji raya giştî re ragihand.

Asta beşdariya civaka sivîl di dîroka komîsyonên parlamentoyê de bi awayekî bê nîqaş, bê hempa ye. Ozgur Sevgi Goral a, ku li ser navê Hafiza Merkezi[34] beşdarî civînê bibû, ragihand ku BDPê rêxistinên wekî Komeleya Mafên Koçberan û Ahenga Civakî [*Göçmen Hakları ve Sosyal Uyum Derneğ*i, Göç-Der], xizmên girtiyan [*tutuklu yakınları*], û Dayikên Aştiyê [Barış Anneleri] ku bi tevgera siyasî ya Kurd re girêdanên wan ên xurt hene vexwendin. Herweha "Koma BDPê ne tenê derdora tevgera xwe, derdorên ku ji aliyê rêxistinî ve bi tevgera azadiya Kurd ve negirêdayîbûn jî vexwendibûn. ["BDP grubu sadece kendi hareketinin hinterland'ını değil örgütsel olarak Kürt özgürlük hareketine bağlı olmayan kurulları da oraya taşıdı."][35]

[33] Hevpeyvîna bi Ozturk Turkdoğan re, Çile 25, 2022 (Zoom).

[34] "Hafıza Merkezi Çözüm Komisyonu'na Sunuş Yaptı," *Hafıza Merkezi*, 11.07.2013; herweha binêre: https://hakikatadalethafiza.org/hafiza-merkezi-cozum-komisyonuna-sunus-yapti/

[35] Hevpeyvîna bi Ozgur Sevgi Goral re, Çile 26, 2022 (Zoom).

Komîsyonê, ji bo ku pevçûnên tund û potansiyela aştiyê fêhm bike, ji bilî hevpeyvînan, lîteratura duyemîn jî bikar anî. Rapora wê ya dawîn bîbliyografyayeke xebatên akademîk ên li ser çareseriya nakokiyên li Tirkiyeyê û derveyî Tirkiyeyê dihewîne. Her çend bi qasî Komîsyona Derbeyê ne berfireh be jî, hewldana Komîsyona Pêvajoya Aştiyê ya ji bo sudwergirtina ji lîteratûra akademîk, di nav raporên din yên fermî de derdikeve pêş.

## Rapora dawîn

Rapora dawîn ji 12 beşan pêk tê: Avabûn û xebatên komîsyonê ("Komisyonun Kuruluşu ve Çalışmaları"), nêzîkatiyên derbarê mijarê û çareseriya wê ya heta roja me ("Günümüze Kadar Soruna ve Çözüme İlişkin Yaklaşımlar"), xebat û raporên ku hatine kirin û nivîsîn ("Yapılan Çalışmalar ve Yazılan Raporlar"), mînakên navneteweyî yên li ser teror, tundî û çareseriya pevçûnan ("Terör - Şiddet - Çatışma Çözümü ve Uluslararası Örnekler"), ji hêla hiqûq navneteweyî û têkiliyên navneteweyî ve nêrîna li kêşe û çarêseriyê ("Soruna ve Çözüme Uluslararası Hukuk ve Uluslararası İlişkiler Açısından Bakış"), faktorên psîkolojîk yên şexsî û civakî ku karîgeriyê li kêşeyê û çareseriya wê de dikin ("Soruna ve Çözüme Etki Eden Kişisel ve Toplumsal Psikolojik Unsurlar"), nêrîneke civakî û kulturî li kêşe û çareseriyê ("Soruna ve Çözüme Sosyolojik ve Kültürel Bakış"), nêrîneke ji perspektîfa dîrokî li kêşe û çareseriyê ("Soruna ve Çözüme Tarihi Perspektiften Bakış"), xebatên Lijneya Mirovên Aqilmend ("Akil İnsanlar Heyeti Çalışmaları"), rapora komîsyona jêr ya ji bo lêkolînkirina saziyên cezayê hatiye avakirin ("Ceza İnfaz Kurumlarında İnceleme Yapmak Amacıyla Kurulan Alt Komisyon Raporu"), di pêvajoya çareseriyê de qadên giring ("Çözüm Sürecinde Önemli Alanlar"), guherîn û veguhertinên di navbera salên 2002-2013an de ("2002-2013 Döneminde Yaşanan Değişim ve Dönüşüm"), û nirxandin giştî û encam ("Genel Değerlendirme ve Sonuç").

Tevî ku Komîsyona Pêvajoya Aştiyê yekser piştî Komîsyona Jêr a Binpêkirinên Mafên Jiyanê, dest bi kar kiribe jî û di her du komisyonan de sê endamên AKP'ê (serok jî di nav de) wezîfedar bûn jî, dengê wê bi awayekî teqez lîberaltir e. Vegotina sereke ya raporê ev e ku pevçûnên tund di encama pirsgirêkên civakî, siyasî, aborî û çandî yên tekêlhev û hevgirtî de derketine. Di beşa destpêkê ya serokê komîsyonê de behsa rêyeke nû ya hizirkirinê [*akıl etme*] û çareserkirina pirsgirêkan [*sorun* çöz*me*] ya bi rêya pêvajoya aştiyê tê kirin. Fikrê ku sedemên bingehîn ên pevçûnên tund ji sedem û bandorên lezgîn ên tundûtûjiyê kûrtirin, di seranserê rapora dawîn de tê dîtin.

Bi heman awayî, rexneya rapora da wîn, ji PKKê bêtir li "dijberên pêvajoya aştiyê" [*sürece karşı olanlar*] ye ("Komisyon Başkanının Sunuşu", 1). Di dema ku Komîsyona Jêr

bi awayê; rêxistineke tundrewiyê ya fersendkar ku ji kêşê û safîtiya sivîlên kurd sûdê werdigre behsa PKK dikir, Komîsyona Pêvajoya Aştiyê wekî sikeneyeke di encama li ser hûrnebûna pirsgirêka kurd de behsa serhildanê dike. Ev pasaja tevlihev ya di beşa duyemîn de vê xalê diyar dike:

> Lê belê wekî rastiyeke ku tê zanîn di têkiliya sedem-encamê de û ji wê zêdetir jî di encama geşedanên dawîn de, mesele û meseleya terorê, meseleya terorê û meseleya PKKê, meseleya bingehîn û meseleya PKKê têkelhev bûne. Nêzîkatiyên bi giştî û sivik ên li ser meseleyê, bûne sedema ji hev cihêbûna têgihiştinan jî. Dema PKK weke sedema vê bûyerê dihat dîtin, texmîn dihatin kirin ku PKK bidawî bibe dê pirsgirêk jî çareser bibe.
>
> [Fakat bilinen bir gerçek olarak neden - sonuç ilişkisi içerisinde ve daha da çok yaşanan sıcak gelişmeler neticesinde mesele ile terör meselesi, terör meselesi ile PKK meselesi, esas mesele ile PKK meselesi birbirine karışmış durumdadır. Meseleye bakıştaki toptancı ve kolaycı yaklaşımlar, algıların da farklılaşmasına yol açmıştır. PKK, yaşananların nedeni olarak görülürken, PKK'nın bitirilmesiyle sorunun da çözüleceği sanılmıştır.] (p. 41)

Di berdewamiya wê beşê de nerîneke berfireh li ser hêla siyasî ya Tirkiyê digire da ku nêrînên partiyên siyasî, rêxistinên civaka sivîl û kesayetên siyasî yên li ser vê mijarê belge bike. Ew di navbera salên 1925 û 2010an de bi giştî 71 raporên ku mijara wan pirsgirêka kurd e an pevçûnên tund in lîste dike ku bi giştî piştgiriya 25 sernavên pêşniyarên wekî; ji naskirina zimanê kurdî di nav gel de bigire heta belavkirina erka birêveberiyê, heta reforma destûra bingehîn. Di beşê de jî pêşketina Tirkiyeyê ya li ser pêşniyarên reforman dinirxîne (r. 59-64).

Komîsyonê her weha derbarê, ferqa di navbera aştiya neyînî û erênî de, û ramana aştiya veguhêrîner ku ji bo aştiyeke mayinde pêk were, di roja me de derbasî pêş tunebûna tundûtûjiyê dibe, serî li lîteratûra cihanî ya di vî warî de da. Di raporê de ji rawestandina dijminatiyê ya ji bo demeke kurt zêdetir, referansen ku nîşan didin aştî/çareseriyeke "mayinde" [*kalıcı*] heye derbas dibin. Rapor di binbêşa duyemîn ya beşa sêyemîn de behsa hewldanên çareserkirina pevçûnên li Kolombiya, Endonezya, Îspanya, Îrlandaya Bakur û Afrîkaya Başûr (Dilek 2019, 13) dike. Paşxaneya dîrokî, serdema tundûtûjiyê û çareserkirina pevçûnan ya bê tundûtûjî bi referansên lîteratura akademîk a li ser wê mijarê di her rewşê de têne ravekirin. Di dawiya beşê de pasajên dirêj ên sê akademîsyenên di warê ezmûnên çareseriya pevçûnên li çaraliyê cîhanê pispor tên hesibandin, cih digrin. Sê encam derdikevin pêş: demokrasî pêkhateyeke sereke ya çareseriya pevçûnan pêk tîne; pêvajoyên aştiyê demeke dirêj digirin; û

aktorên navneteweyî girîng in (r. 119-121).

Rapora dawîn baldariya xwe ya li ser zanîna gerdûnî bi analîzên dirêj ên paşxaneya civakî-psîkolojîk, sosyolojîk, çandî û dîrokî ya pevçûnên tund ên li Tirkiyeyê re dighîne hev. (beşên 5, 6, û 7an). Bi taybetî di beşên 5 û 7an de pasajên dirêj hene ku ji wan hevpeyvînan hatine wergirtin ku bi akademîsyenan re û her wiha bi gelek parlementerên AKPê û BDPê re hatinê kirin. Li gel xetereya hêsankirina perspektîfên cûrbecûr ku di van beşan de hatine gotin jî, vegotina navendî ya ku derdikeve holê dikare wiha were kurt kirin: serhildana PKK'ê û şîdeta pê re, diyardeyên pirsgirêkên kûrtir in di dîroka dirêj a jiyana hevbeş a di navbera Tirk û Kurdan de, ku di sedsala nozdehan de rakêşiyên ewil destpêkirinê û di serdema komarê de (ji 1923an û pê ve) her ku çûye pisrgirêk mezintir bûye. Di van beşan de gelek ravekirinên dîrokî xuya dibin, lê du ji wan derdikevin pêş: di çarçoveya avakirina neteweya tirk a homojen a çandî de nasnekirina nasnameya kurdî û wekî çarçoweya jiyana hevbeş ji holê rabûna civaka îslamî.  Hin kesên ku hevpeyvîn bi wan re hatine kirin jî, nîqaş dikin ku, çewisandina tevgera çep a demokratîk a kurd ya di salên 1970 û 1980an de sedema wê ya bingehîne ku PKKê wekî alternatîfeke ku tundûtujiyê dihewîne derkeve holê.

Beşa çarem, danasîna çarçoveyên dadweriyê dike armanca xwe ku dibe ew ji modela dadmendiya cezakar  ya ku Tirkiyê li dijî bersûcên terorîzmê bikar tîne re bibe alternatîfek. Piştî tê angaştkirin ku pergala dadmendiya sûc ya Tirkiyeyê di çarçoveya berfirehtir ya hiqûqa mafên mirovan a neteweyî û navneteweyî de xebitiye (r. 141) ev beş heq dike ku wekî çarçoveyên alternatîf yên hiqûqa însanî ya navneteweyî, dadweriya vegerandinê û bêçekkirin, bêçekkirin û ji nû ve entegrasyonê (DDR) werê nîqaş kirin. Beşa li ser dadmendiya vegerandinê di heman demê de îhtîmala avakirina komîsyonên heqîqetê jî nîşan dide – ev mijareke ku di beşa bîstemîn a beşa dehemîn de (rûpelên 429-436) ji nû ve hatiye nirxandin. Rapora dawîn diyar dike ku ji bo lihevhatina civakê û dubarenekirina şîdeta rabirduyê, pêwîstî heye ku bi rabirdûyê re hesab bê dîtin û destnîşan dike ku divê nêzîkatiyên bi dadweriya vegerandinê, dadweriya dema têperî û hiqûqa mirovî ya navneteweyî wekî çareseriyên efsûnî neyên dîtin (rûpel 436).

Rapora dawîn, bi awayekî teqez hewl dide ku serdema AKPê ya ji sala 2002an û vir ve weke serdemeke pêşketinê nîşan bide. Yek ji beşên herî dirêj ya bi navê "Guherîn û Veguhertinên di Navbera Salên 2002-2013an de" hemû guhertinên polîtîk ên di jêr desthilatdariya AKPê de rêz dike ku tê angaştkirin van guherînan derfêta çareseriya pevçûnên tundûtûj daye.

Beşa "Nirxandin û Encama Giştî" ya rapora dawîn, pêşniyarên giştî yên ji bo aştiyê vedihewîne û di rapora ku ji 482 rûpelan pêk tê de tenê heşt rûpel in. 42 paragrafên ku vê beşê pêk tînin, nêrîna giştî ya raporê ya li ser çareseriya pevçûnan nîşan didin: ji bo aştiyeke mayînde, pêdivî bi pêvajoyeke çareseriya pevçûnan ya bi destwerdanên berfireh û demdirêj heye. Rapor hişyariyê dide ku divê pevçûn û aşitî wekî dosyayên dualî neyên dîtin; di şûna wê de, ew bang dike ku kesên ji bo aşitiyê têdikoşin wisa werin hiziirkirin ku di asteke ji pevçûnan bigire heya aşitiyê tevdigerin (Ensaroğlu et al. 2014, 31). Berevajî ku rapor behsa destwerdanên diyar yên li deverên din yên wekî komîsyonên heqîqetê û navbeynkarên navneteweyî dike, beşa dawî hûrguliyan nahewîne. Ji devla wê de, hin pêşniyarên ji rêzê yên wekî, girîngiya demokrasiyê, mafên mirovan û di nav gel de çêkirina hişmendiyeke ku tundûtûjiyê nahewîne hene. Herî dawî, ev beş hişyariyê dide ku danûstendinên pêvajoya aştiyê divê bi kêşeyên çareseriyên demdirêj an jî dema navîncî re neyên tevlihev kirin.

## Pêvajoya piştî komisyonê

BDP'ê di qonaxa radestkirina raporê de angaşt kir ku rapora dawîn bêyî ku endamên wan ên di komîsyonê de were agahdar kirin ji bo Lijneya Giştî ya Meclîsê hatiye pêşkêş kirin. Ya rastî, berdevkên partiyê angaşt kirin ku, di demeke ku tê çaverêkirin komîsyon beşdarî avakirina baweriyê ya li seranserê welat bibe, prosedûra vederker ya komîsyonê bêbaweriyê kûrtir dike.[36] Partiyê li şûna ku rapora komîsyonê erê bike, raporeke alternatîf bi raya giştî re parve kir. Bi vî hawî,  rapora dawîn ya Komîsyona Pêvajoya Aştiyê ku di destpêkê de CHP û MHP jî tê de cih negirtibûn, tenê ji aliyê AKP'ê ve hat qebûlkirin.

Endamê komîsyonê yê BDPyî Zenderlioglu, angaşt kir ku rapora fermî, daxwazên qanûneke bingehîn a nû, qanûneke nû ya hilbijartinê, rakirina qanûnên têkoşîna li dijî terorê, naskirina nasname û çanda gelê kurd, perwerdeya bi kurdî, xweseriya herêmî, avakirina komîsyona heqîqetê û pêkanîna qanûna tazmînatê ji nedîti ve hatine û di pirsgirêka kurd de tezên fermî yên  dewletê dubare kirine.[37] Rapora BDPê bi taybetî di derbarê danûstendinên aştiyê de û bi giştî jî derbarê çareseriya pirsgirêka kurd de weke rêze helwestên polîtîk tê xwendin. Ihtîmale, ezmûna vederkirina ji komîsyona lêkolînê ya meclîsê, destên parlementerên BDPyî rahetir, ku li şûna belgeyeke pêşenivîsar ku li serê hatiye li hev kirin, zêdetir dixwestin encamen ku ew dixwazin binivîsînin. Rapora alternatîf a ji 443 rûpelan pêk tê, beşeke dirêj ya li

[36] "BDP alternatif raporunu Meclis'e sundu," *Evrensel*, 29.11.2013; li vê derê dkare were dîtin: https://www.evrensel.net/haber/73023/bdp-alternatif-raporunu-meclise-sundu

[37] " Alternatif 'Çözüm Komisyonu Raporu' " T24 , 28.11.2013.

ser dîroka pirsgirêka kurd dihewîne, li dûv wê, beşên wekî; raporên berê yên fermî û nefermî yên derbarê mijarê de, ezmûnên çareserkirina nakokiyên li çaraliyê cîhanê, pirsgirêkên heyî yên hiqûqî û dadwerî, pêşniyarên ji bo reformên qanûnî û saziyî, komîsyonên heqîqetê, bîra civakî û bibîranîn, şer û aborî, zayend, û pêşniyarên destûra bingehîn tên. Di beşa destpêkê de, ji ber ku nêrîn û hesasiyetên BDPê paşguh kiriye û vegotina fermî ya dewletê ji nû vehilberandiye, komîsyona lêkolînê tê rexne kirin. Heke zelaltir were gotin, lîsteya rexneyên li komîsyona lêkolînê ku ji 22 xalan pêk tê, ji ber ku komîsyon "pirsgirêka kurd" bi awayekî zelal bi nav nake, di pêvajoya aştiyê de kiryariya PKKê û Ocalan teqdîr nake, mafên civakî wekî mafên takekesî çarçove dike, pêşniyarên pir gelemperî dike û di mijara tevdîrên têkoşîne li dij teror û terorîzmê de vegotina dewletê ya fermî dubare dike, komîsyonê sûcdar dike. Di rapora BDPê de li şûna wan pêşniyarên bi vî rengî tên kirin; bila şertên jiyanî yên Ocalan bên baş kirin, zextên hiqûqî yên li ser çalakvanên kurd yên sîyasî bên rakirin, komîsyonên heqîqetê bên ava kirin, wezareteke nû ya ji aştî û demokrasiyê berpirsiyar bê ava kirin, mafên kulturî werin naskirin, xweseriya herêmî bê naskirin, li herêmên kurdan sekinandina îneşatên nû yên qereqolên polîs û leşkeran, ji devla santralên hîdroelektrîkê ku zirarê didin xwezayê bila çavkaniyên alternatîf yên enerjiyê bên bikaranîn.[38] Wekî encam, bertekên li dijî komîsyona meclîsê, bi raporeke alternatîf bi encam bû,  ku helwesta tevgera siyasî ya kurd a derbarê pirsgirêka kurd, pevçûnên tund û pêşniyarên ji bo çareseriya wê nîşan dide.

Serokê Komîsyona Meclîsê Naci Bostanci di nav refên AKP'ê de bilind bû. Ji bo peyma komîsyonê belav bike, yekser piştî radestkirina rapora dawîn beşdarî konferansekê bû.[39] Lê belê ji wê demê û vir ve, derbarê komîsyonê de nêrînên xwe negotine. Tu nîşane tunene ku endamên din ên komîsyonê xebatek kirine ku piştî radestkirina raporê, peyama xwe bi hêztir bikin. Lê li gel vê yekê jî xuya ye ku pêvajoya aşitiyê hiştiye ku aliyên siyasî yên din jî li ser pirsa kurd nêrînên xwe aşkere bikin. Wekî ku li jor hat diyarkirin BDPê rapora xwe eşkere kir. CHPê di Nîsana 2015an de ji bo aştiyê çarçoveyeke ku ji  22 xalan pêk tê aşkere kir.[40]

Bi dawîbûna pêvajoyê ya di Tîrmeha 2015an de ew îhtîmal ji holê rakir ku rapora dawîn

---

[38] Barış ve Demokrasi Partisi, "Toplumsal Barış Yollarının Araştırılması Ve Çözüm Sürecinin Değerlendirilmesi Komisyonu Raporu", Kasım 2013, Ankara. ji vê navnîşanê dikare were dîtin: https://bianet.org/system/uploads/1/files/attachments/000/001/008/original/BDP_%C3%87%C3%B6z%C3%BCm_Komisyonu_Raporu.doc [Tirkî]

[39] "Çözüm Süreci Konferansı," *Akdeniz Bülten*, 26.11.2013; ji vê navnîşanê dikare were dîtin: http://www.akdenizbulten.com/cozum-sureci-konferansi/7769/

[40] Ji vê navnîşanê hûn dikarin xwe bighînin metnê rapora CHPê https://content.chp.org.tr/file/chp_kurt_meselesi_kitapcik.pdf

ya komîsyonê yan jî berhemeke din a pêvajoya aştiyê bi aşkereyî di raya giştî de were nîqaş kirin. Ne Erdogan, ne siyasetmedarên berê û yên niha yên AKPê û ne jî medyaya serdest, heta roja îro qet behsa rapora dawîn ya komîsyonê nekirine. Bi lêgerînek hêsan a Googleyê ku rapirsiyan li gorî demê fîltre dike, derdikeve holê ku ji weşandina rapora dawîn ya di 2ê Berfenbara 2013an û vir ve, di çapemeniyê de behskirina komîsyonê, hema bêje bi temamî ji holê rabûye.

## Analîza Komîsyona Pêvajoya Aştiyê

Komîsyona Pêvajoya Aştiyê di warê vegotinê de bi awayekî teqez ji Komîsyona Jêr a Binpêkirinên Mafên Jiyanê lîberaltir e, ku wê komîsyonê xizmeta ji nûjen ve hilberandina vegotinên dewlet-navendî yên derbarê terorîzmê de kiribû. Herweha, beşa 2an ya rapora dawîn ya Komîsyona Pêvajoya Aştiyê, ku kurtasiya nêzîkatiyên heyî yên pevçûnên tundiyê dihewînin e, bi wê yekê destpêdike ku dibêje bi navkirina wekî “pirsgirêka kurd”, “pirsgirêka terorê” an “pirsgirêka PKK’ê” li gel tiştên din, li xwezaya berfireh ya vê mijarê nayê.

Komîsyonên berê, bi taybetî jî Komîsyona Jêr a Binpêkirinên Mafên Jiyanê, ji bo ravekirina mijarên nerehet, nemaze tundiya dewletê ya li dijî sivîlan bîne ziman bi awayekî stratejîk axaftinên raporkirî bikar anîbûn. Komîsyona Pêvajoya Aştiyê xwedan formekî dureyî ye: li dû pasajên dirêj ên ku ji hevpeyvînan hatine wergirtin, ew beş tên ku endamên komîsyonê vegotinê berdewam dikin. Di beşa dawîn de, ku pêşniyarên ji bo dahatuyê bi kurtasî vedibêje de, tu gotinên kesên ku hevpeyvîn bi wan re hatine kirin cih nagirin -ku ev li gorî ya Komîsyona  Jêr şêwazeke nivîsandinê ya pir cûda ye.

Çarçoveya terorê, ku di navenda vegotina Komîsyona Jêr de cih digirt, di rapora dawîn ya Komîsyona Pêvajoya Aşitiyê de bi tevahî tune ye, ji ber ku derbirînên wekî «teror» an «dijî serhildanê»  kêm in. Di şûna wê de, Komîsyon li gel peyvên gelemperî giraniyê dide peyvên wekî  «kurd» [*kürt*], “nasname” [*kimlik*], “pêvajoya çareseriyê” [*çözüm süreç*], “aştî” [*bariş*] û “demokratîk” [*demokratik*]. (Şikil 5.1). Komîsyon bi awayekî pir bi rêkûpêk behsa mafên mirovan jî dike (Şikil 5.2).  Peyva “Cerdevan” [*koy korucu*] gelek caran xuya dibe, sedemek jê ji ber ku di rapora dawîn de carinan behsa fonksiyona wan tên kirine, û sedemek jî ji ber ku pergala cerdevaniyê dibe sedema binpêkirinên mafên mirovan û pevçûnan dirêjtir dike ye. Lê belê, Komîsyona Pêvajoya Aştiyê jî mîna Komîsyonêa Jêr di rapora xwe ya dawîn de behsa “şerê xeyrî nizamî” an jî têgînên wekî wê nake.

Beşdarkirina mexdûran, civaka sîvîl û akademîyê hatiye pesin dan. (Çelik û yên din. 2015, 12). Pirsgirêkeke domdar, ku Komîsyona Pêvajoya Aştiyê bi komîsyonên beriya xwe re parve dike, ewe ku;  ravekirinekê nakê bê çima ew tercîh dikin bi hin kesan re hevpeyvînan bikin lê bi kesên din re nakin.  Bi gotineke din, pêvajoya hilbijartina kesên ku bi wan re hevpeyvîn werin kirin bi rengekî rasthatî xuya dike. Tişta ku pirsgirêkê girantir dike ew e ku nirxandinên hin hevpeyvînan di raporta dawîn de bi jêgirtinên dirêj têne temsîl kirin, lê ji yên din pir hindik jêgirtin hene, an jî qet ji wan jêgirtin tune ne. Ya rastî, ji 43 hevpeyvînên di rapora dawîn de, qet behsa dehan jê nehatiye kirin, lê di heman demê de ji çend hevpeyvînan rasterast jêgirtinên ku pênc pelan dadigrin an jî zêdetir hatine kirin. Rapora dawîn zelal nake bê gelo çima qet behsa deh hevpeyvînan nake an bê çima ji wan hevpeyvînên din ew qas zêde jêgirtin hatine kirin û tişta wan ewqasî giring dike çi ye. Herweha, rapor rave nake bê çima bi hin akademîsyênên pisporê pevçûn û aştiyê re hevpeyvîn hatine kirin, lê bi yên din re nekirine.


Komîsyon, wekî komîsyonên beriya xwe, dudilî ye ku li ser bingeha tiştên ku ji lîteratûra eleqedarî mijarê û hevpeyivînên xwe fêr bûye, pêşniyarên wêrek bike. Wekî mînak, rapora dawîn di kurtasiyên pêvajoyên aştiyê yên li El Salvadorê, Endonezyayê, Srî Lankayê û cihên din de, gelek caran behsa rola navbeynkarên navneteweyî dike (binêre, wek nimûne, r. 118-121). Rapora dawîn weha dibêje: "Herweha, taybetmendiyeke girîng a pêvajoyên pevçûn û aştiyê yên ku hatine  lêkolînkirin, karîgeriya faktorên navneteweyî ya li ser pêvajoyên pevçûn û çareseriyê ye. ["Ayrıca incelenen çatışma ve barış süreçlerinde dikkat çeken önemli bir husus da uluslararası unsurların çatışma ve çözüm süreçlerindeki etkisidir."] (p. 121) Bi heman awayî Prof. Dr. Alpaslan Ozerdemê ku yek ji wan kesên pê re hevpeyvîn hatiye kirine, balê dikşîne ser giringiya navbeynkariya di çareseriya pevçûnan de(p. 138). Lê belê, di beşa pêşniyaran de, derbarê navbeynkariya navneteweyî de tu tiştek tuneye. Bi heman awayî, rapora dawîn ji çend caran zêdetir girîngiya komîsyona heqîqetê nîqaş dike, lê di beşa pêşniyaran de behsa wê yekê nake.

Wekî encam, Komîsyona Pêvajoya Aştiyê bi saya lîsteya xwe ya berfireh a hevpeyivînan, balkişandina li ser ezmûnên navneteweyî, û meyla lîberal a ji bo çareserkirina pevçûnan, dûr geriya. Lê belê, xebateke hêja ya fêrbûn û berhevkirina ezmûnên navxweyî û navneteweyî bûye qurbaniya nêzîkatiyeke tirsonek ku xwe nade ber  pêşniyarên zelal û wêrek. Li gel vê yekê jî, tişta ku çarenûsa Komisyonê di warê dîtin û karîgeriya li raya giştî de diyar kir, ji naveroka rapora dawîn zêdetir, bidawîbûna proseya aştiyê, destpêkirina pevçûnên tund û xweşbêjiya siyasî bû ku pesnê vê yekê dida.

**Şekil 5.1: Ewra peyvan ya rapora dawîn**




**Şekil 5.2: Mijarên ku di rapora dawîn de behsa wan hatine kirin**



BEŞA 6.

# ANALÎZA BERAWİRDÎ YA KOMÎSYONÊN LÊKOLÎNÊ YÊN MECLÎSÊ

# Analîza Berawirdî ya Komîsyonên Lêkolînê yên Meclîsê

Ev beş sê komîsyonên lêkolînê yên meclîsê û komîsyona jêr, di sê waran de berawird dike û nakokiyên di navbera wan de resbît dike: Çarçoveya vegotinên wan; kapasîteya wan a ji bo çareserkirin û pêşvebirina fikarên dadweriya dema têperî ya hemdem; pêşwaziya wan a ji aliyê gel ve û beşdariya civaka sivîl. Hemû komîsyonan derbarê tundî û binpêkirinên berê yên li Tirkiyeyê de hinek agahiyên bikêrhatî dan û hinekan ji wan (bi taybetî Komîsyona Derbeyê û Komîsyona Pêvajoya Aştiyê) di raporên xwe yên dawîn de cih dan têgehên dadweriya dema têperî. Li gel vê yekê, her komîsyonekê agahdarî, têgeh û rastiyên peywendîdar bi binpêkirinên mafên mirovan re, ji rapora xwe ya dawîn derxistine, û di encamê de karîgeriyeke pir kêm li ser nîqaşên siyasî an civakî çêkirinê.

## Çarçoveyên Vegotinê

Çar komîsyonên ku ji bo vê raporê hatine hilbijartin, ji bo lêkolînkirina hin pirsgirêkên herî giran ên ku di destpêka sedsala bîstan û destpêka sedsala bîst û yekê de Tirkiyê bi wan re rû bi rû maye, hatine wezîfedarkirin: Tevlîbûna saziyên dewletê ya di çalakiyên derqanûnî de, metirsiya hertimî ya ji destwerdanên leşkerî, binpêkirina mafên mirovan ya di atmosfereke hema bêje bêcezakirinê de û pevçûneke çekdarî ya navxweyî ku tevî dehsalan şerê li dijî serhildanê bê encam maye û li gel danûstendinên carcaran berdewam dike. Her çend her lêkolînekê mijareke xwe ya taybet hebû jî, mijarên ku dihat payin li ser wan bisekine pir nêzî hev in. Sedema vê, ew saziyên siyasî yên ku normên demokratîk û mafên mirovî paşguh dikin û sûcên wekî binpêkirinên mafên mirovan û tundûtujiya siyasî ya komên paramîlîter ku bi van saziyan re hevkariyê dikin û muxalifan, civakên etnîkî, zimanî û çandî dikin armanca xwe bêcaza dihêlin e. Herwiha ev komên çekdar yên derveyî dewletê ji bo çekên xwe berdin bi tu hawî nayên teşwîqkirin û her bê ceza dimînin ev yek jî dibe sedema çeqoberika binpêkirin, tundûtujî û bêcazebûnê.

Her çar komîsyon di hilbijartina çarçoweya mijarên ku dê li ser wan bisekinin de xwedî îradeyek girîng bûn. Heke em vegerin ser pênasekirina prosedurên avakirina komîsyonên lêkolînê, mirov dikare bibêje ku ev komîsyon bi awayekî birêkûpêk yê nivîskî ji aliyê erkê ve nehatine sînordar kirin. Analîza vê raporê nîşan dide ku tiştê ku komîsyonan di raporên xwe yên dawîn de cih nedane wan, bi qasî tiştên ku ew bi aşkereyî diyar dikin, çarçoweya vegotina wan pêk tînin. Ji ber vê yekê, li jêrê, vê analîzê bi qasî vegotinên di raporê de cih girtine, bala xwe daye vegotinên ku

hatine derxistin jî û kurtasiyeke vegotinên navendî ku rêberiya rapora dawîn ya her komîsyonekê dikin, pêşkêş dike.

Biryara Komîsyona Sûsûrlûkê ew bû ku salên 1990î weke serdemekê binirxîne ku sûcê rêxistinî ji salên 1970î ve ji xwe ketibûn nava saziyên dewletê û hema bêje hemû sazûmana dewletê xistibû jêr destê xwe. Bi rêya hevpeyvînên ku bi şefên îstîxbaratê û endamên şebekeyên sûcdar re kiribûn, bal kişand ser têkiliyên mafyayê yên ku di dema sûcên wekî qaçaxçîtiya çekan, bazirganiya narkotîkê, qumara derqanûnî û kuştinên bêhejmar de rûpoşa xizmeta dewletê bikar dianîn. Rastiya ku komîsyonê hilbijart ku balê nekşîne ser, binpêkirinên cidî yên mafên mirovan bûn ku di dema şerê çekdarî yê navxweyî yê bi PKKê re hatine kirin. Ji aliyekî ve şebekeyên sûc, mûxalîf, rewşenbîr, karsaz û kesên ji rêzê dikuştin û ditirsandin û di heman demê de ev karên ku dikirin bi çalakiyên derqanûnî fînanse dikirin. Tunebûna çarçoveyeke mafên mirovan di rapora dawîn de, di biryara komîsyonê ya ku bi mexdûrên binpêkirinan re nepeyive de diyarker bû.

Komîsyona Derbeyê, ku bi saya lêkolîna xwe ya berfireh ya li ser lîteratûra akademîk a eleqedar û xebatên komîsyonên xwe yên jêrîn, du cildên mezin pêkanîn, mijara xwe li ser çarçoveyek pir berfirehtir rûniştand: Li gorî vê yekê, derbe û destwerdanên leşkerî ji ber faktorên saziyî, jeostratejîk, aborî, çandî û hiqûqî yên ku têkelî hevbûne pêk tên. Hêmana hevgirtinê, hebûna zihniyeteke wisa ye, ku di binkeya sazûmanî ya saziyên leşkerî û sivîl de tê xuya kirine û ev yek kontrola wesayetê ya saziyên ku nehatine hilbijartin li ser yên ku hatine hilbijartin rewa dike. Her çend ev vegotin pir berfireh be jî, lê nekolîna komîsyona ya li ser hevdîtina Buyukanit-Erdogan, ku Erdogan di bersiva xwe ya nivîskî de ji Komîsyonê re diyar kiribû ku ev sohbetek rûtîn ya di navbera serokwezîr û serfermandarê leşkerî de ye (r. 1146) hişt ku di pey komisyonê de gengeşîyên mezin derkevin holê.

Sedema vêderkirina kûr ya veşartî ya di vegotina Komîsyona Derbeyê de, eleqeya xwe bi meşrûkirin û piştgirîkirina hikûmetên nedemokratîk ya ji aliyê siyasetmedar û girseyên muhafezekar û oldar ve heye. Rapora dawîn, diyar dike ku, heya hinek tevgerên laîk û çepgir yên siyasî û civakî fêhm kirin ku derbeya 1960î û fraksîyona serdest ya di nav artêşê de dixwaze çepgiran biçewisîne, piştgiriya destwerdana 1971ê kirin. Behsa aktorên rastgir, muhefezakar an jî îslamîst yên ku piştgiriya derbeyan kirine nayê kirin. Lê belê piştgiriyeke bi vî rengî, bi taybetî dema derbeya 1980î û piştî wê dêrastiyeke pir berbelav e û ev yek tê zanîn. Ya rastî hin kesên ku komîsyonê bi wan re hevpeyvîn kirine, rojnamegerên rastgirin ku piştgiriya derbeyê bi awayekî aşkere kirine. Bi heman awayî, rastiya ku artêşê bi tiştên wekî ferzkirina dersa olî ya di dibistanên seretayî de jî di nav de bi awayekî civakî xîtabî rojeva muhefezakar kiriye û

li piştgiriya wan geriyaye di rapora dawîn de cih nagire. Komîsyona Derbeyê, di mijara vegotina dîroka fermî ya otorîterîzma li Tirkiyeyê de, ji aliyekî ve lêpirsînê fermî yên din derbas dike, lê belê dema mijar tê ser nasnameya demokratîya muhefazakar û îslamîstên ku alîgirên pêşeng yên AKPê ne, disekine û sînorekî datîne.

Ihtîmal e tu komîsyonan, di mijara ku bi awayekî rexneyî nêzî xeletiyên di raboriyê û roja me de bibin, bi qasî Komîsyona Jêr a Binpêkirinên Mafên Jiyanê xwe kontrol nekirine. Komîsyonê di qonaxa hevpeyvînan de hewil da, di navbera çalakvanên mafên mirovan, rewşenbîrên ultraneteweperwer, mexdûrên şîdeta dewletê û mexdûrên PKKê de hinekî hevsengiyekê pêkbînê, lê naveroka rapora dawîn vê pirrengiya hevpeyvînan nîşan nade. Vegotina navendî, xirabiya terorîzmê, wekî hemî cûreyên tundûtûjiyê yên ji hêla aktorên çekdar ên derveyî dewletê (û tenê ji hêla wan ve) tên kirin pênase kiriye û ji binpêkirinên mafên mirovan bi awayekî rasterast, an di encama kiryarên terorîstî de û nerasterast berpirsiyar e, ango vê yekê hiştiye ku dewlet bi zorê binpêkirinan bike. Komîsyona Jêr, binpêkirinên ku wezîfedarên dewletê ji wan berpirsiyar in, ji bo ku ji binpêkirinên ku terorîstên navborî kirine veqetîne, rengdêra "tê angaştkirin" ku ji bo binpêkirinên din nayê bikaranîn bikartîne û navên kesên ku karîgerî li wan bûye vedişêre û kesên ku karîgerî li wan bûye, kiryar kî dibe bila bibe, hemûyan wekî mexdûrê terorê nîşan dide. Wekî encam, rapor, bi vegotineke ku vegotina fermî ya derbarê terorê de ji nû ve hildiberîne, hebûna binpêkirinên mafên mirovan ên ku ji hêla dewlet û aktorên çekdar ên derveyî dewletê ve hatine kirin, qebûl dike.

Komîsyona Pêvajoya Aştiyê, ku sê endamên wê di Komîsyona Jêr de jî cih girtibûn, tenê çend meh piştî Komîsyona Jêr hate damezrandin, çarçoveyeke bi tevahî cûda hilbijart. Li gorî vê yekê, pevçûna ku bi PKK'ê re berdewam dike, encama rêgezek dîrokî ya aloz a tundiyê bû ku encax bi nêzîkatiyeke bi zanebûn, empatî û piralî ji bo çareseriya nakokiyan dikare were sekinandin. Di rapora dawîn ya Komîsyona Pêvajoya Aşitiyê de bi giranî danasîna PKK'ê ya ji aliyê Komîsyona Jêr ve ya wekî komeke fersendkar ya manîpulatîf tine bû; li şûna wê, komîsyona paşê ji her kesî xwest ku di navberê de piran ava bikin. Îstîsnayên aşkerê yên berdest yên Komîsyona Pêvajoya Aştiyê, bi baweriya min, ne di ravekirin û analîzkirina mijarên de, lê di encama wê de ne: Analîza berfireh ya ji 475 rûpelên pêk tê, bi beşa pêşnîyarên ya heşt rûpelî ku demokratîkbûn û pevçûna ne tundûtûjî bi gotinên gelemperî pêşniyar dike bi dawî dibe.

Çi beşdarkirin û derxistina van komîsyonan rave dike? Ez bawer dikim min du faktor, ango kom û peywend, siyaseta komîsyonên parlamentoyê û di dawiyê de jî encama wan dişekilîne. Dema dibêm kom, ez amaje bi wê yekê dikim ku her komîsyon ji

endamên parlemantoyê yên ji partiyên cihê û bi paşerojên kesane yên cuda pêk tên. Peywend jî amaje bi wê rastiyê dike ku komîsyon ne tenê li ser têgînên razber ên heqîqet û dadmendiyê kar dikin di heman demê de, ji bo berjewendî û hewcedariyên siyasî yên demkurt û bergehên siyasî yên ku bilez û bez diguherin jî kar dikin.

Komîsyona Sûsûrlûkê ji gelek aliyan ve berhema salên 1990an bû: ew di peywenda hikûmetên koalîsyonê yên bêîstîqrar, ku tê de tu aliyan nikarîbû angaşta hegemonyaya siyasî û îdeolojîk bike wê dema ku behsa binpêkirinên mafên mirovan ên ji aliyên dewletê ve wekî tabû dihat dîtin de hate damezrandin. Ji ber vê yekê, komîsyonê endamên xwe yên ji pênc partiyan (bi piraniya ji pêncan-çar jê endamên parlementerên partiyên desthilatdar ên DYP-RPê bin) li hev kom kirin û hilbijart ku karê xwe bi awayekî teng yê edlî, û heta ku mimkun dibe apolîtîk şîrove bike. Ji ber vê yekê dengê akademîk-rewşenbîrî ku di komîsyonên piştî wê de tê dîtin, di raporên vê komîsyonê de qet tune ye.

Her sê komîsyonên din ên ku yekser piştî hilbijartinên giştî yên sala 2011an hatin avakirin, serdestiya AKP'ê ya di siyaseta Tirkiyeyê de û zêdebûna desthilatdariya Erdogan a di eksê serokên din ên AKPê de nîşan dide. Çavdêrên wê serdemê dipejirînin ku Erdogan û siyasetmedarên din ên AKP'ê piştî hilbijartina 2011an şert û mercên nîqaşên siyasî bi serkeftineke berbiçav ava kirin. Di Komîsyona Darbeyê de ku bi pêşniyarên AKP, CHP, MHP û BDPê hat avakirin, ji her çar partiyan jî endam hebûn, lê AKPê xwedî serdestiya herî zêde bû. Serokên AKPê ji ber ku wan xwe wek mexdûrên planên derbeyê û wesayeta leşkerî-dadwerî didîtin, dixwestin bi aşkereyî ev tişt werin nîqaşkirin, partiyên din jî dikaribûn xwe wek mexdûr û aliyên eleqedar bidin nasîn. Lewra piştî piştî derbeya 1980yî CHP û MHP hatin qedexekirin û piştî derbeyên 1971ê û 1980î tevgera siyasî ya Kurd rastî çewisandinên giran hatine. Berfirrehiya rapora dawîn bê guman bi xwezeya piranîparêz ya komîsyonê ve girêdayî ye, lê wekî ku li jorê jî hate nîqaş kirin, komîsyona ku AKP tê de serdest bû, dema mijar hat ser pêşxistina nirxandineke rexnegir a beşdariya muhafezekaran di projeyên otorîter ên berê û yên niha de AKPê sînor kişandin û destûr ndeda vê yekê.

Dema raporên dawî yên Komîsyona Binpêkirinên Mafên Jiyanê ya sala 2012 û Komîsyona Pêvajoya Aştiyê ya 2013'an bên berawirdkirin, cudahiya ku kom û peywendê pêktîne awayekî diyar xuya dibe. Di Komîsyona Jêr de ji her çar partiyan endam hene, di komîsyona paşê de ji 11 endaman 10 jê AKPyî yek jî BDPyî ye. 3 ji AKPyiyên ku di nav wan de serokên her du komîsyonan jî hene, heman kes in.
Lê dîsa jî, dibe ku komê, bêyî ku rexneyekê lê bigre bikaranîna vegotina fermî ya derbarê têkoşîna dij terorê ya Komîsyona Jêr şikilandibe. Lewra Eronata ku endama komîsyonê bû, dayika qurbaniyekî PKKê bû, Metinerê ku endamekî din yê komîsyonê

bû, ji bo beşdarî AKPê bibe di demeke nêz de ji tevgera siyasî ya Kurd îstifa kiribû û beşdarî AKPê bibû. Endamekî din, Halaçoğlu, ultraneteweperwer bû. Helbet peywend jî girîng e: Komîsyona Jêr di sala 2012'an de, dema ku pevçûnên di navbera dewletê û PKK'ê de gihiştin asteke dijwar û wêrankar ku ji salên 1990'î ve nehatiye dîtin, xebitî. Her çiqasî amadekariyên danûstendinê li pişt perdeyê dest pê kiribin jî, wê demê serokên AKPê bi çarçowekirina pirsgirêka Kurd ya wekî pirsgirêkeke kontrgêrilayî kêfxweş bûn. Helbet, xeta partiyê jî, ji derketina serhildanê wesayeta Kemalîstan berpisiyar girt, lê bala komîsyonê ji tevliheviya dîrokî ya meseleyê zêdetir li ser hewcedariya bilez a rewakirina tundiyê bû. Ev yek ji destpêka sala 2013an ku danûstandinên aştiyê hatin ragihandin û helbet dema ku Komîsyona Pêvajoya Aştiyê dest bi karê xwe kir, ne cudatir bû. Wê demê fikarên hukûmeta AKPê ew bûn ku neteweperestên tirk û endamên artêşê yên nerazî bûn ku dikarin hewl bidin ku danûstendinan ji rê derxînin. Ji ber vê yekê, çarçoweya Komîsyona paşîn balê dikşîne ser wê yekê ku pirsgirêka kurd ji aliyê "kesên li dijî pêvajoya aştiyê" ve bi dehan salan e xelet tê fêhm kirin.

## Komisyonên lêkolînê yên parlamentoyê û dadweriya dema têperî

Komîsyonên meclîsê xwe wek beşdar an piştgirên dadweriya dema têperî dîtin? Komîsyona Pêvajoya Aşitiyê yekane komîsyone ku bi giştî 6 caran peyva "dadweriya dema têperî" [geçiş dönemi adaleti] bi aşkereyî bikar tîne. Têgînên têkildar di raporên komîsyonê de jî cih digrin: "hesabpirsîn" (rasterast wergera wê "rû bi rû hevketin") [*yüzleşme*] di rapora Komîsyona Susurlukê de 2 caran, di ya Komîsyona Derbeyê de 42 caran, di yên Komîsyona Jêr û Komîsyona Pêvajoya Aştiyê de 25 caran derbas dibe. Gotina "edaletiya vegerandinê" [*onarıcı adalet*] tenê di rapora dawîn ya Komîsyona Pêvajoya Aştiyê de derbas dibe. Bi gotineke din, Komîsyona Pêvajoya Aştiyê bi mijulbûna bi dadweriya dema têperî û darîçab girtina xeletiyên berê derdikeve pêş û heta radeyekê kêmtir Komîsyona Derbeyê jî heman tiştî dike. Komîsyona Sûsûrlûkê û Komîsyona Jêr xebatên xwe bi vî rengî çarçove nakin. Dibe ku ev yek ji bo Komîsyona Susurlukê ya di sala 1997an bê fêm kirin, ku di dema wê de ev têgîn wekî di salên 2010an de li seranserê cîhanê û li welêt ne populer bûn, lê xemsariya Komîsyona Jêr bi aşkereyî, biryareke siyasî ye.

Di nav mekanîzmayên diyar ên dadweriya dema têperî de, di her çar raporên dawîn yên komîsyonan de, behsa dadgehkirina berpirsên kiryarên tawanan hatiye kirin. Ji ber vê yekê, dadmendiya cezakar, ji bo seredêriya bi tundûtujî û binpêkirinên raboriyê hîn jî çarçoveyek serdest e. Li gel peyketinê, bi gelemperî ji hêla her çar komîsyonan ve tê pêşniyarkirin ku zêdetir agahî werine berhev kirin. Komîsyona Susurlukê bêyî ku mekanîzmaya sazûmaniyê diyar bike, ji dewletê daxwaz dike ku rastiyên li

ser kuştinên kiryar nediyar kifş bike (r. 783). Komîsyona Derbeyê, Komisyona Jêr û Komîsyona Pêvajoya Aştiyê, her çend di beşên cuda yên rapora dawîn de be jî, behsa komîsyonên heqîqetê dikin. Komîsyona Derbeyê behsa xebatên komîsyonên heqîqetê yên li Arjantîn, Gana, Haîtî û Ûgandayê dike (r. 905-910); herwiha pêşniyar dike ku ji bo lêkolîna rastiyan komîsyonek were ava kirin. [Gerçekleri Araştırma Komisyonu] pêşniyar dike (r. 194). Di beşa pêşniyaran ya Komîsyona Jêr de dema ku behsa binpêkirinên mafên mirovan tê kirin, ji saziyên dewletê zelali tê daxwaz kirin, lê belê mekanîzmayên sazûmanî yên ji bo bidestxistina zelaliyeke weha diyar nake (r. 319). Sê kesên ku Komîsyona Jêr bi wan re hevpeyvîn kirine, girîngiya komîsyonên heqîqetê tînin ziman – li cihekî din yê di rapora dawîn ya vê komîsyonê de ev têgihiştin hatiye paşguh kirin. Komisyona Pêvajoya Aştiyê bi aşkereyî komîsyoneke heqîqetê pêşniyar nake, lê beşek ji yê raporê bi tevahî ji bo komîsyonên heqîqetê hatiye veqetandin ku di derbarê sûdeweriya wan de zimanekî erênî bi kar tîne.

Komîsyona Darbeyê, Komîsyona Jêr û Komîsyona Pêvajoya Aştiyê, behsa tezmînatan dikin ku ji bo mexdûrên xeletiyên ku di raboriyê de hatine kirin werin dayîn. Nîqaşa tezmînatê ya  Komîsyona Derbeyê di du qadên cihê de pêk tê: Ya pêşî, pênasekirina tezmînatên ku ji bo hin qurbaniyên komkujiya 1955an ya li Stenbolê hatine dayîn, û ya duyem jî, ewe ku serpêhatiyên Arjantîn, Şîlî û Ûrûgûayê yên piştî rejîmên leşkerî bi xwîneran bide nasîn. Rapora dawîn ya Komîsyona Derbeyê, dîsa jî bernameyeke tazmînatê ya nû pêşniyar nake. Komîsyona Jêr li ser polîtîkayên tazmînatê yên dewleta Tirk ên ji bo mexdûrên şîdeta siyasî û terorê, analîzeke berfireh dike û destnîşan dike ku bernameyên tazmînatê yên berê carinan têra tamîrkirina zirarên mexdûran nakin (r. 167). Ew ji bo vegerandina rehetiya madî û manewî ya mexdûrên terorîzmê pêşniyar dike ku dewlet piştgiriyê bide (r. 320-321). Wekî encam, Komîsyona Pêvajoya Aştiyê ji bo bi taybetî pesnê serkeftinên hikûmetên AKPê yên di wî warî de bide polîtîkayên tazmînatê yên berê jî rave dike. Ew jî wekî komîsyonên berî xwe,  ji bo dahatûyê polîtîkayeke tazmînatê pêşniyar nake.

Yekane komîsyona ku daxwaza mekanîzmayeke lêborînê ya fermî dike Komîsyona Derbeyê ye (r. 195). Komîsyona Pêvajoya Aştiyê her wiha di analîza xwe ya li ser mînakên li seranserê cîhanê de mijarên behsa lêborîn û bexişandinê (bi taybetî parêzbendiya ku Komîsyona Heqîqet û Lihevanînê ya Afrîkaya daye sûcdarên hilbijartî) dike, lê wan pêkanînan li pêşniyarên xwe zêde nake. Komîsyona Susurlukê û Komîsyona Jêr di raporên xwe yên dawîn de behsa lêborîn û bexişandinê nakin.

Di dawiyê de, Komîsyona Derbeyê veguherîna bîra civakî [*toplumsal hafıza*] pêşniyar dike. Pêşniyara taybetî ew e ku navên kesên berpirsiyarê derbeyên berê de ji qadên giştî bên derxistin e (r. 198). Komîsyonên din ji nû ve avakirina bîra civakî bi vî rengî

nanirxînin. Lê dîsa jî Komîsyona Derbeyê, Komîsyona Jêr û Komîsyona Pêvajoya Aştiyê ji bo feraseta ku rêyên tûndûtujiyê û nedemokratîk meşrû dikin ji holê werin rakirin, pêşniyarên wekî, destpêk guherandina perwerdehiyê û guhertinên civakî, pêşniyar dikin.

Rêyeke din a têgîhiştina komîsyonên lêkolînê yên meclîsê jî ev e ku werin pirsiyar kirin bê wan heta çi astê binpêkirinên mezin ên mafên mirovan yên di dîrokê anîne zimên. Şikilê 6.1 nîşan dide bê komîsyonan çawa behsa deh beşên sereke dike ku di dîroka komara Tirkiyê tûndutujiyeke mezin dihewînin: Komkujiya Dêrsimê ya 1937-8an, Komkujiya li Stenbolê ya sala 1955an a li dijî kesên nemisilman, komkujiya 1ê Gulanê ya sala 1977an, komkujiya ermenan, komkujiyên li dijî Elewiyan yên di sala 1978an de li Mereşê û di sala 1980î de li Çorumê, di salên 1982an û derdora wan de îşkence û windakirinên li girtîgeha Diyarbekirê, komkujiya Sêwasê ya sala 1993an, kuştinên kiryar nediyar di salên di salên 1990an pê de armanc girtina karsazên kurd jî di nav de kuştinên kiryar nediayr û di dawiyê de, di salen 1990an pê de şewitandin û valakirina gundên li herêmê kurdan.

Di şiklê 6.1ê de, tê xuyakirin ku, kuştinên kiryar nediyar, di raporên dawîn yên hemû komîsyonan de bi awayekî hevgirtî cih digre, pey wê re şewitandinên gundan tên. Komîsyona Derbeyê, ji bilî komkujiya Dersimê behsa hemû bûyerên din dike. Komîsyonên din tenê behsa hin beşên bi mijara wan re eleqedar dikin. Bi gotineke din, Komîsyona Derbeyê, ew komîsyona herî nêze ku hesabekî berfireh yên hemû binpêkirinên mafên mirovan yên di raboriyê de bide. Lê belê ev pênasekirina hejmarî, divê rastîya şêwaza vegotinê ya Komîsyona Derbeyê ku bûyerên mezin yên tûndûtujiyê ji devla komkujî an qetlîamê wekî "bûyeran" bi nav dike nede ji bîr kirin.

## Bertekên raya giştî yên li komîsyonên meclîsê

Ji ber ku lêkolîneke raya giştî an jî lêkolînên berfireh yên akademîk û rojnamegeriyê derbarê van komîsyonan de nehatine kirin, derbarê serkeftina xwe gihandina raya giştî ya van her çar komîsyonan de pir kêm tişt tên zanîn. Bi taybetî di qonaxên sereke yên her komîsyonê de hin nûçeyên medyayî hatin çêkirin. Lê belê, radeya vegirtinê bi gelemperî çend roj an hefteyên piştî radestkirina rapora dawîn derbas nabin. Di lêgerîna Googleyê ya bi navên tam ên her komîsyonekê de bi qasî 2690 encam ji bo Komîsyona Susurlukê (ji sala 2012'an vir ve 105 nivîsar), ji bo Komîsyona Derbeyê 243, ji bo Komîsyona Binpêkirinên Mafên Jiyanê 363 encam, û ji bo Komîsyona Pêvajoya Aştiyê dubarekirin jî di nav de 543 encam derdikevin. Ne hewce ye ku were gotin, lêgerîneke Googleyê dibe ku nûnertiya tevahiya gerdûna encaman neke, û dibe ku gelek çavkanî navên kurt ên van komîsyonan bikar bînin, lê dîsa jî, hejmara kêm a

encamên lêpirsînê sînorên şiyana xwe gihandina raya giştî ya komîsyonan nîşan dide. Bi gotineke din, tenê yek rapora dawîn jî, ji leza çerxa medyayê an jî guhertina dîmena siyasî rizgar nebûye û nedaye pêş wan.

Komîsyonên di dema hikûmetên AKP'ê de rastî astengiyeke din hatin: Guhertinên dramatîk ên partiyê yên di warê mafên mirovan, pirsgirêka kurd û Fethullah Gulen de, tê wê wateyê ku endamên komîsyonê bi xwe di şert û mercên siyasî yên ku diguherin de xebatên xwe naparêzin. Heke pêwist bike ku em mînakekê bidin: Komisyona Derbeyê di profîlên seroka wê Nîmet Baş, yên wekî, di bîyogragfiya parlementoyê, bîyografya wezîrtiya AKPê û rûpela Wîkîpediyayê da cih nagire. Parastina wê ya aktîvîst a xebatên Komîsyonê di ji nişka ve bi dawî bûye. Nebûna xebatên komîsyonê yên di bîyografiyên fermî û nefermî de, ji bo Serokê Komîsyona Binpêkirinên Mafên Jiyanê û Komîsyona Pêvajoya Aştiyê Nacî Bostancî jî derbasdar e. Ev yek berovajî du endamên bibandor ên Komîsyona Susurlukê Mehmet Elkatmîş û Fîkrî Saglar e, ku di bîyografiyên wan ên giştî de agahiyên li ser rola wan ya di wê komîsyonê de hene.

Wekî encam, çar komîsyonên lêkolînê bi gelemperî di çarçoveya xwe de sînordar man. Ji ber ku medyayê hema bêje qet bala xwe neda wan, raya giştî ji naveroka wan re pir hindik agahdar bû. Destwerdana 28ê Sibata 1997an ji ber ku qada krîtîk a ku Komîsyona Sûsûrlûkê karibû veke girtibû û komîsyonên serdema AKPê bi tevahî bi guhertinên polîtîk ên hikûmetê yên di navbera salên 2012 û 2015an de girêdayî man, hemû komîsyon mecbûr man bi şertên siyaseta ku pir bilez diguhere re rû bi rû bimînin. Ji vê jî zêdetir, endamên pêşeng yên di komîsyonan de jî her tim li karê xwe xwedî derneketin. Ji ber vê yekê ev komîsyon wekî wan mijaran man ku bi piranî aktîvîst, akademîsyen û welatiyên eleqedar, bi wan re eleqedar dibin.

## Di komîsyonan de beşdariya civaka sivîl

Hevpeyvînên min bi endamên pêşeng ên civaka sivîl re ku ji bo Komîsyona Jêr a Mafê Jiyanê û Komîsyona Pêvajoya Aştiyê hatibûn vexwendin, destnîşan dikin ku beşdariya civaka sivîl hem ji ber rola kêm a ku ji wan tê xwestin ku bilîzin, hem jî ji ber ku ev komîsyon di rewşeke siyasî ya dijwar de pêk tên hîn jî zehmet e. Wekî ku berê jî hat behs kirin, endamên meclîsê hîn jî pir kêm li fikrên civaka sivîl dipirsin. Herweha, hevpeyivînên min destnîşan dikin ku pêvajoyeke pir dijwar a muzakereyên siyasî di komîsyonan de pêkhatiye, û ev yek jî beşdarbûna ji derve hîn dijwartir dike. Murat Çelîkkan ê ku Komîsyona Pêvajoya Aştiyê bi pê re hevpeyvîn kiribû, dibêje ku parlementerên her du partiyan (AKP û BDP) li ser her hevokê şer dikirin.[41] Ozgür Sevgi

[41] Hevpeyvîna bi Murta Çelikkan re , Çile 27, 2022 (Zoom).

Goral destnîşan dike ku li Tirkiyê siyaset tund e [*sert*], û aktorên civaka sivîl dikevin nav deverek pir polîtîzekirî – ev angaşt ne ji bo wê yekê ne ku wan wan bêhêvî bike, lê ji bo hişyarkirina wan li ser metirsiyên beşdarbûna di van komîsyonan de ne.[42]

Digel vê yekê, hewildanên rêberiya siyasetmedaran axaftina ji guhên kerr e ye. Ger em mînakekê bidim: Ozturk Turkdogan dibêje, Komeleya Mafên Mirovan pêşnûmeqanûnek amade kir ji bo avakirina komîsyoneke heqîqetê ku li xeletiyên berê yên wekî Qirkirina Ermeniyan, Komkujiya Dersimê, qetlîamên li ser kurdan, darbeyên leşkerî, û hwd bikole ku ji 9 komîsyonên jêr pêk tê. Pêşnûmeqabûn di çarçoveya peyva "lêborîn"ê de hate amade kirin ku Erdogan di sala 2011'an de li ser komkujiya Dersimê ev peyv bikaranî. Lê belê ev pêşnûmeqanûn ji bilî BDPê ji aliyê rêveberiya AKPê û hemû partiyên mûxalefetê ve bi temamî hate paşguhkirin.[43]

Li gel ku bi giştî saziyên siyasî û bi taybetî komîsyonên lêkolînê tecrubeyên neyînî hene jî, kesên ku hevpeyvîn bi wan re hatin kirin, sedemên xweşbîniyê jî tînin ziman. Nadire Mater radigihîne ku karbidestên wezaretê ku raya giştî derbarê şîdeta li dijî jinan de agahdar dikin, raportên rojnamevaniyê yên *Bianetê* ku ajanseke serbixwe ya nûçeyan e bikartînin ku ekîba wê wan nûçeyan e belav dike.[44] Bi gotineke din, cureyê keda ku bi civaka sivîl a mixalif ve girêdayî ye, di şert û mercên dijwar de jî dikare xwe bighîne belgeyên fermî. Bi ser de, hewaya tund a sîyaseta hizbî dikare bi awayekî paradoksî hêzê bide civaka sîvîl: Ozturk Turkdoganê ku nîqaşa îhtîmala pêvajoyeke aşitîyê ya dahatûyê de dike, amaje bi wê yekê dike ku pejirandina kiryariya aktorên civaka sîvîl dikare bibe alîkar ji bo çareserkirina xitimandina ku dibe sedema dijberiya di navbera partiyan û hîper-polîtîzekirina pirsgirêka kurd de.[45]

Bi heman rengî, Ozgur Sevgi Goral serî li rêbaza "asta navîn" (*orta kademe*) (Lederach 1997) ya lêkolînerê aştiyê Paul Lederach dixe ku pêvajoya aştiyê ya têkçûyî teşhîs bike û rêyên ji bo aktîvîzma aştiyê pêşniyar bike: "Navbeynkar tune bû. Lederach diyar dike ku asta navîn pir girîng e. Li gel aktorên ku bixweber li dijî [pêvajoya aştiyê] dernakevin, her du alî û civaka sivîl dikarin rola tamponekî ku ji asta navîn pêk tê bilîzin. Rolên wekî navbeynkar, hêsankar. Ev rol [di pêvajoya têkçûyî ya aştiyê de] bê aktor hate hiştin. Hem jî di rewşeke wisa dijwar [siyasî] de. Asta navîn a ku bi hişkî ne siyasî ye û dikare rola teknîkeran bilîze [hewce ye]." ]." ["Arada tampon yoktu. Lederach orta kademenin çok önemli olduğunu anlatıyor. Hem taraflar hem de CHP

---

42 Hevpeyivîna bi Ozgür Sevgi Goral re, Çile 26, 2022 (Zoom).

43 Hevpeyivîna bi Oztürk Turkdogan re Çile 25, 2022 (Zoom).

44 Hevpeyivîna bi Nadire Mater re, Sibat 2, 2022 (Zoom).

45 Hevpeyivîna bi Oztürk Turkdogan re, Çile 25, 2022 (Zoom).


gibi kafadan itiraz etmeyecek aktörler hem de sivil toplum orta kademelerden oluşan bir tampon rolü olabilir. Arabulucular, kolaylaştırıcılar gibi roller. Bu rol çok açıkta kaldı. Bir de bu kadar sert bir iklimde. Dar anlamıyla politik olmayan, tekniker rolü oynayabilecek ara kademeler."][46]

Di dahatuyê de, beşdarbûna civaka sivîl di komîsyonên lêkolînê û pêvajoyên aştiyê de dibe ku ji aliyê aktorên civaka sîvîl ve jî pêwîstî bi refleks û pejirandina rastiyên siyasî hebe. Bi gotina Murat Çelikkan: "Pêvajoyên aştiyê û komîsyonên heqîqetê li tu derê cîhanê bi prensîbên paqij ên exlaqî nayên avakirin; di çarçoveya îmkanên siyasî de tên avakirin. Bi baweriya min divê ev cure derfet baş bên bikaranîn. Ev pêvajo ne pêvajoyeke wisaye ku tevgera (sîvîl) gelekî aşînayê wê ye, di çarçoveya têkoşîn û muzakereyê de hûn bi qatilê xwe re li ser maseyê rûdinin. Divê ev têkoşîn hinekî di dilê mirov de rûne. Wekî din, hêviya aştiyê ku bi nêzîkatiyeke herîzêde ku her pirsgirêkê çareser bike, ne mumkun e." ["Dünyanın hiçbir yerinde salt etik ilkelerle barış süreçleri ve hakikat komisyonları kurulmuyor; politik imkanlar çerçevesinde kurulurlar. Bu tip fırsatları iyi değerlendirmek gerektiğini düşünüyorum. Bu da sivil hareketin Türkiye'de alışık olduğu bir süreç değil, mücadele ve müzakere çerçevesinde aslında katilinle aynı masaya oturmak. Bu mücadelenin biraz özümsenmiş olması gerek. Aksi taktirde maksimalist bir yaklaşımla her sorunu barışın çözmesini beklemek onu imkânsız hale getirmek çünkü."][47]

[46] Hevpeyvîna bi Ozgur Sevgi Goral re, Çile 26, 2022 (Zoom).

[47] Hevpeyvîna bi Murat Çelikkan re, Çile 27, 2022 (Zoom).

**Şekil 6.1: Derbirînên Komîsyonê Yên Derbarê Tundî û Binpêkirinên Siyasî de**



BEŞA 7.

# PÊŞNİYARÊN Jİ BO KOMÎSYONÊN MECLÎSÊ YÊN Dİ DAHATUYÊ DE WERİN AVA KİRİN

# Pêşniyarên ji bo Komîsyonên Meclîsê yên di Dahatuyê de Werin Ava Kirin

Armanca vê beşê ew e ku li gorî destkeftî û kêmasiyên komîsyonên lêkolînê yên meclîsê yên berê, cihekî ji nîqaşên avaker re veke. Rewşa heyî ya ji bo çavdêriya zagonî dûrî asta îdeal e, lê ev rewş jî dibe ku biguhere. Sîstema desthilatdariya niha ya Tirkiyê şêwazeke serokatiyeke bihêz e ku çavdêriya rasteqîn a parlamentoyê li serê tuneye. Ev rejîm bi rêya referanduma 2017an û hilbijartinên serokatiyê yên sala 2018an bi awayekî yasayî hate damezrandin, lê ew bi awayekî *de fakto* herî kêm ji sala 2014an û vir ve dihate avakirin. Lê dîsa jî, heya dema nivîsandina vê nivîsê (Adar 2022), hemû partiyên sereke yên opozisyonê soza vegerandina sîstema parlemanî dan ku ev rejîma yasayî ya dema dawî ya Osmaniyan (1908-1920) û helbet tevî astengiyên nedemokratîk ya Komara Tirkiyeyê bû. Ger parlamento dîsa li ser kaxezê û bi yasayî were desteser kirin, panelên dahatûyê dikarin li ser şîdeta siyasî û binpêkirinên mafên mirovan yên berê û niha lêkolîn û nîqaşan bikin. Ji ber vê yekê, ez hêvî dikim ku ev rapor bi danîna çarçoveyeke ji bo pratîkên baştirîn piştgiriya hewildanên dahatuyê bike.

### 1-Erken Fermî yên Zelal

Di dawiya Cotmeha 2012'an de Serokê berê yê CHP'ê Denîz Baykal, bi hinceta ku komîsyonê li gel lêpirsîna parlamenteran, bi wan kesan re hevdîtin kirine ku ne girêdayî sektora cemawerî ne û rayeya xwe ji dest daye, ji Komîsyona Derbeyê veqetiya.[48] Hinek endamên artêşê yên li ser kar, ji bo rayeya komîsyonan ya lêpirsîna wan derxînin holê, bi hincetên wisa, bi taybetî jî di dema Komîsyona Susurlukê de, angaşt kirin ku ew tenê li hember serek û fermandarên xwe berpirsiyar in û beşdariya komîsyonan red kirin.  Hewceyî gotinê nake, ku ev îtîrazên li dijî usûlê dibe ku ser nexwestina beşdarbûna komîsyonê girtibe, lê ev yek dîsa jî kêşeyekê nîşan dide: Erkên fermî yên komîsyonên meclîsê, li Tirkiyê her cihê nîqaşa ne.

Ji ber vê yekê, divê piraniyên qanûndanînê yên nû, rayeyên fermî yên komîsyonên lêkolînê yên meclîsê diyar bikin. Bê guman, biryara bê dê çawa ev erk werin dabeşkirin, bi piraniya demokratîk ya dahatûyê ve girêdayî ye, lê di jêr ronahiya van ezmûnan de herî kêm divê li ser sê pirsan were sekinîn: Ya yekem, gelo destûr tê dayin ku komîsyonên meclîsê bi karbidestên dewletê yên çalak û xanenişînbûyî re û bi parlamenterên din re û bi kesên negirêdayê sektora giştî re hevdîtinan bikin? Ya duyem, ji bo komîsyon gazî kesan û saziyan bike û wan mecbûrî hevkariyê bike, gelo

[48] "Baykal Darbe Komisyonu'nu terk etti," *NTV*, 30.10. 2012.

divê hêza bangnameya dadgehî ji komîsyonan re were dayîn? Ya sêyem, ger komîsyon bi rastî ji xwedî hêza bangnameya dadgehî bin, divê bi çi mueyîdeyan piştgiriya vê erkê were kirin? Dibe ku hêza bangnameya dadgehî mudaxeleyî têgînên diyarkirî yên doktrîna cudabûna hêzan bike; ji ber vê yekê divê bi pisporên hiqûqî jî bê şêwirin.

Her wiha divê raporên dawîn yên komîsyonan li hundir û derveyî parlamentoyê bên belavkirin û nîqaşkirin. Divê qanûndanerên dahatuyê bi awayekî fermî nîqaşa komîsyonan têxin rêziknameya Meclîsê. Bi vê yekê re eleqedar, ji bo zelalî û ji bo gel xwe bighîne raporên dawîn divê ew rapor bên dîjîtalîzekirin û bi awayekî berfireh bên belavkirin.

## 2-Metodolojiya zelal

Her komîsyona meclîsê ya ku di vê raporê de hatiye analîz kirin, derbarê metodolojiya xwe de pirs li dû xwe hiştine: Komîsyona Susurlukê çima bi mexdûrên binpêkirinên mafên mirovan re hevpeyvîn nekirine? Komîsyona Derbeyê lîsteya xwe ya balkêş lê eklektîk a hevpeyvînan çawa hilbijart? Çima Komîsyona Binpêkirinên Mafên Jiyanê serdana 8 bajaran kir, û bi çi hincetê qaşo "profîlên terorê" yên van bajaran hilbijart? Û pêvajoya hilbijartina pisporan ya Komîsyona Pêvajoya Aştiyê çawa bû? Nezelaliya pêvajoya hilbijartinê ne tenê dike ku rapora dawîn wekî navnîşeke bûyer û ramanên rasthatî were xwendin; her weha dihêle guman derkeve holê ku endaman ji ber alîgiriyê bi qestî hin kesên muxatabên potansiyel li derve jî hiştine.

Ji ber vê yekê, ji bo hewildanên dahatuyê yên lêgerîna heqîqetê peywireke girîng ew e ku hilbijartina hevpeyivîn û qadên hevdîtinan rewa bike. Wekî ku hemî lêkolînerên jêhatî dizanin, lêkolîna li ser bingeha hevpeyvînan her tim xwe naspêre hilbijartina rasthatî ya nimûneyên ku nûneriya gelheyê bikin (û divê nekin jî); di şûna wê de, hilbijartina rasthatî a navnîşeke destpêkê ya ku li dû wê jî mijarên hevpeyivînê pir zêde dibin heye. Bi gotineke din, pêşniyara li vir ew e ku komîsyonên meclîsê li gorî pîvaneke metodolojîk ne mumkin bin. Li gel vê yekê, tê pêşniyar kirin ku ew rave bikin ka çima ew bi hin kesan (û ne yên din) re hevpeyivînan dikin. Wekî din, girîng e ku meriv pêvajoya hilbijartinê li ser bingeha agahdariya ku tê xwestin rastdar bike. Pratîkên berê diyar dikin, dibe ku komîsyonên meclîsê li ser hesabê komeke din bala xwe bidin ser komeke îxbarkaran (wek mînak, di Komîsyona Susurlukê de zêde pêbaweriya ji karbidestên îstîxbaratê û siyasetmedaran ya li dijî civaka mafên mirovan) an jî qaşo ji bo pêkanîna hevsengiyê bi çend kesên ku ji aliyên qaşo dijberî hev tên (mînak, biryara Komîsyona Pêvajoya Aşitiyê ya ku bi çend xizmên çend endamên PKKê yên berê û çend xizmên qurbaniyên PKKê re hevpeyvînê bike), an jî bi qasî ku ji destê wan tê bi gelek kesên navdar re hevpeyivînan pêk bînin (wekî mînak,

Komîsyona Derbeyê). Kiryarên bi vî rengî di warê temsîliyet û kûrahiya rewşenbîrî de pirsgirêkan derdixîne holê. Ji ber vê yekê, metodolojiya hevpeyivînê ya zelal û bi rêkûpêk, dikare alîkariya komîsyonên dahatuyê bike ku lêkolîneke baldartir, bêalî û hilberîner bikin.

## 3-Diyarkirina Armancan

Komîsyonên lêkolînê yên meclîsê jî di nav de, hemû destpêşxeriyên heqîqetê, armanc dikin ku bi carekê re bigihîjin gelek armancan: vedîtin, pejirandin û aşkerekirina agahdariya rasteqîn, ravekirina sedem û encamên ku bi wan agahiyan re têkildar in, agahdarkirina raya giştî li ser awayên potansiyel ên çareserkirina pirsgirêka li ber dest, anînza ziman ya ezmûn û dîtînên kesên ku bi wan re hevpeyvîn hatine kirin û heke pêwist bike kirina çend pêşniyaran. Ev armanc ne hewce ne ku hevdu xurt bikin; di rastî de ne diyar kirina armancên komîsyonekê û rêyên bidestxistina wan dibe ku di navbera van armancan de nakokiyan çêbikin. Wekî mînak, dema ku kesekî pê re hevpeyvîn hatiye kirin, rastiyê nebêje, peydakirina rastiyê dikare dijberî ragihandina wê rastiyê be. Bi heman awayî, dibe ku pir kêm eleqeya pêşniyarên komîsyonekê bi dîtina rastiyan û ragihandina wan hebe an dibe ku di navbera rapora dawîn û naveroka din ya komîsyonê de nakokî hebin.

Mixabin, çar komîsyonên ku di vê raporê de hatine lêkolîn kirin, gelek mînakên têkçûnên weha pêşkêş dikin ku ji bo armancên taybet dixebitin. Komîsyona Susurlukê wekî ku şêwaza wê ya adlî jî derddixst holê, berî her tiştî hewildaneke dîtina rastiyê bû. Lê di rapora dawîn de nêrîn û spekulasyonên gelek kesên ku hevpeyvîn bi wan re hatine kirin hene ku ji hêla endaman ve ne hatine piştrastkirin û ne jî li derewê hatine qelibandin – wek ku piştrastkirina rastiyan ji dadgehan re hiştibin, vegotineke rasthatî ya potansiyel ku bi van rastiyan re têkildar e rapor kirin. Beşa li ser  ezmûnên cîhanî yên hewildanên lihevhatîna bi mîrateya derbeyên leşkerî re ya Komîsyona Derbeyê, xwendevanan dixe nav meraqê gelo ka komîsyon tedbîrên bi vî rengî li Tirkiyê pêşniyar dike, an gelo ew bi tenê tiştên ku li cîhekî din qewimîne vedibêje. Ev yek wekî pirsgirêkekê acizker di Komîsyona Pêvajoya Aştiyê de jî heye. Komîsyona Jêr angşat dike ku ew mil dide parêzvanên mafên mirovan û mexdûrên şîdeta dewletê, lê endamên komîsyonê dema ku mesele tê ser raporê guh nadin vê yekê. Wekî encam, raporên dawîn xwendevan şaş û metel dihêle: Rastî çi ye û dîtin çi ye? Endamên komîsyonê di navbera nêrînên xwe û axaftinên ku tênê ragihandin de çawa xêz dikin? Ma komîsyon raman, mînak û modelên ku diyar dikin dipejirînin?

Hêjayî gotinê ye, tişta ku van pirsgirêkên epîstemolojîk û metodolojîk tekêlhev dike, polîtikaya komîsyonên lêkolînê yên meclîsê ye: Dibe hin siyasetmedarên ku

komîsyona meclîsê ya lêkolînê pêktînin, bi veşartina hemû an jî piraniya rastiyên neguncan re eleqedar bibin an jî hewil bidin ku dengê ramanên dijber bibirin. Sedemeke din tunebe jî, ji tirsa tolhildana ji hevkarên xwe yên di şaxên qanûndanîn an rêvebirinê de, dibe ku ew nexwazin pêşniyarên maqûl lê ji hêla siyasî ve giran werbigrin. Ya din jî, Destûra Bingehîn bi halê xwe yê heyî rêberiyeke nezelal pêşkêş dike: Komîsyonên lêkolînê yên parlamentoyê ji bilî amûrên berhevkirina agahiyan ne tiştekî din in.

Ji ber vê yekê, nakokiyên bingehîn ên di nav armancên destpêşxeriya heqîqetê de bi hêsanî nayên çareser kirin, lê nêzîkatiyek ramanî ya ji bo armancên komîsyoneke taybet dikare alîkariya kêmkirina pirsgirêkan bike. Komîsyonên dahatuyê dikarin xwe bidin ber pêkanîna armanceke, hineka armancan an hemû armancên li jorê hatî gotin, an jî yên nû derxînin holê, lê ka ev armanc çi ne divê bi zelalî werin diyar kirin. Bi ser de, divê pîvan werin destnîşan kirin bê ka wê ew armanc çawa bêne bi cih kirin. Bo nimûne, divê endamên komîsyonê biryarê bidin ka ew ê hevpeyvînan wekî navgîneke tespîtkirina rastiyan bikar bînin, an tenê ji bo ragihandina nerîn û ezmûnan bikar bînin. Bi heman awayî, heke vegotinên kesên ku hevpeyvînên cihêreng bi wan re hatine kirin daxuyaniyên bi nakokî ên rastiyê biafirînin, divê endamên komîsyonê biryarê bidin ka ew ê rastdariya her çîrokekê kontrol bikin an dê bihêlin ku vegotinên bi nakokî li kêleka hev rêz bikin an nekin. Heke komîsyon bi pêşniyaran hatibe erkdarkirin, divê rapora dawîn aşkere bike ka çawa û çima karê komîsyonê bi wan pêşniyaran encam daye. Û di dawiyê de, ji ber ku gelek komîsyonên heqîqetê û destpêşxeriyên heqîqetê yên din, analîzên dadresî, ravekirinên bi sedemî, vegotinên beşdaran û pêşniyaran bi astên cuda tînin gelhev, komîsyonên dahatuyê, ji bo ku biserbikevin, di mijara diyarkirina armancan de, dikarin ji mîrateya komîsyonên heqîqetê yên raborîyê yên çaraliyê cîhanê berê yên ji sûdê werbigirin.

## 4-Ji nûjen ve fikirîna li ser deng

Derbarê pirsgirêkên bi danîn û bicihanîna armancan re, divê komîsyonên dahatuyê li ser pirsên hêz û ramanê bifikirin. Wekî ku li jor hate nîqaş kirin, ev hinekî kêşayeke wisa ye ku endamên komîsyonê biryarê bidin bê wê yên din kengî rapor bikin an wê kengî ramanên xwe bikarbînin. Lê li gel vê yekê jî, meseleya bingehîn a li ber dest, ew e ku ev komîsyon têbigihêjin ku hîyerarşiyên siyasî, aborî, çandî, zayendî, etnozimanî, olî, ku çavkaniya gelek pirsgirêkên ku ji hêla van komîsyonên lêkolînê ve têne nîqaş kirin in, divê ji hêla komîsyonan bixwe ve ji nûjen ve neyên hilberandin. Heke armanca dawîn a komîsyonekê ew be ku rastiyên derbarê kêşeyên ku karîgeriyê li hin hêmanên herî bêparastin yên gelheyê bike û lêgerîna çareseriyan van kêşeyan be, wê çaxê mildayina wan kesên bêparastin divê rêbertiyê ji xebatên komîsyonê re bike.

Hinek komîsyonên lêkolînê yên meclîsê di warê dayina platformeke ji bo mexdûrên binpêkirinên mafên mirovan yên di raboriyê de, rêyeke nû vekirine. Komîsyona Derbeyê, Komîsyona Jêr ya Binpêkirinên Mafên Jiyanê û Komîsyona Pêvajoya Aştiyê bi mexdûrên binpêkirinên yekparebûna laş û binpêkirinên mafên sivîl-siyasî yên ku ji aliyê saziyên dewletê, komên paramîlîter û yên derveyî dewletê ve hatine kirin re, bi rêbazên taybetî xwe hevpeyvîn kirin. Wekî din, Komîsyona Pêvajoya Aştiyê ji bo temamkirina danûstendinên aaştiyê li pisporên çareserkirina nakokiyên ku tundûtûjî nahewînin geriyan. Ji ber vê yekê, di mijarên ku raya giştî eleqedar dikin de, tiştên ku komîsyonên berê di warê anîna ziman ya gelek perspektîfên cuda de kirine, bê guman girîng in: Di civakeke ku nîqaşên giştî yên binpêkirinên mafên mirovan, derbeyên leşkerî û çareseriya nakokiyên ya bê tundûtûjî wekî tabû dinirxîne, komîsyonên berê, bi kesên ku xwedî ezmûnên û nêrînên nelihev re hevpeyvîn weşandin û nîqaşa di nav raya giştî de bi pêşxistin.

Li gel vê yekê, ezmûna komîsyonên berê, têkçûnên mezin yên ku divê di dahatuyê de neyên dubarekirin jî derdixin holê. Rêjeya jinên di lîsteya hevpeyvînan de bi rastî jî mirov matmayî dihêle: Di Komîsyona Susurlukê de ji 49an kesan 4 jê, di Komîsyona Derbeyê de ji 160 kesî 9 jê, di Komîsyona Jêr de ji 54 kesan 15 jê, di komîsyona Pêvajoya Aştiyê de ji 43 kesan 9 jê jin in. B gotineke din, hemû komîsyonan dûrxistina jinan ya ji qadên raya giştî ji nû ve hilberandine. Li gel vederkirina teqezî, komîsyon biserneketin ku vegotinên xwe li dora, ezmûn û dîtinên kesên ku karîgerî li wan bûye bihûnin û navendî bikin. Komîsyona Susurlukê bi awayekî aşkere karê xwe, wekî peydakirina deng û nûnertiya mexdûrên binpêkirinên mafên mirovan nabîne. Li aliyê din komîsyonên serdema AKPê, gelekî giraniyê didin mafên mirovan (têgin bi xwe di her raporeke dawîn de herî kêm 125 caran derbas dibe); dîsa jî, tevî baldariya li ser mafên mirovan hatiye dnîşandan jî, mexdûr yan ji vegotinê tên derxistin, yan jî di rapora dawîn ji gotinên wan tenê jêgirtin cih digrin, lê belê di pênaseyên raporê de, analîz û encamên raporê de her tên paşguhkirin. Hilbijartina Komîsyona Jêr ya ku hevpeyivînên ku behsa şîdeta dewletê dikin di nav têgihîştina xwe ya terorê de bi cih nake, di vî warî de bi taybetî hînker e.

Di dahatuyê de komîsyon, divê stratejiyên berhevkirin û analîzkirina agahiyan li gorî prensîbên wekhevî, cihêrengî û edaletê pêş bixin. Hêjayî gotinê ye ku yên biryara wê yekê bidin bê dê çawa bigihijin wan armancan bi piraniyên zagonsaz û endamên komîsyonan bi xwe ve girêdayî ye. Lê wekî ku mînaka newekheviya zayendî ya tund ya di nav kesên ku komîsyonên berê hevpeyvîn bi wan re kirine diyar dike, divê komîsyonên dahatuyê bi rengekî bi zanebûn stratejiyên xwe pêş bixin. Herweha divê komîsyonên ku angaşt dikin ku mafên mirovan bi ciddî digirin dengê mexdûrên van binpêkirinan bidin û ezmûn û dîtinên wan mexdûran têxin nav çîroka navendî ya

raporên dawî.

## 5-Teşwîqkirina beşdariya civaka sivîl

Komîsyona Jêr û Komîsyona Pêvajoya Aşitiyê heta astekê bi awayekî aktîf beşdariya aktorên civaka sîvîl, bi taybetî yên pabendbûna wan bi mafên mirovan re heyî xwest. Lê dîsa jî, wekî ku ji hevpeyvînên wê jî diyar dibe, beşdariya civaka sivîl bi çend hevpeyvînan sînordar bû. Ramanên berfireh ku li ser wan hatine fikirîn yên ku di wan hevpeyivînan de hatine gotin, di raporên dawîn de an cîhekî pir  hindik girtin an jî qet cih negirtin û di encamê de, aktorên civaka sivîl hest bi xerîbiya ji komîsyonan kirin. Berî ku em bêtir li ser potansiyela beşdarbûna komîsyonên parlamentoyê nîqaşê bikin, hêja ye were gotin ku sînordariyên prosedûrên parlamentoyê, xwezaya hizbî û bê eleqetiya relatîfî ya gel, her tim komên civaka sivîl jî di nav de, dê ji beşdaran derve re astengiyan derxînin holê. Ji ber vê yekê, dema ji perspektîfa civaka sivîl were nêrîn, daxwaza  ku komîsyoneke heqîqetê ya ji saziyên siyasî serbixwe tevbigere da ku hesabê xeletiyên berê bike dê maqultir be.

Li gel vê yekê jî, komîsyonên meclîsê hîn jî dikarin ji bo aktorên civaka sivîl bibin qada têkoşîn û karîgeriyê. Her çend ji bo xwe gihandin û  gotin dayina kesên ji derve tên re mekanîzmayeke otomatîk tunebe jî, divê parlamenterên dahatuyê werin teşwîq kirin ku komeke cihêreng ji aktorên têkildar wekî pispor û kesên ku hevpeyvîn bi wan re werin kirin vexwînin. Wekî ku hevpeyvînên min bi serokên civaka sîvîl re kirî, aşkere dikin, qanûndaner di mijarên ku heye ew di wî warî de ne xwedî agahiyên berfireh in de, meyla wê yekê dikin bikevin navnakokiyên hizbî de. Bikaranina daneyên civaka sivîl ne tenê dikare valahiyên zanînê tijî bike, lê di heman demê de carinan ji bo veguhertina şertên nîqaşên siyasî jî xizmetê dike.

Di dawiyê de, ji bo aktorên civaka sivîl bi xwe: komîsyonên lêkolînê yên meclîsê ji bo piştgirîkirina rojevên civaka sivîl, ne cihên îdeal in, lê ji bo berpirsiyar girtina siyasetmedaran ew fersendên bêpayan didin. Ev rapora derbarê komîsyonên lêkolînê yên meclîsê de nîşan dide ku siyasetmedar bi gelemperî rastiyên dijwar ên siyasî yên li ser binpêkirinên mafên mirovan û otorîterîzmê bi zimanekî kodkirî û di navbera rêzikan de, lê dîsa jî, bi awayekî ku li dijî vegotinên fermî derkevin qebûl dikin. Têkilîdanîna bi van komîsyonan û berhemên wan ên dawîn re, bi qasî ku mirov bikaribe rexne bike xwe dûrgirtina ji wan lê  belavkirina dîtinên wan û helbet beşdarbûna di wan de ji bo ku di serî de vegotina wan bifesilîne, dikare di pêşerojê de tebeqeyeke berpirsiyarî û zelaliyê pêkbîne.

# Çavkanî

## Komisyonên lêkolînê yên meclîsê:

*Yasadışı Örgütlerin Devletle Olan Bağlantıları ile Susurluk'ta Meydana Gelen Kaza Olayının ve Arkasındaki İlişkilerin Aydınlığa Kavuşturulması Amacıyla Kurulan Meclis Araştırması Komisyonu* (1997), herweha binêre: https://tr.wikisource.org/wiki/TBMM_Susurluk_Araştırma_Komisyonu_Raporu [Turkish].

*Ülkemizde Demokrasiye Müdahale Eden Tüm Darbe ve Muhtıralar ile Demokrasiyi İşlevsiz Kılan Diğer Bütün Girişim ve Süreçlerin Tüm Boyutları ile Araştırılarak Alınması Gereken Önlemlerin Belirlenmesi Amacıyla Kurulan Meclis Araştırması Komisyonu* (2012), herweha binêre: https://www.tbmm.gov.tr/arastirma_komisyonlari/darbe_muhtira/ [Turkish].

*Terör ve Şiddet Olayları Kapsamında Yaşam Hakkı İhlallerinin İncelenmesine Yönelik Alt Komisyon* (2013), herweha binêre: https://www.tbmm.gov.tr/komisyon/insanhaklari/belge/TERÖR%20VE%20ŞİDDET%20OLAYLARI%20KAPSAMINDA%20YAŞAM%20HAKKI%20İHLALLERİNİ%20İNCELEME%20RAPORU.pdf [Turkish].

*Toplumsal Barış Yollarının Araştırılması ve Çözüm Sürecinin Değerlendirilmesi Amacıyla Kurulan Meclis Araştırması Komisyonu* (2013), herweha binêre: https://www.tbmm.gov.tr/sirasayi/donem24/yil01/ss571.pdf [Turkish].

## **Çavkanî**:


Aguirre, Carlos. 2013. "Punishment and Extermination: The Massacre of Political Prisoners in Lima, Peru, June 1986: The Massacre of Political Prisoners in Peru." *Bulletin of Latin American Research* 32 (1): 193–216. https://doi.org/10.1111/blar.12113.

Arthur, Paige. 2009. "How 'Transitions' Reshaped Human Rights: A Conceptual History of Transitional Justice." *Human Rights Quarterly* 31 (2): 321–54.

Atılgan, Mehmet, û Serap Işık. 2011. *Cezasızlık Zırhını Aşmak: Türkiye'de Güvenlik Güçleri ve Hak İhlalleri*. İstanbul: TESEV yayınları.

Bakiner, Onur. 2015. *Truth Commissions: Memory, Power, and Legitimacy*. University of Pennsylvania Press.

Balci, A. 2010. "A Trajectory of Competing Narratives: The Turkish Media Debate Ergenekon." *Mediterranean Quarterly* 21 (1): 76–100. https://doi.org/10.1215/10474552-2009-035.

Barahona de Brito, Alexandra. 1993. "Truth and Justice in the Consolidation of Democracy in Chile and Uruguay." *Parliamentary Affairs* 46 (4): 579–94.

Baran, Zeyno. 2000. "Corruption: The Turkish Challenge." *Journal of International Affairs* 54 (1): 127–46.

Baş, Nimet, Mithat Sancar, û Avni Özgürel. 2012. "Türkiye Darbeleriyle Yüzleşiyor." Panel 4. Ankara: Siyaset, Ekonomi ve Toplum Araştırmaları Vakfı.

Beattie, A. H. 2009. "An Evolutionary Process: Contributions of the Bundestag Inquiries into East Germany to an Understanding of the Role of Truth Commissions." *International Journal of Transitional Justice* 3 (2): 229–49. https://doi.org/10.1093/ijtj/ijp004.

Berg, Dion van den. 2009. "Rekindling the National Debate: How Public and Private Recognition Can Shift the Dutch Discourse on Srebrenica." Article Based on Opening Address at the "Transforming Images of the Enemy", Seminar in Utrecht, the Netherlands. IKV Pax Christi.

Bickford, Louis. 2007. "Unofficial Truth Projects." *Human Rights Quarterly* 29 (4): 994–1035.

Brahm, Eric. 2009. "What Is a Truth Commission and Why Does It Matter?" *Peace & Conflict Review* 3 (2): 1–14.

Burt, J.-M., G. Fried Amilivia, û F. Lessa. 2013. "Civil Society and the Resurgent Struggle against Impunity in Uruguay (1986-2012)." *International Journal of Transitional Justice* 7 (2): 306–27. https://doi.org/10.1093/ijtj/ijt001.

Çelik, Ayşe Betül, Murat Çelikkan, Evren Balta, Nil Mutluer, û Levent Korkut. 2015. "Çözüme Doğru: Olasılıklar, İmkânlar ve Sorunlar Üzerine Değerlendirme." Türkiye Barış Meclisi.

Dilek, Esra. 2019. "Investigating the 'Politics of the Local' in Peace Processes: The Case of Turkey's Peace Process for Solving the Kurdish Issue (2009-2015)." Working Paper #1. University of Denver Conflict Resolution Institute.

Ensaroğlu, Yılmaz, Zeynep Ardıç, Taylan Barın, Yavuz Güçtürk, û Cem Duran Uzun. 2014. "2013'te Hukuk ve İnsan Hakları." 80. Analiz. SETA.

Eroğlu, İzzet. 2007. "İnsan Haklarının Korunmasında Meclis Araştırması." *Yasama Dergisi* 5 (Nisan-Mayıs-Haziran): 109–49.

Ersoy, Duygu, û Fahriye Üstüner. 2016. "'Liberal Intellectuals" Narration of the Justice and Development Party in Turkey." *Turkish Studies* 17 (3): 406–28. https://doi.org/10.1080/14683849.2016.1166057.

Feinstein, Tamara. 2014. "Competing Visions of the 1986 Lima Prison Massacres: Memory and the Politics of War in Peru." *A Contracorriente: Una Revista de Estudios Latinoamericanos* 11 (3): 1–40.

Freeman, Mark. 2006. *Truth Commissions and Procedural Fairness*. Cambridge University Press.

Gökçe, Ali Fuat. 2009. "Türkiye Büyük Millet Meclisi'nin Yürütmeyi Denetlemesinde Meclis Araştırması Komisyonlarının İşlevselliği." *Yasama Dergisi* 11 (Ocak-Şubat-Mart-Nisan): 76–92.

Göral, Özgür Sevgi. 2021. "Waiting for the Disappeared: Waiting as a Form of Resilience and the Limits of Legal Space in Turkey." *Social Anthropology* 29 (3): 800–815. https://doi.org/10.1111/1469-8676.13096.

Greiff, Pablo de, ed. 2006. *The Handbook of Reparations*. New York: Oxford University Press.

Hayner, Priscilla B. 1994. "Fifteen Truth Commissions - 1974 to 1994: A Comparative Study." *Human Rights Quarterly* 16 (4): 597–655.

———. 2000. "Past Truths, Present Dangers: The Role of Official Truth Seeking in Conflict Resolution and Prevention." In *International Conflict Resolution after the Cold War*, edited by Paul C. Stern and Daniel Druckman, 338–82. Washington, DC: National Academy Press.

Hayner, Priscilla B. 2010. *Unspeakable Truths 2e: Transitional Justice and the Challenge of Truth Commissions*. Routledge.

Kochanski, Adam. 2020. "Mandating Truth: Patterns and Trends in Truth Commission Design." *Human Rights Review* 21 (2): 113–37. https://doi.org/10.1007/s12142-020-00586-x.

Kurban, Dilek. 2020. *Limits of Supranational Justice: The European Court of Human Rights and Turkey's Kurdish Conflict*. Cambridge University Press.

Lederach, Jean Paul. 1997. *Building Peace: Sustainable Reconciliation in Divided Societies*. Washington, DC: United States Institute of Peace.

Leebaw, Bronwyn. 2008. "The Irreconcilable Goals of Transitional Justice." *Human Rights Quarterly* 30 (1): 95–118.

Magarrell, Lisa. 2003. "Reparations for Massive or Widespread Human Rights Violations: Sorting Out Claims for Reparations and the Struggle for Social Justice." *Windsor Yearbook of Access to Justice* 22: 85–98.

Marchand, Christophe, Crépine Uwashema, û Christophe Deprez. 2020. "Possible Impediments to Justice for Colonial Crimes: A Belgian Perspective." In *Colonial Wrongs and Access to International Law*, edited by Morten Bergsmo, Wolfgang Kaleck, and Kyaw Yin Hlaing, 411–30. Brussels: Torkel Opsahl Academic EPublisher.

Méndez, Juan E., û Javier Mariezcurrena. 2003. “Review: Unspeakable Truths: Facing the Challenge of Truth Commissions by Priscilla B. Hayner.” *Human Rights Quarterly* 25 (1): 237–56.

Minow, Martha. 1998. *Between Vengeance and Forgiveness: Facing History after Genocide and Mass Violence*. Boston: Beacon Press.

Payne, Leigh A. 2007. *Unsettling Accounts: Neither Truth nor Reconciliation in Confessions of State Violence*. Duke University Press.

Rijsdijk, Erna. 2018. “Reconstituting the Dutch State in the NIOD Srebrenica Report.” In *The Palgrave Handbook of State-Sponsored History After 1945*, edited by Berber Bevernage and Nico Wouters, 713–25. London: Palgrave Macmillan.

Schlunck, Angelika. 1998. “Truth and Reconciliation Commissions.” *ILSA Journal of International & Comparative Law* 4 (2): 415–22.

Selçuk, Fatma Ülkü. 2011. “The Rising Mafioso Capitalists, Opportunities, and the Case of Turkey.” *Capital & Class* 35 (2): 275–93. https://doi.org/10.1177/0309816811407298.

Soyinka, Wole. 2000. “Memory, Truth and Healing.” In *The Politics of Memory: Truth, Healing, and Social Justice*, edited by Ifi Amadiume and Abdullah An-Na’im, 21–37. London: Zed Books.

Stan, Lavinia. 2009. “Truth Commissions in Post-Communism: The Overlooked Solution?” *The Open Political Science Journal* 2 (1): 1–13. https://doi.org/10.2174/1874949600902010001.

Steinbacher, Mitja, Matjaž Steinbacher, û Matej Steinbacher. 2012. “Accountability for Communist Crimes and Restitution for Victims in Slovenia.” In *After Oppression: Transitional Justice in Latin America and Eastern Europe*, edited by Vesselin Popovski and Mónica Serrano, 418–35. United Nations University Press.

Sunca, Yasin. 2016. “Infrastructures for Peace in Turkey: A Mapping Study.” Berlin: Berghof Foundation.

Teitel, Ruti G. 2000. *Transitional Justice*. Oxford University Press.

Wiebelhaus-Brahm, Eric. 2010. *Truth Commissions and Transitional Societies: The Impact on Human Rights and Democracy*. New York: Routledge.

Yoder, Jennifer A. 1999. “Truth without Reconciliation: An Appraisal of the Enquete Commission on the SED Dictatorship in Germany.” *German Politics* 8 (3): 58–90.

## Onur Bakıner

Li Zanîngeha Seattleê di beşa Zanistên Siyasî de wek doçent dixebite. Li ser dadweriya dema têperî, mafên mirovan û siyaseta dadgehî ya li Amerîkaya Latîn û Rojhilata Navîn xebatan dike. Pirtûka wî ya bi navê Komîsyonên Heqîqetê: Hafize, Hêz û Meşruîyet (Weşanên Zanîngeha Pensîlvanyayê, 2015), di sala 2017an de ji Beşa Mafê Mirovan a Komelaya Zanistên Siyasi ya Amerîkayê xelata pirtûka herî baş stand. Niha li ser projeyeka lêkolinê ya aktorên dadgehî yên ku di dewra şerên dirêj ên li Kolombîya û Tirkiyeyê de kar kirine dixebite. Di xebatên xwe yên berê de li ser komîsyonên heqîqetê yên civakên modern hûr bû.

© Truth Justice Memory Center, 2022

Armanca vê raporê belgekirin û analîzkirina çar komîsyonên lêkolînê yên meclisê ne ku di navbera salên 1997 û 2013an de, ji bo lêkolîna mijarên di warên şideta siyasî û binpêkirinên mafên mirovan de hatibûn ava kirine ku ji bo komîsyonên di dahatuyê de werin ava kirin re bibe rêbernameyek. Li Tirkiyê, bi gelemperî pêvajoyeke edaletê ya ji bo dema têperî tuneye an go komîsyoneke taybet ya heqîqetê tuneye. Li gel vê yekê jî, parlemento û saziyên din yên dewletê, ji bo lêkolînkirina tevgerên hêzên dewletê yên di dema şerê çekdarî yê navxweyî de ku li herêmên kurdan pêkhatî, binpêkirinên mafên mirovan yên di dema vê pevçûnê û bi şûnde û gefên li ser demokrasiyê, ji dawiya salên 1980yî û vir ve gelek dezgehên lêgerîna heqîqetê ava kirin. Ev proje serkeftin, kêmasî û sînoradariyên komîsyonên lêkolînê yên meclisê di keşifkirina rastiyan, eşkerekirina peyama wan û dabînkirina çarenûsa mexdûran de vedikole. Armanc ew e ku, ji bo desteyeke lêkolîna heqîqetê ya di dahatuyê de, -wekî komîsyoneke meclîsê an jî komîsyoneke serbixwe ya derveyî meclîsê- re ev lêkolîn bingeheke ava bike. Ji bo ku ew destkeftî û destpêşxeriyên berê bizanibin û sînoran derbas bikin.